**Rastî – wek rastî!**

# YÊN ÊZDÎ Û ÊZDÎTÎ

## LI SER RÊYA HEVHATIN Û YEKÎTÎYÊ

**Gotûbêjên malpera Amida Kurd /Swêd/
bi lêgerîner, nivîskar û rojnameger
Ezîz ê Cewo Mamoyan ra …**



amidakurd

**STOKHOLM – 2022**

**<u>Rastî – wek rastî!</u>**

# YÊN ÊZDÎ Û ÊZDÎTÎ

## LI SER RÊYA HEVHATIN Û YEKÎTÎYÊ

**Gotûbêjên malpera Amida Kurd /Swêd/**
**bi lêgerîner, nivîskar û rojnameger**
**Ezîz ê Cewo Mamoyan ra …**

**Malpera "AmidaKurd"**

**STOKHOLM – 2022**

**Malpera “Amida Kurd” /Swêd/ bi Ezîz ê Cewo Mamoyan ra**
**Yên êzdî û Êzdîtî. Li ser rêya hevhatin û yekîtîyê.**
Gotûbêj. Weşanên “Amida Kurd”, s. 2022.

Ev berevoka gotûbêjên malpera “Amida Kurd” a bi lêgerîner, nivîskar û rojnamegerê kurd Ezîz ê Cewo ra li ser mijara wan pirsgirêkan e, yên ku li ser rêya hevhatin û yekîtîya civaka netewî-ayînî ya kurdên êzdî dibin asteng.

Mamosta Ezîz ê Cewo di nava goveka van gotûbêjan da bingehên wan pêvajoyên dîrokî ravedike, yên ku bûne sedemên bûyerên bobelatî û rojên reş û giran di jîyana êzdîyan da. Wisa jî pêvajoyên îroyîn û rê û rêbazên lêgerandin û berterefkirina wan pirsgirêkan tên govtûgokirin, ên ku hê jî di nava jîyana êzdîyan da rû didin…

Ev weşana ji bo govekek a berfireh a xwendevanan hatye armanckirin.

# NAVEROK

**PÊŞGOTIN…** ........ **5**

**GOTÛBÊJA YEKEM** ........ **7**

**GOTÛBÊJA DUYEM** ........ **14**

**GOTÛBÊJA SÊYEM** ........ **21**

**GOTÛBÊJA ÇAREM** ........ **27**

**GOTÛBÊJA PÊNCEM** ........ **36**

**GOTÛBÊJA ŞEŞEM** ........ **45**

**Û – PIŞTÎ GOTÛBÊJAN… Xwendevan dibêjin,..!…** ........ **55**

**PÊVEK** ........ **60**

**NÊÇÎR A LI DÛ RUH Û REWANÊ ÊZDÎYAN DIDOME!.** ........ **60**

# PÊŞGOTIN

Ev pirtûka, xwendevanên hêja, berevoka gotûbêjên malpera “Amida Kurd” e bi lêgerîner, nivîskar û rojnamegerê kurd Ezîz ê Cewo Mamoyan ra. Di wê da ew pêvajoyên dîrokî tên nirxandin û ravekirin, ên ku bûne sedemên bûyerên bobelatî (trajêdîk) di jîya civaka netewî-ayînî ya kurdên êzdî da…

Ev gotûbêjana ji hêla malperê va di sêrî da bi şêwazê rêzehevpeyvînan bi zimanê kurdî hatibûn amadekirin û weşandin, lê peyra, bi hêvî û daxweza xwendevanan ew werguhêrî zimanê rûsî bûn, û di malperên “Kurdistan Today” û “Academia.edu” da hatin weşandin.

Di van gotûbêjan da ji bilî ku pirsên pêwendîdarî rewşa îroyîn a di civaka êzdîyan da tên govtûgokirin, wisa jî dîtinên xwendevanan ên di derbarê kontsêpta lêgerînên wan pirsgirêkan tên nirxandin, ên ku li ser rêya pêkhatina hevhatin û yekîtîya civaka êzdîyan dibin kelem, û rê û rêbazên çareserîya wan tên govtûgokirin.

Di van gotûbêjan da hewl tê dayîn, li ser mînaka wan pêvajoyan, ên ku di civaka êzdîyan da û li dora wê pêk tên, bersîva van pirsên bi êş û keder bibînin:

**Ya yekem:** “Divê mirov sersedemên peydabûna pêvajoyên dîrokî, yên ku di jîyana êzdîyan da gîhandine bûyerên bobelatî û malwêran, li ku bigere?”

**Ya duyem:** “Gelo ew kar, ê ku mîsîonêr-qewalên îro  pê radibin, şêwazekî “nerm” ê wan pêvajoyên dîrokî nine, yên ku gîhandine bûyerên ewqas trajêdîk û xwînrêj di nava civaka êzdîyan da?”.

Helbet, ev pirsana nû nînin, ewana hertim jî wê demê rû dane, dema ku bûyerên malwêran û tunekar di dîroka êzdîyan da li dû hev dubare bûne. Ewana di van rojên me da jî girîngî û rojevîbûna xwe winda nekirine. Û lewra jî, wek ku tê xuyan, divê mirov bi wanra wisa jî li ser wê baş bide heşê xwe û serê xwe pê biêşîne, ka çima em ji paşeroja xwe ya dîrokî dersan dernaxin, ka çima em nikarin reha wê nexweşîyê bibînin, a ku her carê malwêranî û bextreşîyê ji gelê me ra tîne.

Mamosta Ezîz ê Cewo bi bawer e, wek ku di dîroka mirovahîyê da tu tişt bê şop winda nabe, wisa jî hîç tiştek bê sedem pêk naê. Ku, her bi lêgerîn û nirxandinan mirov dikare rastîya wan bingehan têbigihîje, yên ku bûne û îro jî dibin sersedemên bûyerên ewqas trajîk di jîyana êzdîyzn da… Bi dîtina mamosta, eger mirov bikaribe wan bûyerên tirajêdîk bi zanistî binirxîne, yên ku di jîyana êzdîyan da pêk hatine, wê demê wê tevaya tora sedem-encaman a wan bûyerên malwêran derê hole, yên ku ne tenê û ne ewqasî gîhandine tunekirina êzdîyan a bi fîzîkî, çiqas beşek ji wana bi ruh û rewanî û ew ji reng û rûçikê wan ê olî-netewî dûr xistine.

Û rewşeke weha îro bi şêweyekî tund û tûj pêşdikeve, û ji bo hebûna êzdîtîyê, wek felsefeya têgihîştina cîhanê û xwenaskirina netewî, bêhtir xeternak û metirsîdar e, ne ku tunekirina êzdîyan a fîzîkî…

Bi lêgerînên bûyerên trajîk di çarçoveya pêvajoyên dîrokî da, wisa jî bi analîzkirin û nirxandina wan pirsgirêkan, ên ku îro li pêşîya civaka êzdîyan sekinîne, mamosta Ezîz ê Cewo gav bi gav berbi vekirina wan sedemên obyêktîv û sûbyêktîv va dice, yên ku gîhandine wê rewşa trajîk û bêçare, ya ku îro di civaka êzdîyan da desthilatdar e.

Û, dema bersîva pirsên me û xwendevanan dida, mamosta pêvajo û bûyerên

dîrokî yên civaka êzdîyan bi berfirehî mak kirin û şiroveyên wan dan, dîtina xwe di derbarê peydaabûna sedemên wan pirsgirêkan da anî zimên û rê û rêbazên berterfkirina wan destnîşan kirin…

Ji bo têgihîştina pêvajoyan, ên ku di civaka êzdîyan da pêk tên, xwendevan dê di van gotûbêjan da gelek tiştên balkêş û jêfêrbûnê bibîne, ewê bizanibe, ka ew pêvajo destpêka xwe ji ku digirin, ka îro li pişt wan va çi hêz û kes sekinîne, û ew kî ne, yên ku îro di nava civaka êzdîyan da rola qewal-êmîsarên veşartî dilîzin û bi karên ji bo civakê ewqas xeter û wêrankar radibin…

Û li vir li ber xwendevanan mabesta lêgerînên wan pirsgirêkan vedibe, ên ku li pêşîya hevhatin û yekîtîya civaka êzdîyan dibin asteng. Û evê jî mamosta Ezîz ê Cewo bi xwe weha şêwazdar kirye:

"Û heya me nikaribûye rehên vê bêdadî û nepakîya dîrokî ya hember êzdîyan (û tevahîya gelê kurd) bibînin, heya ji me nehatye, ku em li ser bingeha daneyên pêbawer wan derew û şer û şltax û buxdanan bi bingeha wan va bi zanistî red bikin, û rastîya dîrokî dernexin holê, û nikaribin ewê jîndar bikiin, emê nikaribin bi cîhana mayîn ra, wek terefdarên vê ola kevnar û bîrûbawerîya wê ya bêhempa biaxivin. Emê nikaribin bibin xwedîyên mîrasa wê çanda kevnar û wê şaristanîyê, ya ku hebûna gelê kurd ê pirmîllîonê ye".

*

* *

Û ya dine jî!

Di beşên cuda yên hevpeyvîna navborî da, yên ku me weşandibûn, mamosta Ezîz ê Cewo wek govenî hinek vidêo di wê derbarê da anîbûn, ka çawa rastîyên êzdîtîyê – vê ola gelê kurd a kevnar diguhêrin, ka çawa dîroka wê lêpovajî dikin...

Lêbelê, ji talebextan ra, piştî demekê ew vîdêoyana ji tora medya civakî winda bûn. Xwendevanan helwesta xwe dabûn xuyan, û ew wek karê destê xulamokên hêzên derva yên "nedîyar" wek komploya li dijî êzdîyan û êzdîtîyê navkiribûn... Weha, di vê derbarê da di gotara xwe ya "Belê, bi nirxandin û ravekirina pirsgirêkan gelek tişt ronî bûye, lêbelê…" da, ya ku bi wateyî bûye paşgotina van gotûbêjan, mamosta Ezîz ê Cewo çi dinivîse: "... em bên ser hnek nirxandinên xwendevanan di wê derbarê da, ku hinek vîdêo bi wan jêderkan, ên ku me di hevpeyvînê da weşandibûn, venabin. Hinek ji van xwendevanan jî di vî karî da destê wan dibînin, ên ku li dijî êzdîyan û êzdîtîyê delk û dolaban pêk tînin, û dibêjin: "... Binihêrin, ewana çiqas hişyar in û çawa bi aktivî tevdigerin!..." – Peyra mamosta navê wan vîdêoyan rêz dike, ên ku, wek ku xwendevan dinivîsin, bi jêderkên xwe nehatine vekirin, û ji bo wan vîdêoyan ji çavkanîyeke dinê jêderkên nû tîne, – ji bo ku xwendevan bikaribin wana hemberî hev bikin û bi xwe bibînin, ka çi guhartin pêk hatine, û mekanîzma pêkanîna van karan têbigihîjin..."

Helbet, peyra di nivîsarên hevpeyvîna me da, anegorî jêderk-çavkanîyên nû, ên ku mamosta Ezîz ê Cewo anîbûn, guhartin hatine pêkanîn, lêbelê, ji ber ku mamosta bi xwe ev gotara xwe ya navborî wek "Paşgotina hevpeyvîna malpera *Amida Kurd*" weşandye, em wê di dawîya vê berevokê da bi cî dikin, ji bo ku xwendevan bikaribin xêzikên taybet (ştrîx) ên dawîyê yên di derbarê gotûbêjên me da bixwînin.

***Amida Kurd***

# GOTÛBÊJA YEKEM

## RÊWÎTÎYA BERBI ŞENGALA PÎROZ VA, A KU DI NÎVÊ RÊ DA MA ... KONFÊRANS, A KU PÊK NEHAT… PIRSÊN BÊ BERSÊV MAYÎ. PIRSGIRÊKÊN LI SER RÊYA YEKÎTÎYA ÊZDÎYAN.

**AmidaKurd:** Mamoste dem baş!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş, ser çavan!

**AmidaKurd**: Spas ji bo wê, ku tu qayîl bûyî başdarî hevpeyvîna me bibî.

Wek ku em berê jî pevketibûn, me îro dixwast bi te ra li ser civaka netewî-ayînî ya êzdîyan, li ser wan pirsgirêkan û sersedemêmên peydabûna wan biaxivin, ên ku li pêşîya yekîtîya vê civakê dibin asteng.

Em govtûgoya xwe ji rêwîtîya we ya berbi Şengala pîroz va destpê bikin, a ku ji ber sedemên cuda nîvcî ma û neçû sêrî.

Di berfanbara sala par de di Şengalê de divê konfêransek li ser rewşa êzdîyan û êzdîtîyê pêk bihata, û tu jî divê beşdarî wê komcivînê bibûyayî…

Jixwe di gotara xwe ya "Li ber dergehên balafirgeha Slêmanîyê û…" de te di derbarê rêwîtîya xwe ya nîvcîmayî de vegotye. – Gotar di întêrnêtê da heye, yên ku bixwazin, dikarin, bi vê navnîşanê: *Ezîz ê Cewo*: "Li ber dergehên balafirgeha Slêmanîyê û…", an jî bi vê jêderkê: https://www.amidakurd.net/ku/tekst/LI_BER_DERGEHÊN_BALEFIR_GEHA_SILÊMANÎYÊ_Û_Paşgotina_bûyerên_pêkhatî wê bibînin û bixwînin …

Helbet, ew jî bi serê xwe bûyereke balkêş e û mijara axavtineke cuda ye…

Lê di wê gotara te de, mamosta, agahîyek a dinê jî bala mirov dikişîe. Tu dinivîsî, ku dema hûn ji mal derdiketin, ji bo ku herin balafirgeha Moskovayê, ji wir jî bifirin Silêmanîyê, di têlêvîzîonê da hatye ragîhandin, ku balafirên leşkerî yên Tirkîyayê êrîş birine ser Şengalê û êwirgeha penaberan a şehîd Rostem Cûdî ya li Maxmûran, ku di encama wan êrîşan da kuştî û birîndar çê bûne…

Lê peyra tu agahîyek ji wê konfêransê çê nebû, gelo ew pêk hat, an – na, çima?

**Ezîz ê Cewo:** Bi rastî, bêdengîyek û bêagahîyek desthilatdar e… Tu agahîyên me jî nînin… Di herêmê da şer heye. Rêjîma faşîst a Erdoxan har bûye, kesek nizanne, dê kengê û li kîderê çi hovîtî û barbarîyan pêk bîne… Ji xwe pakrewankirina Zekî Şengalî ya bi sûykasta hewayî ya ji hêla artêşa tirk va tê zanîn. Lewra jî, wek ku tê xuyan, amadekarên wê konfêransê ji ber pirsgirêkên ewlekarîyê ji bo demeke dinê û li cîyekî dinê yê bi ewle ew paşxistibin…

**Amida Kurd:** Naha em bên ser pirsa xwe ya sereke. Bala xwe bidinê, ewqas civîn, konfêrans û sîmpozîûm pêk tên, li ser tevkujîya êzdîyan û pirsgirêkên êzdîtîyê yên îroyîn ewqas tê axavtin û nivîsîn, ewqas bername di têlêvîzîonê de û bi radîoyê

tên pêşkêşkirin, lê dîsa jî pirsgirêk li dû pirsgirêkan dertên hole…

Balkêş e, eger êrîşên rêjîma faşîst a Tirkîyayê yên li ser Şengalê çê nebûna, û ew konfêrans pêk bihata, û, eger li Başûr rê li pêşîya we negirtana, û tu bikaribûyayî herî Şengalê û beşdarî wê konfêransê bibûyayî, teyê li wir çi bigota?

**Ezîz ê Cewo:** … Pirseke balkêş û di cî da ye!



Dizanî, bi dîtina min, konfêrans, sîmpozîûm, civîn, sêmînar û tiştên dinê yên li ser pirsên ewlekarîyê, rê û rêbazên parastina fîzîkî, her weha, rêxistin û tevgerkirina civakê pêwîst in û pir girîng in, lêbelê ew tenê bi serê xwe dê yekalî bimînin û têrê nakin, eger pirsgirêk-ên hindurîn ên civakê û sedemên wan pirsgirêkan bi rêya lêgerînên zanistî neyên zanebûn û watedarkirin… Û ev rêya jî, bi taybet ji bo pirsa êzdîyan û parastina êzdîtîyê  pêkan e û xwedî giringîyeke mezin e!

Hûnê bipirsin – çima?

Bibêjim!

– Belê, rast e, tevkujîyên êzdîyan pêk hatine û îro jî metirsîya dubarekirina wan heye. Li vira, ji bo ku li hember vê bê rawestandin, her bersîvek heye – divê em hemû bi netewî bibin yek, hêza xwe ya netewî saz bikin (mabesta min ne tenê hêza leşkerî ye!) û bi netewî jî gelê xwe, xaka xwe biparêzin…Û ev jî dê nikaribe tenê, yekalî bigihîne  encamên pêwîst û bigihîje armanca sereke, ango, *civaka êzdîyan* ji tunekirinê, an tunebûnê rizgar bike (kî çawa dixwaze, bila wisa jî bixwîne!) …Lewra ku, tunekirin tenê bi fîzîkî nine, ku dikare pêk bê û pêk tê!

Ji bo ku ev parçeyê dîrokî yê şaristanîya kurdî ya netewî ji bo nivşên pêşerojê bê parastin, karekî komplêks ê piralî me divêt – wek netew!…

Îro li ser vê rêyê astengîya here mezin ev tevlihevîya di têgihîştina (an, mirov bibêje, tênegihîştina!) *êzdîtîyê* bi xwe da ye – wek ol!

Û lewra jî îro metirsîyek heye, ya ku tu hêz jî nikare li hember wê raweste – ji bilî bi zanistî ravekirina rastîya vê olê û wê civakê, ya ku li ser bingeha wê avabûye, û anegorî wê jî zanekirina civakê bi xwe ye!

Mabesta min çi ye? – Ya ku ji êrîşên wek ên DAÎŞê zêdetir îro mala êzdîtîyê wêran dike û  êzdîtîyê roj bi roj tune dike û ji hole radike, nexwendîtîya olî ya di nav gel da ye … Û ev jî dibe bingeh, ku  hinek bikevin xizmeta hêzên derva û mejûyê gel tevî hev bikin.

Û ya ku ji bo êzdîtîyê metirsîyeke here mezin e jî, hema ev e!

**AmidaKurd:** Rast e, mamoste, lê biborîne, ma di nav kîjan gelî de xwendîtîya olî ya tam heye?

**Ezîz ê Cewo:** Tu rast î. Di nav tu gelî da jî xwendîtîya olî ya ji sedî sed nine! Lê gelên dinê sazîyên xwe yên olî hene: *dêr, mizgevt, sînagog* û sazîyên olî yên

dinê… Erkdarên wan ên olî, hîç nebe, li ser asta seretayî bingehên ola xwe, ferz û dogmên wê dizanin, pirtûkên wan ên pîroz ên cihêreng hene…

Lê ya me?

Ya me heya navê me jî guhartine, li şûna wî navekî dinê li me va kirine, û em jî vê yekê bi bêdengîyekê dipejirînin! Ev ji ku tê? Ma sedemên vê ji nexwendîtîya olî nayên? Eger gel têgihîştina xwe ya here sade ya olî li ser *êzdîtîyê* hebûya, dê ev hemû bipejiranda, gelo?

Helbet, na!

Û pirsa nav jî pir girîng e, hemû çarenûsa her mirovekî, gelekî, heya ya komekê, an rêxistinekê bi navê wî/wê va pêwendîdar e. Ew çi ku bi dîrokî pêk hatye an pêk tê, li ser bingeha wî navî pêk hatye û îro jî bi pwendîdarîya wî navî pêk tê… Hê bîrewar û zanîyarê antîk ê mezin, fîlozofê herî navdar ê Çînê Konfîtsîûs (sedasalên VI – V ên berî serdema me) di vê derbarê da gotye, eger navê yekê/yekî an tiştekî tê guhartin, hemû pergala hişmendî ya çarenûs û pêşeroja xwedîya/yê wî navî tevlîhev dibe…

Lê rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan jî di vê derbarê da weha dibêje: *"Eger navê te ji te standine, bizanibe, tu ji her tiştî bêpar hiştine, û tu êdî tu nînî!"* – Û, her çiqas ev gotin bi boneyeke dinê bi zanistî hatye formûlekirin, lê ew tam li vê rewşa *êzdîyan* û *êzdîtîyê* tê!

Tiştekî nebînayî pêk hatye! Navê me guhartine, lê em haj ji xwe nînin! Çawa dibe, mirov jî ewqas dikare xwe ji bîr bike, an di nava nezanîyê da wsa ketibe xewa mirinê?...

Binihêre, eger li şûna navê *'tirk' 'ktir'* bi kar bînin, li şûna navê *'ereb' – 'ebre'*, li şûna *'fars' –'frsa'*, li şûna *'ermenî' – 'enîrem'*, li şûna *'gurc' – 'cgur'* û yên dinê bikar bînin, dê xwedîyên wan navan ji cî veciniqin, veperikin rûyê wan, ên ku navê wan digihêrin û cîhanê li ser serê wan da welgerînin! Û ev helwest û bertek jî dê pir normal û xwezayî be, lewra ku ew di pirsa parastina nirxên xwe yên netewî da mafdar in!

… Lê ya me?

Binihêrin, çawa hinek ketine nava me û hêdî-hêdî, gav bi gav navê ola me ya kevnar guhartine, navekî dinê li me va qemitandine û li me dane pejirandin, di bin wî navî da naverokeke bîyanî (a xerîb) dane wê, *felsefe, bîrûbawerî* û *hemû pîrozîyên* me yên olî guhartine û em hînî wan kirine (dîsa hêdî-hêdî, gav bi gav, bi berekê va!), hemû pergala ola netewî – bi *felsefe, têgihîştina cîhanê, bîrûbawerî* û *pîrozîyên* me yên kevnar va, dane jibîrkirin… Û me jî, ji xwe ra serê xwe kirine ber xwe û ew hemû pejirandine.

Mabesta min ev herdu nav in *"ÊZDÎ"* û *"ÊZÎDÎ"*… Û wisa jî hemû navên pergalî yên *felsefî, bîrûbawerî* û *pîrozîyên* vê olê ne!

Hem di gotarên xwe da, hem jî di pirtûka xwe ya "Êzdîtî: divê mirov rastîya wê li ku bigere" da ez li ser vê mijarê rawestyame û min ew bi zanistî ravekirye.

Binihêrin, *Êzdî* yek ji navên *Xwedê* ye. Di *êzdîtîyê* da weha tê gotin: *"Hezar û yek navên Xwedê hene, Êzdî jî navekî Xwedê ye!"* Ev tê çi wateyê? Ev peyv ji peyverêza *"Yê ez dayî"* pêk hatye. Ango, *Êzdî* tê wateya *Xwedê* – ji vir jî navê *Ezda/Ezdan*! Û navê bawermendên vê olê jî, wek *'êzdî'*, ji peyverêza *"ya/yê ezdayî"* pêk hatye, ango, *yê/ya xwedayî*, ango mirovên *Xwedê*! Hemû navên *Xwedê* di kurdî da wateya xwe hene, û hemû wateyên wan jî *erkî* ne (fûnktsînal in!), ango ji wateya *erkekê* saz bûne û Xwedê bi wê erkê nas dikin û didin nasîn! Mînak, peyva *Xwedê* jî

wateya xwe heye. Li ser vê jî gotinek di *êzdîtîyê* da heye, tê gotin: *"Xwedê cîhan sêwirandye, lê hîç kesî Xwedê nesêwirandye – Xwedê xwe da ye!"*… Û ji vira jî Xweda/Xwedê!

Û pirseke dinê jî: binihêrin peyvên *Xweda* û *Xweza* çiqas mînanî hev in, rasttir dibe, mirov bibêje, bingehên wan yek in… Lewra jî di dîrokê da ji êzdîtîyê ra wisa jî gotine ola xwezayperest! A, ev e, ku êzdîtîyê ji olên dinê yên kevneşopî cuda duke… Kesekî pîroz, pêxemberekî ev ola nesêwirandye, ew di pêvajoyeke demdirêj bi xwezayî di nava civakê da pêk hatye, û efrînerê wê jî gelê kurd bi xwe ye. Ango, *êzdîtî* di xwezaya Kurdistanê da, di nava civakê da bi xwezayî pêk hatye û hemû *bawerî, perstin* û *pîrozîyên* wê bi xaka Welatê me va girêdayî ye… Dibe ku lewra jî, îro di nav kurdên misulman ên sade da ferzên êzdîtîyê, felsefa wê ya têgihîştina cîhanê bêhtir hatine parastin, ne ku di nav wan êzdîyan da, yên ku bûne *êzîdî-sofî*...

**AmidaKurd:** Ango, *Êzdîtî* û *Êzîdîtî* ne heman ol e…?

**Ezîz ê Cewo:** Helbet, na! Û hema pirs jî di vê da ye: *Êzdîtî* û *Êzîdîtî* ne yek in, ew du bîrûbawerîyên cuda ne – *Êzdîtî* ola gelê kurd a kevnar e, *êzîdîtî terîqateke îslamê* ya *sofîtîyê* ye.

Û navê vî şaxî jî ji navê yek ji xelîfên îslamê, *Yezîd bên Muavî ebî Sifyan* ê Omeya tê, yê ji Mekkayê û ji eşîra qurêşîyan bûye, û pismamê *Mehmed* pêxember ê dûr bûye.

Yezîd (an jî, Sultan Êzîd, wek ku êzdî wî nav dikin) lawê Muewî bên Ebu Sufyan bûye. Berî Êzîd xelîfet di destê malbeta Mehmed pêxember da bûye. Û ev jî ne tiştekî veşartîye!

Ew, ku *êzîdîtî* (ne *îzdîtî*, ha-a!) sofîtî ye, ango, sûfîzm e, olzanên vê tarîqatê yên ku wek pisporên olî di nava civaka *êzîdîbûyî* da tên naskirin û pejirandin, bi xwe di nivîsên xwe da didin zanîn… Di vê derbarê da bi hûrbînî di gotara mina a "…Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê tunekirin û ji hole rabe?!.." da heye. Ezê li vira her parçeyekî ji wê gotarê bînim. Li wir min gotinên Hoşeng Broka nirxanine. Weha, ew biradera gazinên xwe çawa tîne zimên *"...Her gava ku zanayek, lêkolînvanek, teyologek yan dîroknasekî Êzîdî rastiya Şêxadî û qonaxa Şêxadiyetiyê wek qonaxeke **sufîst a herî berz** di Êzîdiyatiyê de, ku wê demê netewayetî û sînorên wê nas nedikirin, bike, nasyonalîstên Kurd dinyayê xirab dikin, mîna ku gunehkariyek hatibe kirinê"*– Di vê derbarê da xwendevan dikarin bi hûrbînî di gotara *Ezîz ê Cewo* ya "...Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê t'unekirin û ji holê r'abe?!.." da bixwînin, gotar di întêrnêtê da heye! – https://amidakurd.net/ku/tekst/çima_divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe).

Her çiqas, hîç pêdivî bi îzbatîyan jî nine, ew terîqat bi xwe – bi hemû pergala xwe, pîrozî, bîrûbawerî û felsefeya xwe ya olî va, bi têrmîn, nav û qewlên xwe va li hole ye… Kesek nikare wan mirovan bixapîne, yên ku pirî-hindikî dîroka pêkhatina olan dizanin û cudahîyên wan ên bingehîn têdigihîjin…


Û li hember pirsa Hoşeng Biroka ya *"...mîna ku gunehkariyek hatibe kirinê"* jî di nava civakê da du helwest dikarin hebin:

**ya yekem**, ên ku di nav wan da hest û têgihîştinên *êzdîtîyê* hê tam nehatine kuştin-tunekirin, naxwazin, ku *êzdîtî* heya dawîyê werguhêrî *terîqata îslamî-sofîtîyê* bibe û bê tunekirin, ji bo wan, belê, *"... gunehkariyek hatiye û tê kirin"*;

**ya duyem**, ên ku êdî di nava *êzdîtîyê* da *kirasê sofîtîya îslamê* li stûyê xwe danîne, û daw û delingê xwe hildane jor, ketine *xizmeta îslamîkirina êzdîtîyê*, ji bo

wan ev pêvajo tiştekî normal tê dîtin, lewra ku bi vê kontsêptê divê bingehên ola kevnara ya gelê kurd bên tunekirin... Û ev jî, ji bo gelê me pêvejoyeke pir bi xeter e!

Di dema xwe da gemgeşîyên me di medya civakî da pêk hatine û peyra bi zanistî hatine tomarkirin û bi rêzegotaran di çapemanîyê û medya civakî da hatine weşandin. Min hewl daye, ku hemû rastîyan li ber çavan raxim… Û lêgerînên min ên zanistî û encamên wan jî paşê di pirtûka min a navborî da hatine tomarkirin...




Dema mirov li van hemûyan, bi çavekî zanistî û heşmendî dinihêre û dinirxîne, dibîne, eva ku anîne û îro jî tînin serê *êzdîyan* û *êzdîtîyê*, ji êrîşên Umer bên Xettab heya bê-derê yên DAÎŞê xirabtir û xetertir e! Û, lewra jî, bêyî rayê mirov di kûrahîya ruhê wî da hewar û hêwarzeyek rû dide …

Fermo, bala xwe bidinê: îro jî, roj di nava rojê da hemû komele, sazî, çapemanî, weşan, radio têlêvîzîon vî karî didomînin, piranî bi nezanî, lê hinek – bi zanebûn. Û yên ku van karan pêk tînin, û yên ku li pişt van va sekinîne û wan rêvedibin, ewana sparîşa hinek hêzên derva ya heya dawîyê misulmankirina *êzdîyan* û *êzdîtîyê* pêk tînin … Ango, êzdîtîyê, wek bingeha ruh û rewana netewî, tune dikin û ji hole radikin!

Û, lewra jî, dema îro her yek ji hindava xwe va dibêje, ku pêwîst e, êzdîxane bibe yek, mirov matma dibe û dixwaze dipirse:

– Gotina wan di derbarê kîjan êzdîxaneyê da ye? Ew yekîtî bi çi awayî dikare pêk bê – çawa û bi kê ra?!

**AmidaKurd:** Bi rastî jî, mamaoste, yekîtî pir girîng e! Ew çawa dikare pêk bê, tu bi xwe pêkhatina wê yekîtîyê çawa dibînî?

**Ezîz ê Cewo:** Ji bo ku ev yeka pêk bê, berê pêşin, divê bê zanîn, di nava tu netewekê da hemû beş, kom û şaxên wan ne yek in, û nikarin jî heya dawîyê yek bibin! Ango, yekîtîyeke absolyût – ya ji sedî sed, nine! Ev – yek! A dinê jî, hê pirs e, ka nûnerên du olên cuda çawa dikarin bibin yek – ew jî yên du olên bi bingehên xwe va rikberî hev?

Belê, yekîtî baş e, û ew dikare pêk bê, dema hemû beşên civakê hebûna hev dipejirînin û ji hev ra rêz digirin! Lê di vê rewşê da, dema pêvajoya ***sofî-îslamîkirina êzdîtîyê*** pir aktîv bûye, ji bo wê yekîtîyê her rêyek hatye hiştin – ku yek ji wan divê

bê tunekirin – û ew jî *êzdîtîya resen* e! Û evê jî îro gav bi gav bi biryar pêk tînin, *êzdîtî* tê tunekirin, hemûyan dikin *êzdîdî-sofîyên îslamî*… Û, wek ku min êdî gotye, di nava êzdîyan da nexwendîtîya olî heye, lewra jî hemû serê xwe dikin ber xwe û didin dû wan *şerletanan*, ên ku sparîşa hêzên derva pêk tînin – hinek bi zanebûn, hinek jî ji nezanîya xwe!...

Bala xwe bidinê, heya naha digotin piştî *Xwedê* li ser erdan Şîxadî ye (Şêx Adî), bingeha sereke ya vê bawerîyê îro jî wek "Mala Adîyan" tê zanîn... Û dema berbirî yekî an çend oldaran dibin, an wan slav dikin, hê jî dibêjin: "Terêq ji *Mala Adîyan* li ser çavê me ra hatine!" Heya hinek êzdî dibêjin: Em edewî ne, ango, adewî, ango, ên ku li dû Adî diçin…Ango, Şêx Adî êdî di nava jîyana êzdîyan a rojane ya rewanî da wisa cîyê xwe girtibû, ku beşekî ji wan xwe wek gelê wî nas dikir. Lê, piştî wê, dema êdî dîroka Şêx Adî derkete hole, hate weşand – bi wêneyên mezergeha wî ya li Cûlaemêrgê (Hekkarî) va, dema rastya wî *fîlozof* û *erkdarê îslamê* bi hemû hûrbînîyên xwe va derkete ber çavan, naha jî Şerfedîn derxistine holê, dibêjin em *êzîdî* ne, dînê me *Şerfedîn* e…

Û ji bo kû evê nêrînê, ya ku ne tenê dûrî rastîyê ye, lê wisa jî dûrî heş û sewdayê merivê normal e, bidin pejirandin, hildane ew stran, a ku di wê da tê gotin: "Şerfedî e, ... ji dînê me ye!" guhartine, kirine: "Şerfedîn e, ... dînê me ye!"... Û îro jî bi radîo, têlêvîzîonan û di cejn û şahîayn da van gotinan dubare dikin…

Û kesek napirse: "Ka, hela rawestin, we ew ji ku anî? We çima hema wisa ji carekê va Şîxadî bi hêsane danî hêlekê, heya navê wî jî nadin? Çima? Ji ber ku hemû rastîya Şîxadî derket hole, ji ber wê? Ê, naha jî, hemû rastîya Şerfedîn derketye hole, va, mezergeha wî jî li Şengalê ava kirine – li ser tûjikê wê *sembola îslamê – hêker* (hîva kerî) danîne. Ê, paşê hûnê kê bigerin-bibînin, û li stuyê vî gelê reben bialînin?"

... Lê, eger ev kesana, yên ku ji ber nezanîya xwe li vir û wir tişt û navên nû digerin, ji bo ku bînin û li stûyê vî gelî bialînin, bikaribûna çavkanîyên cuda bixwendana, bingehên resen ên êzdîtîyê derxistana zanebûnê û bidana zanîn, berê xwe dane terîqet û kesayetîyên îslamê yên zêde ne dîyar. Çima?

Û, ji bilî vê, eger van mirovana bizanibûna, ku navê Şêx Adî, yê ku dê û bavê wî lê kiribûne, bi xwe Şerfedîn bûye (Şêx Şerfedîn!), lê Adî nasnavê wî yê erka olî ye, balkêş e, wê demê dê çawa tevbigeryana? … (Di vê derbarê da, yên ku bixwazin, dikarin di gotara Feqe Huseyn Sagniç a "Şêx Adî" da bixwîni, ew di întêrnêtê da heye! – http:// www.nefel.com/articles/article_print.asp? ArticleNr=1859).

Û ev jî ne bes e, di paytexta Gurcistanê, bajarê Tbîlîsîyê da bi navê êzdîtîyê zyaretek avakirine û li ser tûjikê wê jî dest danîne… Dest jî di îslamê da sembola çi ye, ji xwe tê zanîn (destê dota Mehmed pêxember!)… Û ev bingeha xwe ji ku digire? – Yek ji îdêologên îslamîkirina êzdîtîyê pîr Dîma vekirî dibêje, ku *êzdîtî* ne ola *kurmancîaxêvan* tenê ye (heya naavê kurd jî nade), ku ew wisa jî ola *aramîaxêv* û *erbîaxêvan* e… Ma, ev tê çi wateyê? Ma ew kîjan ol e, ya ku li ser bingeha wê *kurmancîaxêv* û *aramî-erebîaxêv* digihîne hev? Belê, her kesek dikare bibêje – îslam e! Û, eger heya ew *kurmancîaxêvan kurd* jî nav nake, wê demê çi dimîne? ... Ma ne, ji bo ku hemû li ser bingeha olî bibin ereb, gavek dimîne! (di vê derbarê da bi hûrbînî di pirtûka min a navborî da heye, di rûpelên 205 – 213an da, Yên ku bixwazin dikarin wê di întêrnêtê da bi vê navnîşanê bibînin: *Ezîz ê Cewo*: "Êzdîtî: divê mirov rastîya wê li ku bigere?")…

Dizanî, li vira ya here xeter çi ye?

Binihêre, her çiqas piranîya kurdan misulman in jî, di nav wan da sunnîtî û şiîtî, bi terîqet û şaxên îslamê yên cuda va hene, lêbelê, ji wan hîç yek jî *kurdîtîyê* red nake, lê ev, ên ku me li jorê behsa wan kir, her tiştê ku ji destê wan tê û nayê bi kar tînin, ku êzdîyan ji bingeha wan a netewî qut bikin û, wek ku di nav gelê me da tê gotin, bikin xurê guran! Çima? – Ya ku îro divê derê zanebûn jî, hema ev e!

Ew *êzdîyên sade*, yên ku nizanin, ka êzdîtî çi ye, heya radeyekê şûcê wan nine, lê ew. ên ku xwe rewşenbîr û mitaledar dihejmêrin, pêwendîyên wan bi navendên êzdîyan ra hene, heya radeyekê, eger ne pispor bin jî, xwe zaneyên êzdîtîyê dihejmêrin, heya car bi car di medya civakî da şûrê xwe yê virtual (an – on-layn!?) jî bawerdidin, lê di vê rewşê da dengek ji wan dernayê. Çima? Wek ku ji bo hinekan di dema Sovêtê da wek laqirdîyekê digotin: “Zikê wan têr, xurekê wan belaş, jiyana wan şad û bextewar e!” – Erê?

Bala xwe bidinê – tam pêşenîyek (cephe) vekirine – ji bo ku êzdîtîyê ji hole rakin, lêbelê evên ku divê, hîç nebe, ji bo xatirê erka xwe, dengek ji wan derketa, li dora wana bêdengîyeke wisa heye, ku dengê werzebayekî sivik jî tê bihstin, û ew ji xwe ra di nava hêçxemîyekê da dijîn … Lê ka, ew gotinên wan ên bilind û gulover ên di derbarê Şîxadî û şîxadîtîyê da li ku man? Demekê heya di nava gel da xwe edewî dihejmartin, ango adewî, ango yên ku li du bawerîya Adî diçin, û ev gîhandibûn asta *netewnavekî* (êtnonîm), lê naha jî, dema hinek derketine, wek ku min li jorê got, nizanim ji ku Şerfedîn derxistine, dibêjin – em *êzîdî* ne, dînê me *şerfedîn* e, evana dîsa xwe telandine û dengek ji wan dernayê. Kesek nake qêrîn û hewar: *“Rawestin, bes e, hûn bi vî gelî bilîzin!”* … Ji hêlekê va mirov matma dibe, hinek, nezanîya wan gihîştye asta here bilind, ji hêla dinê va, yên ku xwe zane û destûrmend (*kompetent*) dihejmartin, tiştekî wan nîne, ku li hember wê nezanî û êrîşkarîyê derxin pêş!

Û, balkêş e, kî divê îro li hember vê pêvajoya bi xeter – dûmahîka êkspansîya erebkirina Kurdistanê raweste, ya ku bi êrîşên Ummer bên Xetab va despêbûye û bi DAÎŞê gihîştye van rojên me?!

Û, eger mirov evê tevgera van kes û rêxistinan rast binirxîne, dê derê zanebûnê, ku ev hemû ji bo *êzdîyan* û *êzdîtîyê* ji êrîşên çekdarî xetertir e! ...

**AmidaKurd:** Baş e, mamoste, gelekî spas! Em goftûgoya xwe li ser pirsa yekîtîya êzdîyan di xeleka hevpeyvîna xwe ya duyem da bidomînin.

**Ezîz ê Cewo:** Başe, ser çavan!

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**14.04.2019**

# GOTÛBÊJA DUYEM

## EGER MIROV BIKARIBE REHÊN WÊ BÊDADÎYÊ RAVEBIKE, YA KU LI HEMBER ÊZDÎYAN Û TEVAHÎYA GELÊ KURD PÊK HATYE ÛBÛYE SEDEMA ZORDARÎYÊ, NUXSANÎYÊ, ŞÊLANDINÊ Û TEVKUJÎYÊ, DÊ BIKARIBE TÊ BIGIHÎJE, KA ÇIMA ÊZDÎTÎ NE JI HÊLA ÊZDÎYAN BI XWE VA, NE JÎ JI HÊLA KURDÊN DINÊ VA HEYA DAWÎYÊ NEHATYEWATEDARKIRIN, JI BER WÊ JÎ EWANA GELEK TAYBETMENDÎYÊN OLA XWE YA NETEWÎ – ÊZDÎTÎYÊ, WINDAKIRINE…

**AmidaKurd:** Mamosta, dem baş!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş, ser çavan!

**AmidaKurd:** Em govtûgoya xwe li ser wan pirsgirêkan bidomînin, ên ku li ser rêya avakirina yekîtîya di nava civaka êzdîyan de dibin asteng.

Piştî weşana beşê yekem ê vê hevpeyvînê dîsa hinek pirsên me peyda bûne, di sêrî de em wan binirxînin, paşê derbazî mijara xwe ya bingehîn bibin.

**Ezîz ê Cewo:** Belê, fermo, ez guhdaar im!

**AmîdaKurd:** Di tevahîya dîrokê da li hember êzdîyan, wek ku li hember tevahîya gelê kurd, hertim zordarî pêk hatye: ew nuxsan kirine, şêlandine, êrîşên girseyî û tevkujî li hember wan pêk anîne, ji ber wê jî ewana bi demê ra gelek taybetmendîyên ola xwe ya netewî – êzdîtîyê wind kirine. Lewra jî, dibe ku, îro êzdîtî ne ku tenê ji hêla kurdên dinê va, lê, her weha ji hêla êzdîyan bi xwe va heya dawîyê nehatye watedarkirin. Balkêş e, ev netênegiîştin û hêçxemîyeke wisa li bal hemû kurdan hebûye: hem li bil kurdên êzdî, hem jî li bal ên ne êzdî? Di rewşeke weha tevliev û aloz da, dema hemû pirsgirêk bi berjewendîyên “rêberan”, malbetan, berekan û rêxistinan va li hev piçikîne, carna tuyê bibêjî, rêyek nîne, ku mirov ji vê bêçaretîyê derê.

Balkêş e, rêyên çareserîya pirsgirêkan tu çawa dibînî? Te dikaribû bi hinek rêzikan sersedemên dyarbûna helwesteke weha ravekiria, her weha rêyên berterefkirina wan pirsgirêkan bida xuyan, ên ku li ser rêya pêkhatina yekîtîya netewî dibin asteng?

**Ezîz ê Cewo:** Ez dibêjim, ji bo vê pirsê, mixabin, bersîveke yekawa mirov dijwar bikaribe bibîne. Lewra ku di vê pirsê da ew faktor, ên ku tu nav dikî, hemûyan jî, ji bo rewşeke weha derê holê, rola xwe lîstine: hem berjewendîyên ferdî, malbatî, eşîrî û rêxistinî, hem jî gelekên dinê yên obyêktîv û sûbyêktîv! Lê, divê bê zanînin, ya ku gîhandye vê rewşa tirajîk jî, ne îro û ne jî duh destpê nebûye, ev ji kûraya

dîrokê tê, dema olên kevneşopî li ser sehna dîrokê peyda bûne, dema ew olana bûne olên dewletê û mil bi mil bi dewletên xwe ra tevgeryane... Lê ya here sereke, wek ku min êdî di beşê yekem da jî anye zimên, ew ji êkspansîya erebî-îslamî ya Ummer bên Xettab va destpê bûye, wekî dinê çi ku pêk hatye, dûmayî û encamên wê ne: hem êrîş û tevkujîyên li ser gelê kurd – bi giştî, hem ev êrîşên DAÎŞê yên vê dawîyê, hem jî ew mîssîonêrîya qewalên îslamê, ya ku sedê salan di nava êzdîyan da pêk anîne û îro jî bêhtir aktîv bûye... Û di rewşeke weha da, di pêvajoyeke 1350 salî da gelek nirx û bingehên bawerîyên ruh û rewanî yên netewî hatine tunekirin, lewra jî, eger îro di nav kurdan da (çi êzdî, çi ne êzdî, hîç ferq nake!) tênegihîştina êzdîtîyê heye, ev hemû encamên wê pêvajoyê ne! Hem jî divê bê zanîn, ew pêvajoya îro jî bi aktîvî dimeşe, û ew kes û komikana, yên ku min di beşê yekem da behsa wan kir, çalakvanên wê pêvajoyê ne!

Lê, ya girîng, divê bê zanîn, ku ev êrîş, bi hemû reng û şêwazên xwe va, ne tenê û ne ewqasî li dijî êzdîtîyê ye, wek olekê, çiqasî li dijî gelê kurd û nirxên wî yên netewî ye... Ya ku dagerkeran û dijminên gelê kurd ditirsîne, ew e, ku, her çiqas ev 1350 sal e, îslam li gelê kurd hatye ferzkirin jî, lê kurdan dêmê xwe yê netewî, sekna xwe ya ramanî û rewanî winda nekirine!

**Amîda Kurd:** Mamoste, bi raya min ”ol” bi xwe pirsgirêk e û ez ne di wê baweriyê de me, ku ji destpêka destpêkê ev êzdîtî olek be. Di bingeha rastiya êzdîtiyê de, wek ku we gotîye, tevger û pêşkeftinên xwezayî hene û êzdatî li gor van tevgeran teşe û reng girtiye. Ango, êzdatî divê ne li gor wateya “ol”ê ya serdest a îroyîn, lê li gor wateya wê ya destpêkê, sedemên bingehîn ên avabûna vê baweriyê bê nirxandin, ku ev jî ne ol e, lê felsefeya jiyanê ye. Piştre ev rastî û bingeh ji aliyê gelên din ve û bi sedemên cuda hatiye manîpulekirin, rengekî derxwezayî dane wê, hezar çîrokên fantastîk, ên ku tenê ji xiyal û fantaziyên mirovan der bûne, li ser wê hatine honandin û bûne olên cuda. Di nav herikîna demê de ev felsefeya jiyanê bi xwe jî, mixabin, li gor vê serobinkirinê teşe û nav jî guherandiye û ji rastiya xwe ya xwezayî dûr ketiye, rasttir dibe, ku mirov bibêje, ji rastiya xwe ya xwezayî hatiye dûr xistin. Îcar ji bo rastî pêk bên û bibin serdest, bi raya min, divê Êzdatî ne wek ol, lê wek felsefeyeke jiyanî bê navkirin û nirxandin, wek ku di felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de jî ev rastî bi zelalî tê dîtin. We got çi?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, belê, rast e, û her tişt, ê ku di beşê yekem da hatye zimên û dê ji vir û pêva jî bê gotin, hemû jî evê yekê ravedike û wê ji vir pêva jî rave bike û derxe zanebûnê. Em hema parçeyekî ji beşê yekem ê vê govtûgoya xwe li vira bîr bînin. Li wira min gotibû, ku: “... di dîrokê da ji êzdîtîyê ra wisa jî gotine ola xwezayperest! A, ev e, ku êzdîtîyê ji olên dinê yên kevneşopî cuda dike… Kesekî pîroz, pêxemberekî ev ola nesêwirandye, ew di pêvajoyeke demdirêj bi xwezayî di nav civakê da pêk hatye, û efrînerê wê jî gelê kurd bi xwe ye. Ango, êzdîtî di xwezaya Kurdistanê da, di nava civakê da bi xwezayî pêk hatye û hemû bawerî, perestin û pîrozîyên wê bi xaka Welatê me va girêdayî ne… Dibe ku lewra jî, îro di nava kurdên misulman ên sade da ferzên êzdîtîyê, felsefeya wê ya têgihîştina cîhanê bêhtir hatne parastin, ne ku di nav wan êzdîyan da, yên ku bûne êzîdî-sofî...” – Û ev jî bi xwezayî di nava her warekî jîyana gelê kurd da, di nava ramana netewî da, di çand, huner û wêjeya netewî da xwe dide der, û di pêşerojê da jî dê bêhtir rûbide... Ji xwe tu warekî jîyana gelê kurd nîne, li ku şopên bîrûbawerîyên pêşîyan nînbin – çi yên êzdîtîyê bin, çi – yên zerdeştîyê. Eger tê bîra te di pirtûka “Zerdeşt pêxember (Rûpelên dîroka “windabûyî”...)” da min bal kişandibû ser vê mijarê û gotinû: “Û ya

balkêş jî ew e, ku, dema hinek di derbarê bîrûbawerîya *zerdeştîyê* û bîrdozîya Tevgera Rizgarîxwaz a  Netewî da diaxivin, ewana hinek têgihîştinên xwe yên bîrûbawerîya  zerdeştîyê bi îdêolojîya Abdullah Ocalan şirove dikin...” – Û ev yeka ji bo îzdîtîyê jî pêkan e, lewra ku bingehên *êzdîtîyê* û *zerdeştîyê* yek in. Ev jî xwezayî ye! Û min bi hûrbînî ev yeka di berhemê da ravekirye (di vê derbarê da bi hûrbînî  di pirtûka Ezîz ê Cewo ya “Zerdeşt pêxember (Rûpelên dîroka “windabûyî”...)” da heye – rûpel: 101 – 108! Pirtûk di întêrnêtê da heye – https://www.academia. edu/ 38211603/ZERDEŞT_PÊXEMBER_ RÛPELÊN_DÎROKA_WINDABÛYÎ_..._).

**AmîdaKurd:** Baş e, mamoste, spas ji bo şiroveya te!

Ka, em dîsa vegerin ser pirsa yekîtîya navxweyî ya êzdîyan. Bi dîtina te, ji bo yekîtîyeke pêkan çi rê û rêbaz hene?

**Ezîz ê Cewo:** ... Belê, yekîtî tiştekî pir pêwîst û bi kêr e, heya mirov dikare bibêje, ew misogerîya hebûna her gelî ye – wek netew.  Lêbelê, ew tiştekî teknîkî nine – hildan, li hev berev bûn û bi fîzîkî li dora hev civyan, an civandin, û bûn yek! … Yekîtî ji têgihîştina nirxên netewî tê, ji têgihîştina bawerîyê (ne tenê ya olî, wisa jî ya bîrdozîya netewî!) – ji bawerîya serkevtina ramana mirovî-netewî tê! A li ser bingeha vê têgihîştinê jî yekîtî dikare pêk bê… Û, ya sereke, divê her kes bizanibe, ka ji bo çi û li dora çi ramanê an nirxî
dibin yek. Eger ev hemû di serê wan da zelal nebûbe, pêkhatina yekîtîyê dijwar e!

Wê demê, tuyê bipirsî: “Di rewşeke weha da divê mirov çi bike?”

– Li vira jî her rêyek heye, ew rê jî ya rojekê an mehekê, heya ya salekê-duduyan jî nine, divê bi sebir çavê gel li ser rastîyan bê vekirin, wî bi raman û bîrdozîya netewî bi têgihîştinî xinê û xurt bikin, wê  demê ewên ku di xizmeta dagerkeran da ne, dê rût û tazî li hole bimînin…

Ev wek prênsîp – ji bo pêvajoyeke demdirêj a pêkhatina yekîtîyê!

Û, divê bê zanîn, ku ev yekîtî jî derî yekîtîya netewî ya gelê kurd a giştî nikare pêk bê û misoger bibe, lewra ku ji bo pêkhatina wê li cîyekî dinê hîç bingehek jî nine, berovajî vê, evên ku hewl didin, ku êzdîyan bikin êzîdî-sofî û ji bingeh û goveka wan a netewî-kurdî qut bikin, ew bi xwe çeka di destê wan  hêzan da ne, yên ku bi her awahî rê û rêbazan  digerin, ka çawa êzdîyan ji reha wan a netewî qut bikin û bibişêvin … Û, bala xwe bidinê, lewra jî ew êzdî, yên ku li dû vê rêya xeter diçin, ji îdêya xwe ya netewî dûr dikevin û bi hêsane di welatên Sovêta berê û Ewropayê da tên bişavtin. Û sedema vê pêvajoyê ya sereke jî kêmasî, an nebûna xwenaskirina netewî ye, lewra ku  serê wan bi ramanên tewş û bi xeter tuje dikin, ku, xwedêgiravî, êzdî ne kurd in, ew gelekî cuda ne, û ola wan jî şerfedîn e… Û evên ku ev ramana hanê bi sunî hinartine, bi tu awahî nikarin wê bikin xwedî naverokekê, û lewra jî di serê her yekî/yeka ji wan da pirs dertê – eger êzdî gelekî cuda ne, lê welatê wan li ku ye? Û, ji bo ku vê valahîyê tuje bikin, vê carê jî hildane û peyva “Êzdîxan” hinartine... Eger tê bîra xwendevanan, hê sala 2015an di gotara min a “Êzdîxan” an “Êzdîxane”?–Kîjan ji wan rast e û tê çi wateyê?” da nepêkanîya vê peyva bi sunî hinartî hatye ravekirin û bi analîza zimanzanî-êtîmologî wateya peyva kurdî ya “êzdîxane” hatye şirovekirin (xwendevanê bikaribin vê gotarê bibînin û bixwînin, eger di lêgerka întêrnêtê da binivîsin: *Ezîz ê Cewo*: “ “Êzdîxan” an “Êzdîxane”?–Kîjan ji wan rast e û tê çi wateyê?”, an jî bi vê jêderkê: https://amidakurd.net/ku/ tekst/êzdîxan_an_êzdîxane_k_îjan_ji_vana_r_ast_e_û_tê_çi_wat_eyê ).

Helbet, ew xwendevan, ên ku dixwazin û amade ne, rastîya vê pirsê bizanibin, dê vê gotarê bixwîni, lê ezê li vira her tiştekî bibjim – eger, ewên ku ev peyva bi sunî

hinartine, hema piçekî agahîya xwe ji êzdîtîyê hebûna, an, wek ku di nava gel da tê gotin, eger hema mûyekî êzdîtîyê bi wan ra hebûya, û, ya sereke, eger wan zimanê kurdî bizanibûna, ma wê peyveke weha ji ber xwe derxistana? Eger, evên ku bi NEZANÎya xwe ya bingehên zimanê kurdî û ola êzdî bi vê peyvê şêwazdar (formûle) kirine, ne ku tenê bi nav (bi şikilî) êzdî bûna, lê di nava civaka êzdîyan da mezin bibûyana (ne di nava civaka êzîdîyên sofî-îslamî da, yên ku Hoşeng Biroka behsa wan dike!), dê bizanibûna, ku "...dema êzdîyan gotine êzdîxaneya Serhedê, êzdîxaneya Ermenîstanê, êzdîxaneya Gurcistanê, an yeke dinê, mabesta wana civakên êzdîyan ên wan deveran bûye. Gelê me, wisa jî ji civaka mirîdan ra gotye mirîdxane, ango, civaka mirîdan. Hew!

Û, ji bilî vê, dema kalên me digotin ***êzdîxane*** û ***misulmanî***, mabesta wan du civakên (beşên) gelê kurd bûye – civakên kurdên êzdî û kurdên misulman.

Û di rastîya xwe da, ya ku li holê ye jî, hema ev e!"

Lê, wek ku tê xuyan, hîç xema kesekî jî nîne, her kes karê xwe pêk tîne: yên ku erka îslamî-erebkirina êzdîyan û êzdîtîyê wergirtine, wê erkê pêk tînin, ên dinê jî, xwedêgiravî li dijî van in, lê bi nezanîya xwe yan bi zanebûn avê berî ser aşê wan didin!

Hinartina vê peyva "Êzdîxan/Êzîdxan" jî ji hêla xwe va careke dinê wê gotina wan piştrast dike, ku: "Êzîdî ne kurd in!" Û, eger ew ne kurd in, wê demê ne êzdî ne jî, lewra ku, eger ew kurd bûna û êzdî bûna, dê rastîya vê peyvê bizanibûna û tiştekî wisa yê dûrî heş û swedayê normal dernexistana pêş...

A, ya ku divê bê têgihîştin jî, hema ev e! Û divê hem êzdîyên sade, hem oldarên êzdîtîya resen, hem dilêş û xemxurên vê civakê, hem rêxistin û sazîyên civakî û siyasî yên gelê kurd vê rewşê bi baldarî binirxînin...

**AmidaKurd:** Baş e, mamoste, ev jî hat têgihîştin. Lêbelê, gelo mirov dikare, eva ku pêk tê, tenê bi propaganda der û hundur va girê bide, ma wek ku te jî li jorê got, ji bo van hemûyan wisa jî bingehên obyêkîv nînin?! Eger hene, ew kîjan in?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, mirov dikare wan bingehan, sersedeman weha dabeş bike:

**a) ya yekem:** wek ku êdî hatye gotin, her tişt ji êkspansîya erebî-îslamî ya li ser Kurdistanê ya bi serkêşîya Umer bên Xettab destpê bûye (sedsala VII); ji xwe beşekî gelê kurd ê xwedî bawerîyên xwe yên resen (*êzdî, zerdeştî* û yên dinê!) di bin şûrê xezebê ra derbaz kirine, herçê kuştine, darvekirine, mal, gund û bajarên wan wêran û talan kirine, yên dinê, îslam li wan ferz kirine... Lewra jî, di nava kurdan da bi giştî ev bûye sedema metirsîyeke hertimî û di nava rûh û bîra wan da tirsek daye rûniştandin. Û, eger di nava beşekî kurdan da bîra netewî li dijî vê berxwedaneke hindurîn afirandye, hinekên dinê ji vê metirsîyê tirsek jîyane di navberê da mane, lê hinekan jî ev yek ji bo xwe tiştekî çarenûsî dîtine û tam xwe spasrtine pêla vê pêvajoya dîrokî;

**b) ya duyem:** pey vê ra herçê kurdên êzdî yên ji wan tevkujîyan filitî bûne, xwe dabûne bilindcîyan, hafên çîyayên hasê û bi awayekî xwe parsatine; lê ji bilî van gelek kurd piştî ferzkirina îslamê jî nîv veşartî gelek ferz û têgeh û nirxên ola pêşîyan di kûrahîya ruhê xwe da parastine, û hinek rê û rêbazên xweparastinê geryane... Wek mînak, her çiqas îro di nava gel da tenê di derbarê hebûna qubeya Lalişa pîroz da dizanin, lê li seranserê Kurdistanê, bi taybet jî, li herêmên çîyayî bi sedan qubeyên wî rengî yên biçûk û mezin hatine parastin. Û kurdên misulman li wan xwedî derdikevin, diçin ber wana dua-drozgeyên xwe pêk tînin... Di hinek deveran da jî, ji bo ku wan ji êrîşên îslamîyan biparêzin, hêker (hîva kerî) li ser tûjikên wan danîne...

Lê bi hatina Şîxadî ya nav êzdîyan ra, û bi wan rêforman ra, yên ku bi navê wî ra tên girêdan, êdî gelek têgeh, nav û têrmîn û ferzên îslamê hatine nava êzdîyan. Û ev jî bi carekê ra pêk nehatye. Ev pêvajoyek e, ya ku heya îro jî didome…

Û tiştê herî xeter ew e, ku îro piranîya komele û sazîyên êzdîyan, hêmanên çapemanîyê û radîo-têlêvîzîonên bi wan ra pêwendîdar ketine xizmeta vê pêvajoyê – wek ku min li jorê jî êdî gotye, hinek bi nezanîya xwe, hinek bi zanebûn!

**c) ya sêyem:** di dema xwe da bi Şîxadî ra wisa jî bawermendên ne kurd ên ji terîqeta êzîdî-sofî-îslamî hatine nava êzdîyan. Piranîya wana ji hêla zimên va di nava civaka êzdîyan da întêgre bûne (hatine bişavtin), lê sofîtîya xwe ya îslamî parastine, û rengê xwe dane vê civakê û bûne katalîzatorekê ji bo îslamîkirina êzdîtîyê…

Lêbelê, ji bilî van hê jî beşekî van ên ereb pir bi biryar ber xwe didin, erebbûna xwe parastine û îro jî diparêzin, dibêjin – em êzîdî ne, lê ne kurd in, ereb in! Û wek ku Hoşeng Biroka dinivîse, zarokên wan hê jî bi erebîya Şamê diaxivin (!?) … Di vê derbarê da – di gotara min a "Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî ji holê rabe û tune bibe?" da bi hûrbînî heye. – Gotar di întêrnêtê da heye, yên ku bixwazin, dikarin hem bi sernavê wê hem jî bi vê jêderkê https://amidakurd.net/ku/tekst/çima_divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe wê bibînin û bixwînin!

Û, wek ku tê xuyan, hema evên bîyanî ne, yên ku ji hêlekê va di nava civaaka êzdîyan da bi ziman întêgre bûne, lê ji hêla dinê va di nava xwe da erebîya xwe ya Şamê parastine, û rengê xwe yê êzîdî-sofî-îslamî dane civaka êzdîyan, û di nava wê da îro jî bi aktîvî xeta îslamîkirina êzdîyan didomînin û êzdîtîya resen ji hindurva diherifînin...

Di beşê 3. ê gotara xwe ya "Êkspansîya bierebkirina Kurdistanê didome?" da (gotar bi giştî di Rojnameya "Pênûsa nû" da hatye weşandin– di hejmarên 31, 32, 33an da) min fotogalêrîya wan wêneyan danîbû, yên ku xwendevanan bi hinek şirove û pirsan va ji min ra şandibûn (ew wêneyana hemû jî wana ji malpera ***ÊzîdîPrêss*ê** wergirtibûne!). Ji wan fotowêneyam min şeş wêne bi pirsên xwendevan va cuda kiribûn... Ewana pirsîbûn:

–De, îjar were û di nava van da êzdîyan û êzîdîyan ji hev cuda bike!

Min wê demê ji bo vê pirsa xwendevanan ev bersîv nivîsî:

– Mirov ji bo vê çi dakare bibêje?! Her tişt tevî hev bûye... Her daxweza vejînê û bi biryarbûnê wê bikaribin van nirxên netewî ji yên bîyanî vebijêrin û wan ji windabûnê rizgar bikin.

Lê dîsa jî ez li vira hinekan ji wan wêneyan datînim, û bila xwendevan bi xwe jî hewl bidin bersîvekê ji wê pirsa li jorê ra bibibînin. – Weha, ew wêneana:









Di vê galêrêyê da wisa jî wêneyekî dinê yê balkêş heye. Ew jî yê Seddem Huseyn e – banga wî ya ji bo êzîdîyan jî li ser.  Weha, ew wêneya:




Xwendevan pirsîbû: "Banga Seddem ji bo kê ye – ji bo êzdîyan, an êzîdîyên xwe?!"...

Û wê demê min di bin vê pirsa xwendevan da nivîsi: "Binihêrin, ew rûvîyê pîr ji êzîdîyên xwe ra dibêje, ku ew xwe ji krdan biparêzin, ku ew hindik in, ewê têk herin!

Çima?

Seddam mirovekî sade nînbûye, di bin destê wî da ewqas zanyar, siyset-

meder, oldar, ezdazan (têolog) û pisporên dinê kar kirine, ma ewî nizanibûye, ka kî kî ye?...

Balkêş e, yên ku evê banga Seddam li Almanîyayê di nava ciwanên kurd ên êzdî da belav dikin, kî ne û armancên wan çi ne?!"

Û ev hemû jî îro ji bo van mîssîonêrên nûpêketî yên sofî-îslamîkirina êzdîyan wek mîrasekê maye…

Û, eger ev sedemana neyên têgihîjtin, ravekirin û derneyên zanebûnê, mirovê dijwar bikaribe, wek ku di nav gel da tê gotin, ji vî derdî ra dermanekî bibîne…

**Amîda Kurd:** Baş e, mamosta, spas ji bo şiroveyên te!

Bi raya min, dema ew rewş, a ku îro di nava civaka êzdîyan de desthilatdar e, bi bingehîn hate ravekirin, ji vir û pêve jî emê li ser rê û rêbazên avakirina yekîtîya êzdîyan rawestin!

Û evê jî – di beşê govtûgoya me ya di rêzê da.

**Ezîz ê Cewo:** Belê, rast e, xwendevanê bikaribin di vê navberê da van agahîyan bi hûrbînî watedar bikin…

**Amîda Kurd:** Û wisa jî, dibe ku pirsên wan jî çê bibin. Pirsên xwe jî ew dikarin ji me re bişînin:

**Mahabad Felaat:** m.felatarda@gmail.com

**Ezîz ê Cewo:** mamaziz@yandêx.ru

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**20.04.2019**

# GOTÛBÊJA SÊYEM


**Eger mirov di derbarê hevhatina civakî
ya di nava êzdîyan da biaxive û li ser rê û rêbazên berterefkirina
nakokîyên heyî bide heşê xwe, wê demê dê bikaribe bibîne,
ku hevhatin û yekîtî her wê demê dikarin pêk bên,
eger civak bi xwe bikaribe serederîyê li nirxên xwe
yên netewî û rewanî bike.
Û ev jî dikare her bi rêya ronayîdarîyê pêk bê, ango,
bi rêya perwerdeyê.
Ango, hevhatin û hevdengîya civakî wê demê dikare pêk bê,
eger di nava civakê da her nûnerek di cîyê xwe da bikaribe
li dijî ewan êrîşên bîrdozî, rewanî û çandî raweste!**

**Amîda Kurd:** Mamoste, careke dinê dem baş!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş, ser çavan!

**Amîda Kurd:** Beşê duyem ê hevpeyvîna me jî êdî li ber destê xwendevanan e, û bi baldarî tê xwînin. Di dema pêş me da dibe ku hinek pirs û nêrînên wan jî derên, emê wan berev bikin û bi hevre binirxînin... Lê naha em govtûgoya xwe, ji cîyê ku me navber dabûyê bidomînin.

**Ezîz ê Cewo:** Baş e, lê berî ku em govtûgoya xwe bidomînin, êdî du pirsên xwendevanên me gihîştine ber destê min, di sêrî da, ka, em bersîvên wan bidin, paşê...




Weha, *Deniz Babacan* ji Mêrdînê dinivîse: "... Mamoste, ez nivîsên te dişo-

pînim, wisa jî – vê hevpeyvîna te. Hûn pirsne pêwîst û girîng dinirxînin, gelek bersîvên te rast û pir bi wate ne, lê pirsa strana “Şerfedîn e!” neket serê min. Ew stran roja cejna “Çarşema Sor” min bi “Çira-tv” bihîst, lê di wê da dibêje: *“... Şerfedîn e, ... dînê me ye!”* – Çawa dibe...?

– Belê, tu rast dibêjî, *Denizê* hêja, eger tê bîra te, min di beşê yekem ê vê hevpeyvînê da gotibû, ku di destpêkê da di vê stranê da hatye gotin: *“... Şerfedîn e... j'dînê me ye!”*, – û her paşê ew guhartine û ki-rine: *“Şerfedîn e, ... dînê me ye!”* Eger te bi vî şêwazê dawîyê ew stran bihîstye, ev tê wê wateyê, ku komploya hindurîn a li dijî *êzdîyan* û *êzdîtîyê* didome...

Lê, ji bo ku hûn bi xwe bibihên û cudahîya di navbera wan herdu şêwazan da hemberî hev bikin, ew strana bi şêwazên cuda va li ser **Youtube** heye, ez navên wan li vir datînim, hûn dikarin ewan navan di lêgerka întêrnêtê da binivîsin û wan şêwazên stranê bibînin û bibihên. Û hûnê bi xwe têbigihîjin, ka ew pêvajo çawa pêk hatye.

Fermo, weha, ew cudaşêwazên vê stranê di *Youtube* da:

**1.** – “...Şerfedînn e, j'dînê me ye!”

**2.** – Di sêrî da dibêje; “...Şerfedîn e, j'dînê me ne!”, lê paşê dibêje: “Şerfedîn e, dînê me ne!”

**3.** – “...Şerfedîn e, dînê meye!”

Û li vira ya here balkêş ew e, ku ev stran bi şêwazê dawîyê (yê sêyem) hinek dengbêjên kurdên êzdî yên Sovêta berê jî ji ber TV-an girtine, ezebere kirine û distrên… Û, dibe, ew bi xwe nizanin jî, ku pêşîyên wan hîç di xewna xwe da jî navê Şerfedîn nebihîstibûne… Lê, ji ber ku di awazê wê stranê da rîtm û takt heye, wek ku di nava gel da tê gotin, ew dikeve çokê mirov, hem jî di nava *êzîdîyên nûpêketî* da bûye mode, ew jî dixwazin ji wan kêm nemînin, vê stranê bi vî şêwazî distrên û tê jî nagihîjin, ku bi wê yekê ew jî dikevin xizmeta herifandin û tunekirina *êzdîtîyê*…

Helbet ev jî mînakeke bextreşîya gelê me ya dîrokî ya cuda ye!

Ya dinê pirsa peyva *“Êzdîxan”* e!

*Sûrênê Bedir* ji Ermenîstanê dipirse, ku di gotareke min a bi zimanê rûsî da di vê derbarê da hê bi hûrbînî hatibûye gotin, wateya wê peyvê bi zanistî hatibûye ravekirin, gelo nabe, ku ew hûrbîniî di gotara kurdî da jî hebûna.

Lê *Berfîn Samedoglûya* ji Stambûlê jî dinivîse, ku ew wek kurdekê wê şirovaya di derbarê cudahîya di navbera *“Êzdîxan”* û *“Êzdîxane”* da têdigihîje, lê, bi dîtina wê, tiştek kêm dimêne û dipirse, ka, gelo min nikaribû ew hinekî bi hûrbînî, bi zanistî ravekiria.

Bila xwendevanên hêja biborînin. Piştî ku sala 2015an gotara “Êzdîxan” an “êzdîxane”?–Kîjan ji wan rast e û tê çi wateyê?”) hate weşandin, êdî wê demê pirs û daxwezeke weha ji xwendevanan hatibûn û min li ser bingeha wê daxweza wan gotara berê bi mînak û anlîzên êtîmologî va dewlemend kir û di bin sernivîsa *“Êzdîxan” an “Êzdîxane”? – ev tevlihevîya ji ku tê?”* weşand. Û hemû hûrbînîyên pêwîst di wî cudaşêwazê gotarê da hene, xwendevan dikarin wana di wê da bixwînin, tenê divê nave nivîskar û sernavê gotarê di lêgerka Yandex – ê, an a Google da binivîsin, ew gotarê li ber wan vebe, an jî, bi vê jêderkê: https://amidakurd.net/ku/tekst/êzdîxan_an_êzdîxane_ev_t _evlihevîya_ji_k_u_tê . Û, ji bile vê, ji xwe, di derbarê vê pirsî da di beşê hevpeyvînê yê berê vê da bi hûrbînî heye…

Naha jî, fermo, em dikarin vegerin ser pirsa we!

**Amida Kurd:** Belê, spas!

Eger tê bîra te, mamoste, pirsa min ev bû: “Bi raya min, dema ku ew rewş, a ku îro di nava civaka êzdîyan de desthilatdar e, bi bingehîn hate ravekirin, em careke dinê vegerin ser pirsa yekîtîya civakî di nava êzdîyan da û li ser gavên praktîk ên yekem ên here pêwîşst rawestin, ên ku divê di warê avakirina wê yekîtîyê da bên avîtin! Tu wan çawa dibînî?”

**Ezîz ê Cewo:** Belê, belê! Jixwe min berî vê jî gotibû, ku ji bo avakirina yekîtîya civaakî *her rêyek heye, ew rê jî ya rojekê an mehekê, heya ya salekê-duduyan jî nine, divê bi sebir çavê gel li ser rastîyan bê vekirin, bi raman û bîrdozîya netewî ra tevayî, wisa jî rastîya olan bi giştî li ber wî bê danîn. Eger mirov bingehên ola xwe bizanibe, dê ji bo wan lîstikên siyasî cî nemîne, yên ku îro pêk tên…* Lê berî vê, ya here girîng, divê di sêrî da rêvebir û çalakvanên komele, sazî û rêxistinên *êzdîyan* û çapemanîya bi wan va girêdayî evê rastîyê bizanibin. Eger na, dê dîsa weke berê karê îslamîkirina êzdîtîyê bidome...

Ango, yekîtî dikare bi zanekirina civakê, bi perwerde û fêrkirina bingehên olî û danasîna nirxên netewî pêk bê – ji bo ku her endamekî civakê amade be, bi xwe li hember wan destdirêjîyên *ramanî, gîyanî* û *ruhî* raweste!

Helbet, ev nayê wê wateyê, ku divê hemû bibin *zanîyar, bawermend an oldar*. Na! Di pirsên *netewî-bawerî* da divê endamên civakê bi giştî bibin xwedî dîtin û zanebûnên here sade, divê, hîç nebe, ew bikaribin têgehên *‘netew’* û *‘ol’* ji hev cuda bikin, û li ser wê bingehê bikaribin xwe li ser pêyan bigirin… Eger civak bê zanekirin, çavê wê li ser rastîyên bawerîya wê bê vekirin, êdî tu *şerletan* an *xizmetkarekî* hêzên derva dê nikaribe bi wê bilîze!

Helbet, li vira tiştek heye – divê mirov di pirsa bawerîyê da azad bin, û, eger, heya komeke mirovan a biçûk jî bawerîyeke xwe heye, û hinek hewl didin wana bi delk û dolaban, bi lîstikên cihêreng ji bawerîya wan dûr bixin, û wê bawerîyê tune bikin (wek ku îro wê li hembar *îzdîyan* û *êzdîtîyê* pêk tînin!), divê neyê pejirandin… Û, ger hinek kes, komek an heya beşekî civakê êdî bûye *êzîdî-sofî*, divê em wana wisa bipejirînin, wek ku ew hene… Divê helwesta me li hember wanna wisa be, wek a hember *sunnîyan, şiîyan, nexşbendîyan, elewîyan, yarasanîyan* û yên dinê, ango, divê em wana wisa bipejirînin, wek ku ew hene, û ji bawerêîyên wan ra rêz bigirin! Lê, bi vê ra, divê em wisa jî amade bin, ku *êzdîtîyê* jî ji kompoloyan û xeterîya windabûnê biparêzin. Wek ku min êdî di derbarê wê da gotye, divê rê nedin, ku hinek mînahevbûna bi şêwazî (a formalî) a navên *‘ezdî’* û *‘êzîdî’* bi kar bînin û hemû bingeh û nirxên *êzdîtîyê biherifînin* û *tune* bikin. Ango, ew pejirandin û rêzgirtin, a ku li hember bawerîyên dinê heye, divê li hember *êzdîtîyê* jî pêkan be…

Ev – ji hêla mafên mirov ên gerdûnî va!

Ji bo ku ev yeka bikaribe pêk bê, divê di sêrî da ji nava oldarên êzdî wan kesan bibînin, ên ku qewl û beytên êzdîtîyê yên resen dizanin (helbet, eger ew heya dawîyê nehatibin *“tunekirin”*!) û amade ne, beşdarî karê parastina êzdîtîyê ya ji tunebûnê bibin… Divê wana beşdarî karê paqijkirina *êzdîtîyê* ji *têrmîn, nav û têgehên* erebî-îslamî bikin. Di vî karî da ew zargotina gelê me dikare pir kêr bê, ya ku di dema xwe da zanîyarên keddar ên gelê me yên hêja berevkirine û weşandine. Ji bo vê divê komeke pisporan (zimanzan, dîrokzan, olzan û yên dinê) û ew oldar, ên ku ferz û asa û bingehên *êzdîtîya* resen dizaninm, dest bi karê amadekirina pirtûkekê bikin. Di wê prtûkê da divê *dîrok, felsefa olî, ferz* û *asayên* ola *êzdî* bi kurtebînî bên tomarkirin, wisa jî, divê di wê da ferhengokek a têgeh, nav, têrmîn û peyvên dinê hebe, ji bo ku

wateyên wan peyvên kurdî yên resen, ên ku di pêvejoya dêrokî da bi yên *erebî-îslamî* hatine werguhartin, bên têgihîjtin… Ji bo ku, dema yek wê pirtûkê hilde destê xwe û bixwîne, bikaribe bi hêsane tevahîya felsefa ola pêşîyan, nirx û asayên ruhî-rewanî ya *êzdîtîyê* hîs bike…

Eger na, heya eger bi hezaran qube, perestgeh û zîyaretan ava bikin, ew hemû dê ji bo gel wateya xwe ya wisa hebin, wek ku bircên (pîramîd) êgyûptîyên kevnar ji bo erebên Misrê yên îroyîn!

A, prsgirêka ku li pêşîya me sekinye, dîsa wek netew, ev e: "Mirov divê çawa bike û çi bike, ku ji vê rewşê derê?"

**AmidaKurd:** Mamosta, gelekî spas ji bo şirove û ravekirinên te! Ez dibêjim ji bo ku ev rewşa bê têgihîştin, bingehek hate danîn, lê, ji bo ku mirov bikaribe, evê pêvajoya malwêran rawestîne, divê ji çi destpê bikin?

**Ezîz ê Cewo:** Rast e, di jîyanê da her karek destpêka xwe heye, ango, mirov ji tiştekî destpê dike. Û di her karî da jî, ya dijwar hema ev e. Pêşîyên me jî ev yek baş fêm kirine, dema gotine: "Di her karî da ya here dijwar destpêk e, lê, ger mirov destpê kir, ewê here sêrî!" Îro li pêşîya vî karî astengîyeke derûnî (psîkolojîk) heye. Di nava demeke dirêj da êdî mirov hînî *têrmîn, nav û têgehîn* bîyanî kirine, ango ew ji rastîya wan *xerîb* kirine...

Wek ku tê zanîn, her olek jî li ser bingeha *têgeh, nav* û *têrmînan* xwe yên taybet ava dibe, û hema bi wan jî olek ji yeke dinê cuda dibe! Eger ew bingeh hate guhartin, wê demê ol bi xwe ji bingeha xwe destpêkî dûr dikeve û dibe oleke dinê...

Û, ya ku anîne serê êzdîtîyê jî, hema ev e!

Wek ku êdî li jorê jî hate gotin, di hindurva hemû têrmîn, nav û têgehên êzdîtîyê bi yên erebî-îslamî guhartine. Û gel bi xwe jî haş ji xwe nînbûye, ka ew bi demê ra çawa hînî wan peyvên bîyanî bûye, ewî çawa peyvên xwe yên resen ji bîr kirine û bi berekê va dest ji ola xwe berdaye û oleke dinê wergirtye... Û her peyvek jî, wek ku tê zanîn, wateya xwe heye, her peyvek têgehek e, ... her peyvêk bi serê xwe cîhanek e! Û dema îro mirov hewl dide wan peyvên bîyanî bi yên resen ên kurdî biguhêre, gelek caran ew di nava gel da nayên têgihîştin, lewra ku ew ji bingeha bawerîya xwe ya resen dûr xistine, ew bi xwe ji xwe xerîb xistine. Mînak, di destpêkê da, dema li şûna peyva erebî ya *rehm* a kurdî ya resen a *dilovanî* dihat bikaranîn, gelekan bi guman û dilsarî li wê dinihêrîn, lê bi demê ra naha êdî bi berekê va ew peyv di nava lêksîkona gel a rojane da cîyê xwe digire. Wisa jî gel êdî hêdî-hêdî peyvên kurdî yên dinê, yên wek: ol, bihuşt, dojeh û yê dinê li şûna peyvên bîyanî bi kar tîne...

Heman rêbaz ji bo peyvên dinê jî dikare pêkan be – ev pêvajoyek ye!

Û, bi dîtina min, kilîta zelalkirina hemû pirsgirêkên êzdîtîyê (wek ku ya her olekê!), yên ku di nava sedê salan da ketine ser hev, hema di vê da ye: eger mirov bikaribe wan peyv, nav û têrmînên resen ên kurdî yên ola gelê xwe ya kevnar – êzdîtîyê zêndî bike, li wê vegerîne û li şûna wan peyvên erebî-îslamî bikarbîne, yên ku di pêvajoya îslamîkirina êzdîrtîyê da anîne nava wê, evê bibe gava yekem a biryardar li ser rêya zêndîkirina êzdîtîya resen.

Û, eger ev pêk bê, bikeve jîyanê, eger ew guhartin li ber çavan bên xuyan û têgihîştin, wê demê dê bê zanîn, ka êzdîtî çi ye, ka çima ew, a ku îro li gel ferz dikin, ne êzdîtî ye, ka di navbera *êzdîtîyê* û *ezîdîtîyê* da çi cudayî heye...

Lêbelê, çi ku di nava sedê salan da anîne serê êzdîtîyê – wek ol, û, bi taybet jî, ya ku îro tînin serê wê, reng û rûyê vê ola kevnar a gelê kurd wisa guhartine, ku dê

pir dijwar be, mirov wê vegerîne ser bingeha wê ya resen, lewra ku îro, wek ku min êdî gotye, hemû komele, sazî û rêxistinên êzdîyan/êzîdîyan hemû çapemanî, radîo-têlêvîzîon û pergalên întêrnêtê, yên bi wan va girêdayî bi biryar xeta îslamîkirina êzdîtîyê dimeşînin – hinek bi zanebûn, hinek jî bi nezanîya xwe!

A, hema, ya ku di vê pêvajoya demdirêj da di nava êzdîtîyê da pêk hatye, îro li ber çavan e. Û, sed heyf û mixabin, her çiqas, gelek mirovên derî me evê yekê dibînin, lê yên ku di hindur da ne, û divya bû, ku ewê bibînin, nabînin (an didin xuyan, ku nabînin!). Mînak, dema di gotarên xwe yên destpêkê da min dinivîsî, ku êzdîtî ola gelê kurd a kevnar e, yên rikberî me (oponênt) dipirsîn:

– Eger êzdîtî ola kurdan a kevnar e, lê ev peyv û têgehên weha, yên ku erebî ne û piranîya wana di nava îslamê da heye, di nava êzdîtîyê da çi dikin: ***Şems, Şêşims, Sultan Êzîd, cinet, cehneme, ruh, cin, miilyaket, melek, Tawisî Melek, şêx, Nasrêddîn, Sicadîn, Melek Ferxeddîn, Şêxûbekir, Ebûbekir, Cinteyar, Şîxadî (Şêx Adî), similayî (bismilayî), Rebê alemê,/Rebilalem, Xuliqellah, Xaliq***...

Û, eger mirov li ser van da wisa jî van navaên pîrozîyên îslamê zêde bike: ***Ezraîl, Dardaîl, Îsrafîl, Mikaîl, Cebraîl, Şamnaîl, Turaîl***, dê dîmenê encamên wê pêvajoya navborî yên rêal û ji bo êzdîtîyê xeter û malkambax derê pêş wî!

De, îjar were, û ji nava vê tevlihevîya îslamî êzdîtîyê vebijêre û cuda bike, an jî ji vê ra bibêje – Êzdîtî!

Her tişt li ber çavan e, piranîya nav û têgehên bingehîn ên ola Êzdî, bi peyvên erebî guhartine, yên ku navên erkdar û peywirên ola Îslamê destnîşan dikin... *"* ( Bi hûrbînî, di vê derbarê da xwendevan dikarin di gotara min a bi sernavê "Êzdîtî: Çend raman û nêrîn li ser rastîya vê ola kevnar, rewşa wê ya îro, nexwendîtîya olî ya di nav me da û leyîstokên siyasî" da bixwînin – http://www.pen-kurd.org/kurdi/ezize-cawo/ezditi.html , ew wisa jî di di pirtûka "ÊZDÎTÎ: divê mirov rastîya wê li ku bigere" da hatye weşandin. Pdf-a pirtûkê jî di întêrnêtê da heye ...

Dibe ku xwendevanan bipirsin, ka em dikarin çi bi van peyvê bîyanî bikin?

Wek ku min êdî got, divê em yek bi yek peyv û nav û têrmîn û têgehên ola xwe yên resen bi berekêva lê vegerînin!

Ji bo destpêkê em wan têrmîn, nav û têgehên sereke hildin, ên ku îro li şûna wan peyvên erebî di nav jîyana rojaane ya *êzdîyan* da tên bikaranîn, û li hember wan hemwateyên wan ên kurdî, ango, şêwazên wan ê destpêkî yên resen, daynin:

| yên erebî | yên kurdî |
|---|---|
| Reb, rebê alemê, rebilalem | Xwedê, Ezda/Êzdî |
| Şems | Roj/Mêrê Rojê |
| Cunnet | Bihuşt |
| Cehnime | Dojeh |
| Melek, milyaket | frêşte |
| Dîn | ol |
| Ruh | rewan |
| Rehm | dilovanî |
| Qewl | gotin |
| Qewal | ê ku dibêje, ango, missionêr |
| Înşallah | bi hêvîya Xwedê! |
| Similayî (bismilayî) | bi navê Xwedê! |

Em li ser van da wisa jî qewlê "Telqin" a erebî (تلقين) zêde bikin, ya ku tê wateya: "Gihîşte ber destê wan!", û şêxên *êzdîyan* ewê li ser textê xêrê, di dawîyê da

dibêjin. Wisa jî dema xwendina qewlan, hinek şêxên êzdîyan weha destpêdikin: “We tihana, we sikana, we elî wedana!”, hinek heya bi vî şêwazê erebîya rast dibêjin: “Men teqane, men seqane, anta alî al wedane” (من تقانا ، من سقانا ، انت علي الودانا), ya ku tê wateya: “Yê ku bawerî da me, yê ku av da me, tu yî hêja û meznî!” – Û ez bi bawer im, ku ew şêxên êzdîyan, ên ku van qewl û gotinan dibêjin, ne wateya wan dizanin, ne jî dizanin, ka ew ji ku hatine nava wan...

Lêbelê, li vira pirs di wê da ye, ku di nava oldarên êzdîyan da yên ku xwendina bilind dest anîne, hene, heya hinek ji wan jî perwerdeya erebî jî dîtine, lê li şûna ku wê rastîyê bibînin, ka çi anîne serê êzdîyan û êzdîtîyê, hîç nebe, peyv û nav û têgînên êzdîtîyê yên resen lê vegerînin, wek qewal-mîssîonêrên îslamê bi hemû zanîn û derfetên xwe va dikevin xizmeta karê heya dawîyê îslamîkirina êzdîtîyê!..

**Amida Kurd:** Mamosta, gelekî spas! Bi dîtina min, ji bo ku xwendevan bi hêsane bikaribin van hemû zanîyarî û agahîyan ji bo xwe rave û watedar bikin, em li vira navberekê bidinê. Di vê navberê da, ez dibêjim, hem dê pirsên nû li bal me peyda bibin, hem jî dê pirsên xwendevanan jî çê bibin...

**Ezîz ê Cew:** Baş e, ser çavan! Heya hevdîtineke dinê!

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**29.04.2019**

# GOTÛBÊJA ÇAREM

**… Îro di civaka êzdîyan da pirsgirêkên cihêreng ên pir dijwar ketine ser hev, ên ku ji bo hebûna ola gelê kurd a kevnar – êzdîtîyê, bûne metirsîyeke xeter! Û di rewşeke weha da ew bêdengî, ya ku di civaka êzdîyan da desthilatdar e, mirov matma dike.**

**Qey bibêjî ew pirsgirêk ji bo piranîya endamên civakê tunene jî, her çiqas, ew di nava derdorên cuda da tên goftûgokirin.**

**Hem jî îro di civakê da hinek kes, rêxistin û navend hene, yên ku divê nêrîna xwe di derbarê vê rewşê da bianyana zimên, bêteref mane, xwe dane alîyekî û dengek ji wana dernayê.**

**Çima, gelo? ...**

**Amîda Kurd:** Dem baş, mamoste! Em careke dinê bi hev re ne!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş ji we û xwendevanên we ra!

**Amida Kurd:** Mamoste, eger em bi giştî hildin, beşekî wan pirsgirêkan, ên ku îro di nava civaka *êzdîyan* de hene, pirsa bingehên wan, û, wisa jî, pirsên di warê têgihîştina vê ola kevnar a gelê kurd de, di vê govtûgoya me de hatin ravekirin, her dimîne, ku hem xwendevan, hem jî kesayetî, rêxistin û sazîyên pêwendîdar wan hemûyan binirxînin, watedar bikin û ji bo çareserîya vê rewşa xeter û meteirsdar rê û rêbazên konkrêt bigerin...

Ango, mirov dikare bibêje, ew raman, dîtin û nêrînên te yên li ser pirsgirêkên heyî û, wisa jî, ew rê û rêbaz, ên ku tu ji bo çareserîya wan pirsgirêkan destnîşan dikî, di beşên hevpeyvîna me yên berî vê de hatin nirxandin û ravekirin.

Ew hemû girîng in û hêjayî baldarîyê ne.

Û, bi dîtina me, pispor, ezdazan û dilxwazên bawerîya pêşîyan jî dê wan binirxînin û nêrînên xwe di vê derbarê de bibêjin. Helbet, ji bo vê demek pêwîst dike. Piştre heya dibe ku govtûgo û gengeşîyên nû jî pêk bên...

Lêbelê tiştê ku îro bala mirov dikişîne, ew e, ku di nava civaka êzdîyan de bêdengîyek desthilatdar e, wek ku, qey bibêjî, ew pirsgirêk zêde bala gelek kesan nakişîne. Bi taybet jî, wek ku di nava axavtnên te re jî derbaz bû, ew kes û rêxistin û sazî, yên ku jixwe divê wek daxwez û ferza peywir û erkên xwe ji bo vê rewşê gotina xwe bianyana zimên, bêhelwest û bêdeng dimînin Çima? ... Gelo, ev ji ku tê?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, mixabin, rewşeke wisa îro desthilatar e! Û lewra jî daxweza zelalkirina pirsgirêkê û pêşdanîna pirsan jî di cî da ne û xwedî giringîyekê ne...

Wek ku te jî got, ji xwe bingeha pirsgirêkê ya navendî bi giştî hate ravekirin. Lêbelê ev tiştên ku di nava goveka hevpeyvînekê da hatine ravekirin, divê di nava

govekeke  berfirehtir da bên govtûgokirin û nirxandin, divê hemû dilêş û dilxwaz û dilsozên ramana netewî xwe xwedîyên vê pirsgirêkê bibînin û ewê li ser asta netewî binirxînin, lewra ku ew pirsgirêk hema di destpêka peydabûna xwe da ji sînorên goveka olekê, bawerîyekê, an terîqetekê derketye û berfirehtir bûye ... Û, lewra jî, ji bo ku govtûgoyeke wisa pêk bê, divê binaxeyeke zanistî ji bo wê bê amadekirin, lewra jî divê hemû kesayetîyên pispor, sazî, ezdazan, erkdar û rêxistinên olî beşdarî amadekirina vê binaxeyê bibin

Û ev yek jî li ser rêya pêkhatina xwe dê bi astengî û pirsgirêkên cihêreng ra rûberû bimîne, lewra ku di nava van kesan bi xwe da, yên ku divê bi vî karî rabin, hê jî têgihîştineke zelal a vê ola kevnar nîne, gelek ji wan hê jî nikarin cudahîya di navbera *êzdîtîya kurdî* û *êzîdîtîya sofî-îslamî* da bibînin, a ku hem ya “kurmancîaxêvan” e, hem jî – ya “aramîaxêv-erbîaxêvan”. Û ev jî, wek ku min berê jî gotye, bi bingehîn ji nexendîtîya olî tê, û kes û komikên ku îro karê xwe yê reş di nava êzdîyan da pêk tînin, hema evê rewşê bikartînin!

Û, eger mirov van pirsgirêkan hêvîya van mirovan, an hêvîya wan, ên ku me berê jî   behsa wan kiribû, bihêle, ewê bi serê xwe (ji bilî yek-du dilêş û dilsozan!) xwe nedin ber vî barî. Wê demê çi dimîne? Dimîne, ku rêxistineke siyasî, yan jî sazîyeke dinê, yên ku  xwe wek rêxistin û sazîyên netewî-giştî  dihejmêrin, li vê xwedî derbikevin û ji bo çaresekirina vê pirsgirêkê bibin sîwan...

**Amida Kurd:** Belê, mamoste, te wek prênsîp, bi têorêtîkî ew mijar formûle kir, em evê ji bo wan sazî, rêxistin, komeleyan bihêlin, ên ku bi vê pirsê re pêwendîdar in, ji bo ku ew karên ku di vî warî de tên xwestin, pêk bînin...

Lêbelê, dîsa jî pirs dertên holê. Û piştî wan hersê beşên govtûgoya me yên li ser vê mijarê hinek pirsên dinê jî rû dane. Pirsa ku ez dixwazim bala te bikişînim ser, di nava peyam û nameyên xwendevanan da jî cuda dibe û dertê pêş.

Xwendevan dipirsin: “Çima mamoste hîç behsa herdu pirtûkên pîroz ên êzdîyan jî nake?”

**Ezîz ê Cewo:** Belê, helbet, xwendevan mafdar in, di weşanên cuda da di derbarê wan prtûkan da hinek agahîyên giştî-nîvhero hatine belavkirin...

Lêbelê, berê pêşin, ew agahî her tenê li ser asta danasînê ne, û, ya dinê jî, pirsa van herdu pirtûkan ne wisa sade û yekawa ye. Divê di sêrî da hê bê zelalkirin, ka ew pirtûk çi pêwendîya xwe bi êzdîtîyê ra hene û çiqasî yên vê ola kevnar a gelê kurd in?...

Ji bilî vê, helbet, mirov tê digihîje, ku nivşên êzdîyan ên nû îro tenê di nav civaka xwe ya kal û bavan da najîn, ew di nava civak û welatên bîyanî da jî dijîn, û di wan welatan da jî olên kevneşipî (xaçparestî û îslam)  serdest in. Û lewra ku, di wan welatan da li çardorên wan dêr û mizgevt û perestgehên dinê hene, di dibistanên wan da li ser mijarên cuda yên pirtûkên wan ên pîroz (*Quran û Êndcîl*) jî perewrde pêk tên, ciwanên kurdên êzdî bi xeterîya windabûnê ra rûberû mane. ... Û, eger em li ser vê da wisa jî bernameyên radîo-têlêvîzîonên wan û întêrnêtê jî zêde bikin, dê rewşa rastîn a derûnî ya bawermendên êzdî derê holê...

Û di rewşeke weha da bi xwezayî *nivşên êzdîyan* ên îroyîn jî ji hêlekê va ji ola xwe zêdetir ên bîyanî nas dikin, û ji hêla dinê va li bal wan jî xwestek dertê pêş, ku merc û derfetên wisa ji bo ola wan jî bên afirandi... Lewra jî gelek ciwanên êzdî dipirsin, ka çima pirtûkên me yên pîroz nînin, ku em bixwînin, çima dêr û mizgevtên êzdîyan jî nînin (mabesta wan, helbet, qube û perestgehên êzdîtîyê ne!), çima oldarên me ferz û qewl û beytên ola me ne bi zimanê me dibêjin?...

Û ev pirsana jî li cîyekî vala peyda nebûne, divê oldar û ezdazanên ola êzdî û ew kesana, yên ku xwe dilsoz an zaneyên vê olê dihejmêrin, bikaribin bersîva van pirsên ciwanên êzdîyan bidin û ji hêvî daxwezên wan ra bibin bersîv!

Hûn dizanin, dema mirov van gotinan û yên dinê ji ciwanên me dibihê, tevahîya rewşa *bêkes* û *bêxwedî* ya vê ola kevnar a gelê me li ber çavê wî vedibe, û dilê mirov bi gelê me û ciwanên wî dêşe – ma ne, ew jî di vê cîhanê da dijîn, li ku hemû gelên der-dora wan bi sazî, komele, perestgeh û pirtûkên xwe yên pîriz va li ber çavên wan in..., lê ya wan tiştekî wan nîne (?!). Tiştê ku heye jî, bi zimanê erebî tê gotin, li ser dîwar û tûjikên perestgehan jî sembolên îsalamê tên danîn – an hêker (hîva kerî), an jî dest (wek sembola îslamê – destê Fatma dota Mehmed pêxember)!...

Lewra jî ciwanên êzdî dipirsin – ma, êzdî jî misulman in?

Û ev jî rê li pêşîya wê vedike, ku ew bixalifin û bikevin hemêza olên dinê!

Di rewşeke weha da mirovê bikaribe çi bibêje, dema hemû nav û têrmîn, têgehên ola *êzdî* bi yên erebî-îslamî hatine guhartin, dema ew qewl û beyt, ên ku tên gotin, bi erebî ne, û yên ku wan dibêjin, bi xwe jî ji wan fêm nakin, dema heya navê vê ola pêşîyan, pîrozîyên wê yên sereke kirine erebî-îslamî, heya, li şûna peyva kurdî ya ***Xwedê***, yên erebî yên *Reb,* ***Rebê alemê*** an ***Rebilalem*** tên bikaranîn, li şûna ***Mêrê Reojê, Şems***, li şûna ***Mêrê Tav û Sîyê***, ***Melekî Tawis*** an ***Tawisî Melek*** ..., û, wisa jî, cîyekî sereke di nava vê ola wan a netewî da dane Sultan Êzîdê xelîfê îslamê yê ereb. Û ji bilî vê, eger mirov di ser vana da wisa jî evan navan zêde bike: ***Ezraîl, Dardaîl, Îsrafîl, Mikaîl, Cebraîl, Şamnaîl, Turaîl***, wê demê dê ji bo êzdîtîyê dîmenekî pir xemgîn û dilkovan derê holê...

Û di vê rewşê da gazinên hinek xwendevanên me ne tenê mirov matma dikin, lê wisa jî dilê mirov dêşînin. Mînak, *Reşad Sarîbaba* ji Stambolê dinivîse, ku ew bi xwe ji Serhedê ye, ku du-sê bavan berê malbeta wan *êzîdî* bûye, ku, wek ku ew dizane, ev şer û buxdanên nepak misulmanan bi zanebûn di derbarê êzîdîdîyan da belav kirine... Û, ji bo ku rastîya gotina xwe bide xuyan, ev biradera ji me ra parçeyekî ji nivîseke întêrnêtê dişîne û jêderka wê jî destnîşan dike: “Bi gelemperî wateya êzidî li gor neteweyên misilman an jî cînarên wan û kêmzêde gelên di bin bandora îslamê de mane, ne erênî ye. Di derbarê wan de pênîsên wek “şeytanperest”, “gawir”, “dijminên elî”, “zindêq”, “kurdên bi porr”, “yên bi heşt simbêlan” bikartînin...” – http://www.kurdishinstitute.be/ezidi-ki-ne-u-tawise-melek-ci-ye/ .

Eger mirov bi baldarî van gotinên Reşadê hêja bixwîne, dê bibîne, ku li wira gotin di derbarê ***êzîdîyan*** da ye, ne – di derbarê ***êzdîyan*** da. Ev – ya yekem!

Û, ya dinê, her çi jî hebe, helwesteke weha, ew li hember kê dibe, bila bibe, ne rast e, ew bêdadîyek e û tucar nayê efûkirin!

Lê, eger mirov hestan dayne alîyekî û bi heşmendî bi çavê rastîyê li vê helwestê binihêre, dê hinek rastîyan ji hev cuda bike. Ji ber ku bersîva gelemperî ya van pirsan dê di nava şiroveyên me yên pêş me da hebin, em li vira her li ser gotina ***“dijminên Elî”*** rawestin.

Ev ji ku tê?!

Wek ku min berê jî di gotar û berhemên xwe yên cuda da nivîsî bû, ku di dema xwe da bi çi sedeman, bi çi rê û rêbazan Sultan Êzîd bên Muewîyê pismamê Mehmmed Pêxember anîne nava Êzdîtîyê, nayê zanîn, lê ji dîrokê tê zanîn, ku dema şerê navxweyî yê di nava qewmên Pêxember da hemû endamên malbeta hezretê Elî bi herdû lawên wî – Hesen û Huseyn va, tên kuştin... Û tê gotin, ku ew jî bi destê

Êzîd bên Maewîyê pismamê wan pêk hatye! – Belê, dîrok vê dibêje! Lêbelê, ev hemû çi pêwendîya xwe bi êzdîyan an êzdîtîyê ra heye?

Û, lewra jî, li vira pirs dertê holê – ma yên ku Êzîd bên Maewîyê xelîfê ereban ê îslamî kirine pîrozî û anîne nava êzdîtîyê, ev yek nizanibûne? – Helbet, em bersîva vê pirsê ji lêgerînerên pêşerojê ra dihêlin (her çiqas bersîv di pirsê bi xwe da heye!).

Lê, dîsa, heya îro jî pirsa serê hemû pirsan, ya ku pêdivîya xwe bi bersîveke rast û durust heye, ev e: ***"Ma, gelo, ev hemû çi pêwendîya xwe bi êzdîyan û êzdîtîyê ra heye?... Çima van qewal-mîssîonêrên terîqeta sofîtîyên îslamî ev pirsgirêka xwînî ya sedsalan a di navbera du şaxên îslamê – sunnîtîyê û şiîtîyê da, anîne û bi êzdîyan û êzdîtîyê va girêdane û îro jî bi delk û dolabên cuda evê li êzdîyan ferz dikin? Ma ne bes e, ku ji ber vê sedemê piştî rêformên bi navê Şîxadî va girêdayî, di şerên navbera terîqetên îslamê da êzdî kirine teref û dane kuştin?"*** – Û, eger wan tevkujîyên êzdîyan ên pey serdema Şîxadî ra rast û obyêktîv binirxînin, dê rastîya wan bûyerên malwêran derê holê!

Û, eger mirov bala xwe bidê, ev malwêranîya rewanî-olî, ya ku xwendevan behsa wê dikin, di eyneya wan pirtûkan da baş tê xuyan, û ew dibe sedem, ku ne ku tenê yên misulman, lê, her weha nûnerên olên dinê jî ***êzîdîyan*** (dîsa ne ***êzdîyan***!) bi wan gotinên bêr'ê û nepak nav bikin! Û ji bo vê pirsê em divê sedeman ne ku di nava bîyanîyan da bigerin, ên ku wan gotinan dinivîsin (her çiqas gotinên wisa bi serê xwe sûcê dijî mirovîyê ye!), lê di wan da bigerin, ên ku ji bo wan gotinên bêrê bi dîrokî ev sedemana afirandine!

Her çiqas, di nava hinek derdorên hinek rewşenbîrên kurd da tê gotin, ku du pirtûkên pîroz yên ***êzîdîtîyê*** (dîsa – ne yên ***êzdîtîyê***!) li Lalişa pîroz di sindoqekê da tên veşartin-parastin, hinek jî dibêjin, ku ew (an kopîyên wan) di mûzêyûmeke Londonê da hene, lê heya naha kesekî ew pirtûk li ber çavên xwe nedîtine...

Di serpêhatîya peydabûna van pirtûkan da tê gotin, ku erkdarekî dêra katolîkan û zanîyarekî bi netewa xwe ereb, ê bi navê Anastas Marî bertîl daye erkdarekî perstgeha Lalişê û kopîyên wan pirtûkan destanîne û peyra jî têkstên wan sala 1911an di Vîênayê da weşandine... Û piştî du salan (s. 1913) zanyarekî awstrî yê bi navê Maksîmîlîan Bîttnêrê li ser bingeha van matêrîalan di heman Vînayê da pirtûkek bi sernavê "P'irtûkên pîroz ên êzîdîyan an şeytanperestan" weşandye.

Ma, gelo, ji bo sernivîseke weha mirov divê ji zanîyarê awstrî bipirse û wî tewanbar bike, an hewl bide tê bigihêîje, ka di wan pirtûkan da çi hatye nivîsîn, ku vî mirovî li ser bingehaa wê gihîştye nêrîneke weha?...

Helbet, ev jî pirseke hrêtorîk e, û bersîva wê bi xwe hema di wê da heye!

Û ji bilî vê, bi rastî di serpêhatîya (an çîroka) peydabûna van pirtûkan bi xwe da gelk pirs hene!

Tê gotin, ku ew pirtûk bi tîpên taybet hatine nivîsîn. – Eger wisan e, Anastas Marîyê ereb ê erkdarê dêra katolîkan ew nivîsên wan pirtûkan ên bi tîpên taybet ên veşare bi çi armancê wergerandine? Û ev pirseke vala nîne! Karên weha hema wisa, bê armanc pêk nayên. Wek ku di nav gel da dibêjin –ji bo çav û birûyê belek ên êzdîyan ev karê dijwar pêk neanîne!..

Balkêş e, ji bo çi heya naha rêvebirya ruhî-rewanî ya Şengala pîroz tu daxwîyanîyekê yan agahîyekê nade? Eger bi rastî ew pirtûk li wir hene, çima mirov bi fermî bi navendeke zanistî-lêgerînî, an înstîtûteke akadêmî ra pêwendîyan daneyne, wan pirtûkan li ser bingeha binenimûne-orîjînalan kopî neke, ji bo ku pispor wan bi zanistî binirxînin û ravebikin? – Jixwe, em di wê derbarê da nabêjin,

ku ew navenda ruhanîyê ya êzdîyan (Lalişa pîroz) divê heya naha perwerdeyeke erkdarên olî pêk anînbûya û pisporên xwe amade kiribûna, yên ku bikaribûna van pirs û pirsgirêkan ra bibûna bersîv!

Û pirseke dinê jî:

– Eger ew pirtûk ên ola êzdîyan in û bi kurdî hatine nivîsîn, çima sernavên herduyan ne ku bi kurdî, lê bi erebî ne (***"Meshefa Reş"*** û ***"Kitab el-Cilwa"***). Û, ji bilî wê, têkst-nivîsarên wan pirtûkan, ên ku paşê hatine weşandin, bûne bingeh, ku lêgerînerên bîyanî ***ēzîdîyan*** (dîsa, ne ***êzdîyan***!) ***şeytanperest*** nav bikin! (?!)

Û ev jî tiştekî nû nîne – di vê derbarê da lêgerînerên bîyanî êdî jizûva nivîsîne!

Ji sedsalekê zêdetir e, di derbarê wan pirtûkan da cîhan dizane (ji bo bîyanîyan hîç surek jî nîne!), wergerên wan hene, lêgerînerên bîyanî di derbarê wan da gotar nivîsîne û îro jî dinivîsin... Lê hê jî ew hemû ji asta destpêkî ya danasînê derbaz nebûne! Çima?

Eger mirov hebûna van herdu pirtûkan, ên bi vî şêwazî û bi vê naverokê va baş binirxîne, wê demê dertê holê, ku peydabûna van pirtûkan an pirojeyeke ruhanîya îslamê bûye, ji bo ku bi navê êzdîtîyê ra bilîzin, ewê heya dawîyê reş bikin û bi wî awahî wê tune bikin, an jî, eger ew bi rastî berhemên pênûsa Şêx Adî, an şagirtên wî ne, wê demê mirov dikare tevahîya vê torê jî wek govenîya hebûna projeya îslamîkirina êzdîtîyê binirxîne.

Ma, xwe têknolojîyên weha yên cihêreng teze îro peyda nebûne?! Di vê derbarê da – wisa jî di gotara Ezîz ê Cewo ya "Gengeşê didomin" da bi berfirehî heye – vê gotarê jî xwendevan dikarin di întêrnêtê da bibînin – [https://amidakurd.net/ku/tekst/GENGEŞÎ _DIDOMIN](https://amidakurd.net/ku/tekst/GENGEŞÎ_DIDOMIN).

Belê, ev nêrîneke pir ne baş e, lêbelê, wek ku êdî hate gotin, xwe ev li cîyekî vala yê bê bingeh peyda nebûye. Eger hinek bibêjin, ku hinekan şer û buxdan avîtine êzdîyan, ewê rast bin, lêbelê pirs di wê da ye, ka ji bo ku ew şer û bûxdan pêk bên, kê ji bo wê bingeh danye? – Ma ne, ev ferz û nav û têrmînên erebî-îslamî, yên ku anîne nava êzdîtîyê, di wan herdu pirtûkan da hatine tomarkirin! Û ev govenîya çi ye, gelo?...

Wê demê dertê holê, ku ev hemû ji bo ***êzdîtîyê***, wek ku di nav gel da tê gotin, şer û şiltaxekî neşûştî ye, lê ji bo ***ēzîdîtîyê***, wek terîqeteke ***îslamê ya sofî, dibe ku*** – na! Ev rastîyeke! Û ev ji ku tê? Eger di "Mesheva reş" da nivîsîbe, ku ***Melekî Tawis Ezraîl*** e, û wisa jî di wê da navên pîrozîyên îslamê hatine rêzkirin, wê demê em çi gazinên xwe ji bîyanîyan dikin?...

Ma ne, qewal-mîssîonêr û çalakvanên ***ēzîdîtîyê***, wek ***tarîqeteke sofîtîya îslamî***, ev wisa dane nasîn.

Bala xwe bidinê, wênegerê rûs ê sedsala XIX Mîxaîl Mîkêşîn hê sala 1876an wêneyekî çend binecîyên derdorên Wanê kişandye. Û di danasîna wî wêneyî da weha hatye nivîsîn: ***... Ji çepê berbi rastê va: du kurdên şeytanperest, kabardîn, çêçên û kurdê mihemedî yên derdorên Wanê***. (Di vê derbarê da xwendevan dikarin di întênêtê da bi vê jêderkê [https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Микешин_Типы_Кавказа_1876.JPG](https://commons.wikimedia.org/wiki/File:Микешин_Типы_Кавказа_1876.JPG) bibînin, an jî di lêgerka întêrnêtê da bi rûsî binivîsin: «Файл: Микешин Типы Кавказа. 1876.JPG», ango, «Fayl: Mîkêjîn. Tîpên Kafkasêyayê. Sal 1876. JPG» û wisa jî navê gotara: «Курды – кто такие?», ango, «Kurd – kîne ew?» binivîsin!). – Û wênegrê rûs ê sedsala XIX jî, ev wêne 37 salan berî derketina pirtûka navborî ya Maksîmîlîan Bîtnêrê awstrî kişandye. Ango ev nav

û dengê nepak bêyî weşana têkstên wan pirtûkên navborî jî di nava gelên derdoran da êdî hebûye!

Êger em van hemûyan bi ker'î-bêdengî bibuhêrin, ev pirsgirêk dê ji holê rabe, gelo?! Ma ne, eva ku anîne serê ***êzdîtîyê***, tiştekî rêal bûye, û heya hinek kes vî karê ***erebî-îslamîkirina êzdîtîyê*** îro jî bi biryar didomînin, û navên wan jî baş tên zanîn...!

Wê demê, li vira dîsa pirs dertê holê: "Ma, ev hemû çi pêwendîya xwe bi êzdîyan û êzdîtîyê ra hebûye û îro jî heye?"

Helbet, nînbûye û îeo jî nîne! Lêbelê îro hinek kes evî karê malwêranîyê – **yê *îslamî-erbkirina êzdîyan*** û ***êzdîtîyê*** bi biryar didomînin.

Û eva pirsa her ji ber wê bi êzdîyan ra têkilîdar e, ji ber ku ew, gelek ên ji wan, ên ku îro *êzîdîyên sofî* ne, berê *êzdî* bûne û bi rêya propaganda erkdarên îslamê û wan pirtûkan, ên ku qala wana tê kirin, dest ji ola xwe kişandine û bûne sofîyên îslamî?!

Wê demê, divê gel bi xwe di nava xwe da hêz û bibiryarbûnekê bibîne û van kesan rawestîne, yên ku ji bo ***êzdîtîyê*** û ***êzîdîtîyê*** tevî hev bikin, li ser qube û perstgehên êzdîyan sembolên îslamê datînin û dibêjin, ku êzdîtî ola hevbeş a "kurmancîaxêv û erebîaxêvan" e. Divê gel bi xwe ji wan ra bibêje: "Êdî bese, we çiqas bi vî gelî û bi vê olê lîst, bes e, rawestin!" – Helbet, eger ev civaka îzdîyan li ber vê êkspansîya îslamkirinê êdî têk neçûye û destda nebûye!

**Amîda Kurd:** Mamoste, biborîne, ji bo ku ev hemû baş bê têgihîştin, ji kerema xwe re, pirsekê jî ravebike. Te demekê berî naha tiştek got, pir bala me kişand. Te got, ku "... li şûna ***Mêrê Tav û Sîyê, Melekî Tawis an Tawisî Melek*** bikartînîn". Te dikaribû li ser vê pirsê hinekî bi hûrbînî rawestyayî?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, helbet, ji bo wê, ku cudahîya di navbera ***êzdîtîyê*** û ***êzîdîtîyê*** da heya dawîyê bê têgihîştin, jixwe ev pirseke navendî ye.

Bala xwe bidinê, di wê pirtûka "Mesheva reş" da, ya ku îro di weşanên cuda da heye, çi tê gotin: "II. R̂oja yekem, dema Xwedê karê xwe yê afrînerîyê pêk tanî, yekşem bû. Xwedê melekê bi nave Ezraîl afirand. Eva meleka Tawis e — ĥukmdarê ĥemiyan e!" – Dibe ku ev gotinana ji bo mirovên misulman heya radeyekê bên têgihîştin, normal bên dîtin û pejirandin. Lê yên ku hema piçekî bîna êzdîtîyê ji cîhana wan a ruhî-rewanî bê, dê li bal wana destxweda ev pirseê rû bide: "Ezraîl bi xwe navekî ne kurdî ye û têgeha wê jî ji îslamê tê. Gelo çi pêwendîya wê peyvê bi êzdîtîyê ra heye?" – Û ewê mafdar be! Binihêrin, peyva Ezraîl (عزرائيل) navê melekê mirinê ye – ruhistîn e... Ango çi dertê – Xwedê melekê mirinê kirye hukumdarê hemûyan? = Helbet, ev pirsa ya ezdazanan e, û bila ew bersîva wê bigerin. Lê em naha bên ser navê Tawisî Melek an Melekî Tawis. Bala xwe bidinê. li vira hem peyva Tawis, hem jî ya Melek ne kurdî ne – ew herdu jî erebî ne, û tu pêwendîya xwe bi ola êzdî ra nînin. Em wê rastîyê li hêlekê dayninin, ku ew çivîka xweşik û bedew ne di Kurdistanê da, ne jî di tevaya herêma Îranê da nînbûye, lewra jî navê wê yê îranî-kurdî nikaribûye hebe û nîne. Ango ew biyanî ye, xerîb e.

Her çiqas nîgara vê balindeyê (teyrikê) di gelek mîtolojîyan da rastî mirov tê, lê di Çînê da ew bi taybetî tê perestin. Ew (teyra tawis) wek sembola nazikahîyê û paqijîyê tê dîtin, ew di nav xwe da tomerîya bedewetîyê û bijartebûnê digihîne hev û dide pêş, ew emblema binemala Mîng (a çîn) e. Bi perikên vê balindeyê (teyrikê), ya ku, wek ku tê gotin, Xwedê bi xwe wê diparêze, guldangên împêratorê mançjûrî xemilandine. Ev nîgara di wênegerîya çînî da û di nîgarkêşîya bedewyetîyê ya giştî da bi berfirehî tê bikaranin,

Divê bê gotin, her çiqas peyva erebê ya Tawis (طاووس) di nava wam gelan da tê bikaranîn, ên ku di dema xwe da îslam pejirandine, lêbelê, berî îslamê ev teyra di nava gelên iranî da wek teyra çînî (sînî) hatye zanîn – wek sînmarg (bi avêstî – *saēnô-*





Nmûneyeke daryerojiya çinî – Dongyang
https://museum-design.ru/the-exquisite-detail-of-dongyang-wood-carving/

https://obiskusstve.com/1770239243109796200/pavliny-v-kitajskoj-zhivopisi/

*mərəγô*; pehlewi – *sēn-i-murūk*; farsi – سیمرغ/*sīmurγ*; kurdî – *sîmir*), ango, *sinmarg* peyveke têkel e, ew ji peyvên *sîn (çîn)* û *marg/morγ* pêk hatye – ango, *çûka/teyra çînî*... Di nava demê da di zimanê kurdî da ew peyv hatye guhartin û şêwazê sîmir wergirtye. Îro di kurdî da navê teyrê sîmir heye, û, dibe ku li serê kesekî ra jî derbaz nebe, ku ew heman peyva sînmarg e.

Û bi vî awahî, bi nîgara çûka çînî ya xweşik wateya pîrozîyeke me xeyîrandine, kirine tiştekî dinê û wate û naverokeke dinê dane wê... Lewra jî, ew mirov, ên ku hema hinekî têgihîştina xwe bi êzdîtîyê hebin, dê bipirsin: “Ma ev çivîka xweşik çi pêwendîya xwe melekê mirinê (ruhistîn), û, bi giştî, melekê mirinê jî bi êzdîtîyê ra heye?...”

Min berê jî bihîstibû, di nav gel da dihat gotin: *Mêr-milyaketê tav û sîyê, Mêrê tav û sîyê, Xwedayê şev û rojê, Mêr-milyaketê şev û rojê*. Piştî demekê, 15 sal berê min hem di nava *kurdên* Bakûr da, hem jî di nava yên Rojava da ev gotinana û yên mîna van bihîstin. Gotinên wisa heya di nava berhemên wêjeyî û stranên kurdên misulman da rastî mirov tên.


Weha, em tenê li mînakekê ji wana binihêrin:

“… Ey Xudayê şev û rojan,
Bila bes bin ev derd û jan,
Ev dîn, eger dînê te ye,
Kê kir hevalê xûnmijan? …”

Ev parçeyek e ji helbesta Sebrî Botanî ya bi sernavê “Di gel Yezdan” – Cudaşêwazên wê yên bi deng nivîsî di întêrnêtê da hene, xwendevan dikarin bi xwe bibînin û bibihên –http://kulilk.com/portal/node/13819 û https://www.youtube.com/watch?v=oi MOFyRgCtQ&t=99s .

Lê, bi rastî, çi gunehê xwe veşêrin, wê demê wan gotina zêde bala min nekişandin, û min zêde wate neda wan... Paşê, dema ku ez bi pirsên *ola êzdî* va mijûl bûm, evê pirsê dem bi dem rû dida, û bersîva xwe dixwest: “Melekî Tawis û Melekê

tav û sîyê, Xwedayê şev û rojê û têgehên dinê yên bawerîyê, gelo di *êzdîtîyê* da heman *pîrozî* nînin?" Lêgerînên êtîmolojî, û yên pirsên erka pîrozîyên olî her ez berbi bersîvekê va dibirim – belê, ew hemû yek in! Û ez bê rawestan, bi baldarî di nava civakê û zargotina gelêrî da govenyekê digeryam, heya ku piştî demekê pirtûka "Ayîn û qirarê dînê êzdîtiyê. Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî" kete destê min. Ev di dema xwe da rewşenbîrê kurd Keremê Anqosî ji zarê Şêx Xeloyê Elî girtibûye û bi deng nivîsye, peyra ew derbazî ser kaxezê kiribûye û sala 2001ê di bajarê Tbîlîsîyê da wek pirtûk weşandibûye...


ŞÊX XELO

Û, di vê pirtûkê da ya here balkêş ew e, ku, her çiqas, Şêx Xeloyê bihuştî di mala şêxan da gihîştibûye, ewî li ber destê oldarên êzdîyan li ser bingeha bîrûbawerîya Şîxadî perwerdeya olî dîtibûye, lê dîsa jî şopên bawerîya pêşîyên êzdîyan a resen di vê pirtûka wî da li ber çavan in... Ji ber ku ev pirtûk, wek ku her berhemeke zargotina gelêrî, hêjayî lêgerîneke zanistî ye û ez bi bawer im, ku dê dema pêş me da pisporên berê xwe bidine wê, ezê li vira her bala xwendevanên hêja vexwînim ser du tiştan.

Weha di rûpelê 13an ê pirtûkê da em van gotinên kekê Xeko dixwînin: "...Ew teyrê Enqer, Dur ser piştê Melekê Tav û Sîyê yanê Roj û Hîvê. Pêra dibêjin Tavûsî Melek. ..."

Lê di rûpelê 15an da kekê Xelo dibêje: "Melek Adî Şemsanîyê ra bav e. Melek Adî di Lalişê da Şems, Ferx, Sica, Nasir ji nûra xa dîhar kir. (Eva nava hemû xeber û navê erebîne, sirmaniyene. Navê eslî başqe ye). ....". – Bala xwe bidinê, şêxê êzdîyan, ê ku perwerdeya rewanî li ser bingeha bîrûbaweîya Şîxadî dest anye, dibêje, ku: "... Eva nava (ango, nav û têrmînên ola êzdî. – E. C.) hemû xeber û navê erebîne, sirmaniyene. ...." – Û bi vê gotina xwe ya kurt û kurmancî kekê Xelo yê bihuştî tevahîya rastîya serdema Şîxadî ya êzdîtîyê raxistye ber çavan!

Her, pêwîst e, ku mirov bikaribe vê bibîne, têbigihîje û rast rave bike!

Û ji bilî vê, van demên dawîyê di întêrnêtê da (Youtube) bernameyeke têlêvîzîona Ermenîstanê parvekiribûn. Di wê da civaka êzdîyan wek nexşekî Ermenîstanê didin nasîn... Helbet ev bername, sedemên amadekirina wê, wek peyamekê, bi serê xwe pirseke balkêş e, lê di vê bernameyê da ya ku bala mirov dikişîne, ev e: rojnamegereke ciwan a têlêvîzîona Ermenîstanê bernameyê pêşkêş dike, û bi alîkarîya oldarekî êzdî û pîrekeke ermenî ya dinê ola êzdîyan dide nasîn. Û dema digihîjin pirsa sembolên êzdîtîyê – Rojê û Melekî Tawis, ew pîreka peyva Tawisî Melek weke xwe weha şirove dike: *Melek* tê wateya freştê, lê Tawis – ango sîya tavê (?!)... Em werger û şroveyên wê yên derdorên rastîya vê peyvê daynin hêlekê (ku sîya tavê bi xwe nikare hebe!), her bêjin, ya balkêş ew e, ku wî navî bi teyra tawis va girê nadin û bi wê şirove nakin, her çiqas dibêjin, ku ew sembola wê ye... (https: //www.youtube.com/watch?v=kilTMvR1KII&t=390s)

Ev hemû govenîya wê yekê ye, ku, her çiqas kirasekî îslamî li stûyê ola kevnar a gelê kurd – êzdîtîyê danîne jî, hemû nav, têrmîn û têgehên wê erebî-îslamî kirine, lê yek e, zîlên resenîya pîrozîyên vê olê didin der û derdikevin ronahîyê...

Û, lewra jî, eger em îro rabin û êzdîtîyê tenê di nava goveka rêform û veguhartinên Şêx Adî da binirxînin, emê bi wê yekê dîrok û şaristanîya gelê xwe ya dewlemend a hezarê salan binax bikin, û ew dewlemendîya şaristanî ya gelê me wê bê şop winda bibe...

Lewra jî, heya me nikaribûye rehên vê bêdadî û nepakîya dîrokî ya hember êzdîyan (û tevahîya gelê kurd) bibînin, ji me nehatye, ku em li ser bingeha daneyên pêbawer wan derew û şer û şltax û buxdanan bi bingeha wan va bi zanistî red bikin û rastîya dîrokî dernexin holê û jîndar nekiin, emê nikaribin bi cîhana mayîn ra, wek terefdarên vê ola kevnar û bîrûbawerîya wê ya bêhempa biaxivin. Emê nikaribin bibin xwedîyên mîrasa wê çanda kevnar û wê şaristanîyê, ya ku hebûna gelê kurd ê pirmîllîonê ye...

Di vê derbarê da xwendevan wisa jî dikarin di gotarên “Gengeşî didomin” û “ Ne dem e, gelo, mirov ji hev ra rastîyê bibêje, ew çiqas tal dibe, bila bibe?” da bixwînin – herdu gotar jî di întêrnêtê da hene!

**Amîda Kurd:** Gelekî spas, mamosta, ji bo şirove û nirxandinên balkêş, ji bo wan agahî daneyên nû. Em evî rûpelê hevpeyvîna xwe jî bigirin û heya hevdîtina di rêzê da xatirê xwe ji hev bixwazin!

Lê ji bo xwendevanên xwe yên nû jî em dîsa navnîşanên xwe datînin, ji bo ku ew bikaribin pirs û nêrînên xwe ji bo me bişînin;

**Mahabad Felaat:** m.felatarda@gmail.com
**Ezîz ê Cewo:** mamaziz@yandêx.ru

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**20.05.2019.**

# GOTÛBÊJA PÊNCEM

**… Îro pirseke girîng jî ew e, ka mirov ji vir û pêva dikare çi bike, ku ew merc û rewşên cuda, yên ku di nava civakê da dibin sedema rûdanên nakokî û gengeşîyan, di nava beşên cuda yên gel da bên govtûgokirin? Mirov çawa dikare bala civakê bikişîne ser wana? Bi çi rê û rêbazam mirov dikare wê pêvajoyê xurttir bike?**

**Amida Kurd:** Dem baş, mamoste!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş ji we û xwendevanên we ra!

**Amida Kurd:** Mamoste, di beşên hevpeyvîna me yên berî vê de me piraniya wan pirsgirêkan nirxandin, ên ku di nava civaka êzdîyan û êzdîtîyê de hene û li ser rêya yekîtîya wan dibin asteng. Her weha, me sedemên peydabûna gelekên ji wan jî destnîşan kirin. Bi dîtina te, gelo mirov dikare bibêje, ku her tişt hatye gotin, ku bersîvên hemû pirsan hatine dîtin?

Helbet, em bi bawer in, tuyê bibêjî – na! Lewra ku tu tevahîya dijwarîya van pirsgirêkan, bi hemû sersedem û bingehên peydabûna wan va, baştir dizanî...

Lê dîsa jî!

Balkêş e, gelo, mirov ji vir û pêve dikare çi bike, van rastîyan çawa dikare di nava civakê de bide nirxandin û bala endamên wê vegerîne ser wan? Bi dîtina te, ji bo vê pêvajoyê çi rê û rêbaz dikarin pêkan bin?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, di vê hevpeyvîna me da gelek pirsgirêk hatin nirxandin, ravekirin û danasîn. Heya mirov dikare bibêje, piştî vê hevpeyvînê gelek kes êdî bi çavekî dinê li rastîya ola xwe ya kevnar dinihêrin. Ewana heya astekê êdî rastîya gelek tiştan têgihîştine. Ez dibêjim, evê hevpeyvînê wisa jî derxist holê, ku, her çiqas li dijî *êzdîtîyê*, ev êdî 1350 sal e, pêvajoya tunekirinê didome, lê, dîsa jî, bingehên resen ên vê ola kevnar heya îro jî di nava gel da hatine parastin, û, eger mirov bi baldarî li wan bigere, dê bikaribe, gelekan bibîne û vejinîne!

Bi evê gotûbêja me wisa jî gelek rastîyên êzdîtîyê – vê ola kevnar a gelê kurd, û bingehên wan rastîyan ên dîrokî, yên ku me di gotarên cuda û pirtûkên xwe da destnîşan kiribûn û kiribûn mijara lêgerînên zanistî, careke dinê di nava tomerîyekê da hatin nirxandin û ravekirin. Di nava wan bersîvan da, yên ku min dabûn pirsên we û yên xwendevanan, terefên pirsgirêkan ên di sîyê da mayî jî hatin ravekirin û derketin ronahîyê. Dibe ku heya astekê, ji bo vê demê, ji bo destpêkekê ev têrê dike jî, lê bi giştî, mirov dikare bibêje, ku pêvajoya têgihîştina civakî ya girseyî ya rastîya

êzdîtîyê dê hê nû destpê bibe. Hê divê gav bi gav ew astengîyên derûnî (psîkolojîkî), yên ku di nava sedê salan da di nava civakê da hatibûne çandin, bên rakirin. Bi rastî, rewşeke pir dijwar derketye holê, hemû nirx, pîrozî û têgehên gel ên netewî bi yên bîyanî va guhartine, ew bi şêwazê lêpovajîkirî li civakê dane pejirandin, û di demê ra civak hînî wan kirine... Û ji bo ku ew astengîyana bên berterefkirin, ev hevpeyvîna jî wan bingehên zanistî, yên ku heya naha di lêgerînên me da hatibûn sazkirin, careke dinê bi xwendevanan ra dike mijara govtûgoyê, û bi wê yekê li pêşîya têgihîştina wan rêyekê vedike. Mirov dikare bibêje, li ser vê rêyê, ji têgihîştina pirsgirêkan a zanistî ya teng em hê nû gihîştine destpêka têgihîştin û watedarkirina wan a civakî.

Ji bo destpêkeke weha ev amadekarîyek e.

Lê, tiştê ku îro vekirî di nava civaka êzdîyan û bi giştî di nav gelê kurd da li ser bingeha wan rastîyan, ên ku min destnîşankirin, pêk tê, divê bên nirxandin û bikevin xizmeta vê pêvajoyê...

**Amida Kurd:** Ango, mamoste, tu dibêjî, pey ewqas nirxandinên berfireh re, me karibûye hê nû xwe bigihînin destpêkê?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, belê, hema wisa!

Hûn dizanin, wek ku min êdî berê jî gotibû, ya ku anîne û îro jî tînin serê gelê me, ji t'evkujîya fîzîkî xerabtir e. Eger hinek dixwazin mirovekî, yan civakekê, an jî neteweke bi fîzîkî bikujin, rastî berxwedana wan tên: ew li dijî fişar û êrîşên tunekirinê serî hildidin. Û, eger meriv bi fîzîkî tê kuştin, jixwe ew diçe, ji holê r'adibe, êdî ji bo wî pirsgirêk namînin. Lê, eger ew bi r'ûhî-r'ewanî, bi cîhana xwe ya hundur'în va tê guhartin, hemû nirxên wî, yên ku di hezarê salan da, bi r'êya hilbijartina xwezayî pêk hatine, diguhêrin, êdî ew mirov bi xwe ji xwe xerib dikeve, bi xwe dibe bela serê xwe... Û ya ku anîne serê beşekî gelê me jî, hema ev e! Û ew, bêyî ku bi xwe evê tê bigihîjin, bêyî daxwez û rayê xwe, beşdarî tunekirina nirxên xwe yên ruh û rewanî dibin! (Û mînakên vê yekê jî li ser her gavekê rastî mirov tên!).

Û, eger ev ji bo kesekî weha ye, lê ji bo gelekî, net'eweke nikare pêkan be! Di dîrokê da hîç tiştek jî bê şop winda nabe, hezarsal jî derbaz dibin, lê r'astîyên dîrokî bi hewlên zanîyar û lêgerîneran gav bi gav dertên r'onahîyê... Encamên lêgerînên zanistî yên di warê dîroka şaristanîyên Sûmerê, Mayayê, Êgyûptê (Misra kevnar) û gelekên dinê da govenîya wê yekê ne.

Di rêzê da hê gelek mijarên dinê jî hene – jîyan didome!

Wek ku tê bîra xwendevanan, min di beşên berî vê da mînakên wê yekê anîbûn, ka çawa, bi r'ê û r'êbazne cuda, bi delkbazîyên cihêreng k'etine nava êzdîtîyê – vê ola gelê k'urd a kevnar, ew bi berekêva, ji hundur'va wisa guhar'tine, ku ewê êdî ne ku t'enê şêwazekî nû wergirtye, lê wisa jî bûye antîpod-dijayetî û dijwateya resenîya xwe ya destpêkî... Û mabesta min jî hema ev bû, dema min digot, ku ev, a ku anîne û îro jî tînin serê êzdîtîyê, ji êkspansîya dema Umer bên Xettab û van êrîşên van salên dawîyê yên DAÎŞê xerabtir û xetertir e...

Di beşê berî vê da em li ser wan gotinên oldarekî êzdî, bihuştîyê kekê Xelo rawestyan, ên ku di pirtûka wî ya "Ayîn û qirarê dînê êzdîtiyê. Zargotina şêx Xelîfê Şemsanî" da li ser têgeha "Tawisî Melek" hebûn... Em careke dinê vegerin ser gotinên bihuştîyê kekê Xelo: "...Ew teyrê Enqer, Dur ser piştê Melekê Tav û Sîyê yanê Roj û Hîvê. Pêra dibêjin Tavûsî Melek. ..." (rûpel 13). Û: "Melek Adî Şemsanîyê ra bav e. Melek Adî di Lalişê da Şems, Ferx, Sica, Nasir ji nûra xa dîhar kir. (Eva nava hemû xeber û navê erebîne, sirmaniye....." (rûpel 15). – Û evan

gotinana ne mella û miftîyên îslamê û ne jî lêgerînerekî xaçparêz dibêje, van gotinan oldarekî ola êzdî dibêje (bila dilovanîya Xwedê li ser ruh û rewanê wî be!), ê ku di malbeta şêxan da ji dêya xwe bûye-gihîştye, li ber destê zaneyên ola êzdî yên navdar perwerdeya olî dîtye... Û li vira ya here girîng ew e, ku, her çiqas mejû û ruhê vî oldarê bihuştî (wek ku yên hemû oldarên êzdîyan!) ji her hêlan va di bin fişar û bandora bîrûbawerîyeke bîyanî (a sofîtîya îslamê!) da bûye, lêbelê ew bingehên resen ên êzdîtîyê di nava wî da heya dawîyê nehatine tunekirin û winda nebûne. Ango, ev govenîya wê yekê ye, ku di nava hinek oldarên *êzdî* da, her çiqas, kirasekî îslamî li stûyê bawerîya wan hatye danîn jî, zîlên bawerîya wan a resen di bin ber û kevirên ola bîyanî da benda dema xwe bûne –benda ronahîyekê!... Û, eger ronahî bigihîje wan zîlan, ew dê zîl bidin, derên jîyanê û bi hemû resenîya xwe va li ber bawermendên xwe yên “windabûyî” vebin.

**Amida Kurd:** Ango, mamoste, tu dixwazî bibêje, ew çend gotinên bihuştîyê kekê Xelo ji bo mijara me ewqas girîng in?

**Ezîz ê Cewo:** Belê, ew girîngtirîn govenîya rastîyên ola gelê kurd a kevnar –êzdîtîyê destnîşan dikin, ên ku hatine û îro jî tên lêpovajîkirin! Eger mirov wan gotinan rast têbigihîje, ew t’evahîya wan delk û dolaban vala derdixin, ên ku qewal-missionerên terîqata îslamê ya sofîtîyê li hember êzdîtîyê hûnandine, bi şer û buxdanên cihêreng ew reş kirine, û berê bawermendên wê berbi cîyekî dinê va guhastine... Ev gotinên bihuştîyê kekê Xelo wê dîtina me piştrast dikin, ku ***êzdîtî*** <u>û</u> ***êzîdîtî*** ne yek ol in, ku ew bi bingeha felsefeya bîrûbawerîya xwe va du bawerîyên ji hev cuda ne, ku ew tiştana, ên ku di “Meshefa Reş” da hatine nivîsîn, tu pêwendîya xwe bi êzdîtîyê ra nînin, ku ew hemû, dibe ku, têkilîya xwe bi êzîdîtîyê ra hene (wek t’erîqeteke îslamê!), û bila erkdarên wê t’erîqetê jî hewl bidin, wan ji bo bawermendên xwe raravebikin ...

**Amida Kurd:** Mamoste, te dikaribû, li vira hinekî bi hûrbînî evê ji bo xwendevanên me ravebikî?




**Ezîz ê Cewo:** Belê, fermo! Ev tiştê ku kekê Xelo dibêje, rasttir dibû, mirov bigota, şêwazdar (formûle) dike, di nav gel da jixwe *(*bi aprîorî*)* jîyana xwe didomînin – di nava zargotina gelêrî da, di nava jiyana gel a rojane da. Wek ku min di beşê berî vê da gotibû: “... di nav gel da dihat gotin û îro jî tê gotin: Mêr-milyaketê tav û sîyê, Mêrê tav û sîyê, Xwedayê şev û rojê, Mêr-milyaketê şev û rojê. Piştî demekê, 15 sal berê min hem di nava kurdên Bakûr da, hem jî di nava yên Rojava da ev gotinana û yên mîna van bihîstin – û ew jî di nava kurdên misulman da! Heya gotinên weha di nava berhemên cuda yên wêjeyî û straтên heman kurdên misulman da rastî mirov tên… Em li vira dîsa parçeyê ji helbesta Sebrî Botanî ya “Di gel Yezdan” wek mînak bînin:

"… Ey Xudayê şev û rojan,
Bila bes bin ev derd û jan,
Ev dîn eger dînê te ye,
Kê kir hevalê xûnmijan? …"

(Wek ku berê jî hatibû gotin, cudaşêwazên vê helbestê yên bi deng nivîsî di întêrnêtê da hene, xwendevan dikarin wan guhdar bikin).

Lê, bi rastî, çi gunehê xwe veşêrin, wê demê wan gotinan zêde bala min nekişandin, û min zêde wate neda wan... Paşê, dema ku ez bi pirsên ola êzdî va mijûl bûm, ev pirsa dem bi dem hişyar dibû: "Melekî Tawis û Melekê tav û sîyê, Xwedayê şev û rojê û têgehên dinê yên bawerîyê, gelo di êzdîtîyê da heman pîrozî nînin?" – Lêgerînên êtîmologî, û yên pirsên erka pîrozîyên olî her ez berbi bersîvekê va dibirim – belê, ew hemû yek in! Û ez bê rawestan, bi baldarî di nava civakê û zargotina gelêrî da govenyekê digeryam..." – Ango, dertê holê, ku Mêrê Tav û Sîyê tu pêwendîya xwe bi Tawisî Melekê "Meshefa reş" ra nîne, ê ku wek Ezrailê melekê mirinê (ruhistîn) raberî me dikin, li me ferz dikin û me didin pejirandin...

Û min govenîya wan dîtinê xwe di pirtûka kekê Xeloyê bihuştî ya navborî da dît!

Û ev p'ir' girîng e! Lewra ku, ev govenîya wê yekê ye, ku, her çiqas di nava sedê salan da hewl hatye dayîn, ku bingehên êzdîtîyê yên resen tune bikin, an wan bi yên xerîb biguhêrin jî, lê dîsa her tişt winda nebûye, gelek tişt hatye parastin. Û eger em baş lê biger'in, emê di nava zargotina gelêrî da (wisa jî ya ruhî-rewanî da!) bingehên ola xwe yên resen bibînin û vejinînin...

**Amida Kurd:** ... Dizanî, mamoste, dema mirov van gotinên te dibihê, ji hêlekê va tevahîya wê malwêranîyê tê ber çavê wî, ya ku anîne û îro jî tînin serê êzdîtîyê, ji hêla dinê ve pirîskek a hêvîyê dyar dibe, û dilê mirov baristan dibe– ku her tişt winda nebûye!

Balkêş e, çiqasî rêal e, ku di rewşeke weha da, mirov bikaribe bigihîje encamên pêwîst, ew jî wê demê, dema, wek ku tu jî dibêjî, hinek terefdarên xeta îslamê di nava êzdîtîyê da wisa bi rêkûpêk, bi tevger ji bo heya dawîyê îslamîkirina êzdîtîyê, ji bo tunekirina bingehên wê yên resen hewl didin, dema ew hemû hêz û derfetên xwe dikin tevgerê û li ser rêya têgihîştina rastîya vê olê ewqas astengî û tevlihevîyan derdixin?...

**Ezîz ê Cewo:** Belê, bi rastî jî wisan e! Her çiqas, ew hemû, ya ku anîne û îro jî tînin serê êzdîyan û êzdîtîyê ji tevkujîya fîzîkî jî xirabtir û xetertir e, lê ji hêla dinê va jî pirîskek a hêvîyê heye, ku her tişt winda nebûye... Her dimîne, ku mirov bikaribe hem vê malwêranîya bi xeter, hem jî wê pirîska hêvîyê bibîne û bide dîtin...

Ev – wek prênsîp!

Dizanî, min berê jî gotibû, ku mirov divê hewl bide, bingehên vê ola kevnar bi zanistî ravebike, vejinîne, eger ne ji bo bi praktîkî bikaranîna wê be jî, hîç nebe, wek prênsîp, bi zanistî – ji bo dîrokê, ji bo ku nivşên pêşerojê bizanibin, ku demekê oleke wisa hebûye! Ev ji bo çi wisa girîng e? – Lewra ku, em çiqas rehên xwe yên ruhî-rewanî nas bikin, emê ewqasî jî nirx û hêjahîyên xwe yên netewî nas bikin, qîmetê wan bizanibin, li wan xwedî derkevin û hema bi wê jî, resenîya xwe ya netewî biparêzin! Lêbelê, ev tişt, ên ku roj bi roj rû didin, dertên ronahîyê, hêvîya mirov di vî warî da mezintir dikin. Yek ji wan jî, ew dîtin û şiroveyên kekê Xeloyê bihuştî yên navborî ne, ya dinê jî, ew e, ku hinek kes û derdorên di xizmeta karê tunekirina

bingehên êzdîtîyê (û, wisa jî, yên tevahîya kurdîtîyê!) da piştî weşan û govtûgoyên me digihîjin asta harbûnê, hewl didin rastîyên vê olê biderewînin, lê ji talebextê wan ra, ew, bêyî daxwez û rayê xwe, dikevin xizmeta têgihîştina wan rastîyan...

**Amida Kurd**: Balkêş e, çawa?

**Ezîz ê Cewo:** Bala xwe bidinê – hema mînakeke vê dawîyê!

Çendekî berê di Fêysbûkê da (Facebook) vîdêoyek bi sernavê "Yusuf Berhudar – Yezidi kine?" hatibû parvekirin ... Xwendevanan ev vîdêo pir bi tundî rexne kiribûn, heya di peyam û şiroveyên xwe da gotinên bêr'êz û bêr'ê jî ji xudanê wê ra nivîsîbûn. Xwendevanekî me, Keleşê Serdar ê hêja ew hemû ji ber girtibûn û ji min ra şandibûn (spas ji bo wî!), û ev daxwe za xwe lê zêde kiribû: "Ca bala xwe bidinê! Ev çi ji me dixazin?" Bi rastî, min di sêrî da şrove û peyamên beşdarên Fêysbkê bi baldarî xwendin, û heya radeyekê ez matma û bînteng jî bûm, ku gotinên wisa ji wî mirovî ra nivîsîbûn. Paşê ez vegeryame ser vîdêoyê bi xwe, bi wê mabestê, ku tê bigihîjim, ka di wê da çi heye, ku wisa dilê wan êşandye û ew wsa hêrs kirine, ku destûr dane xwe, wan gotinên bêr'ê binivîsin...




Min bi baldarî li wê vîdêoyê nihêrî, hûn jî dikarin di întêrnêtê da bi vê jêderkê https://ok.ru/video/1314577974574 li wê binihêrin, an jî, di lêgerka Google yan a Yandex-ê da binivîsin: "Yusuf Berhudar – Yezidi Kîne?"...

Di sêrî da bibêjim, hema di destpêkê da tiştê ku di vê vîdêoyê da bala mirov dikişîne, ev dîmen e: mirovekî bi rû li hember rûniştye, û rûyê wî jî, wek ê mela an miftîyên misulmananên selefî ye, û li pişt wî va jî "dîwarekî" bi pirtûkên îslamî heye... Û, dema min ev dîmena dît, ev hat ber heşê min – eger ev mirova erkdarekî îslamê ye, bizanibe, di perwerdeyeke olî ra derbaz bûye (li dû wî va ewqas pirtûk rêzkirî ne!), hîç nebe dê hinekî terbîye jî girtibe û hinek rastî jî dê ji wî derên. Û bi rastî jî, eger mirov di nava axavtinên wî da hinek rastîyên nivîşkan û nîvhero û berovajîkirî dibihê jî, (ezê paşê bêm ser wan!), lê ji hêla toreya axavtina erkdarekî olî yê xwedî terbîye va, ew mirov matma û xemgîn dike, û mirov bêzar dibe, nizane çi bibêje, bi taybet jî, ew, ên ku erkdarên kurd ên dinê jî dîtine û naskirine!

... Ez di dema xwe da li Welêt û Ewropayê rastî hinek erkdarên ola îslamê yên bi netewa xwe va kurd hatime, min bi wan ra li ser pirsên cuda galegal kirye, û ez hem bi dewlemendîya zanebûnên wan dilşad bûme, hem jî dilê min pir baristan bûye, ku ew gelek pirsên dîroka gelê xwe ya serdemên kevnar û ya berî û piştî îslamê rast têdigihîjin... Ji bilî wê, eger ewan tiştek napejirandina jî, bi mominî, anegorî toreya danûstandinên şaristanî, wek mirovne xwedî terbye, bi dana û zanîyarîyên dîrokî gotinên rikberê xwe an sererast dikirin, an jî gotina xwe datanîn ber wî...

Û ya sereke, ewana têgehên "netew" û "ol" rast têdigihîûtin, Bi dîtina wan, divê mirov ne wana tevlihev bike, ne jî bîne hemberî hev!

Lê ya vî mirovî, tuyê bibêjî ew hema nû ji nava refên DAÎŞîyan veqetyaye, çeka xwe danye hêlekê û bi gef û gur vediperike ser bînêranan: "... Merivê ku divêje – eslê me, em êzîdî ne, êzîdî ser dînê xwe mane, ew em bin tirsa şûr da ketine

îslamyetê da, ew meriva ehmeq e, heşê wî jî tune, ew cahîl e jî, ulma terîqê jî nizane!...” – Hema wisa, ne kêm, ne zêde!

Helbet, eger evî mirovî komeke misulmamên fanatîk di cîyekî da bervkiribûya (û dem jî sedsalên navîn bûna) û ji wan ra ev gotinana bigotana, wê demê mirovê tê bigihîşta. Lê di civakeka kurdî ya îroyîn da, ya ku, wek ku di nava gelê me da tê gotin, wek gulistanekê ye, ya ku bi gul û kulîlkên cuda va dewlemend e – di wê da hem yên misulman hene (sunnî, şiî û yên dinê), hem jî yên ne misulman (êzdî, yarasanî, zerdeştî, elewî, xrîstîyan, yehûdî!), ev mirova weha diaxive (ew jî di sedsala XXI da!), hinekê bibêjin, ku ewî yan heşê xwe xwarye, yan jî dîn bûye (û, dibe ku lewra jî di Fêysbûkê da ewqas gotinên hişk ji bo wî hatibûn parvekirin!)... Lêbelê, divê bê gotin, ewî ne heşê xwe xwarye, ne jî dîn bûye, ewqasî, ew di pûngala Erdoxan da wek milîtanekî wî pêk hatye û givrik bûye, ew bi ruhê îslamîya radîkal a AKPê hatye perewerdekirin, ewî di nava hewa wê partîya îslamîst da reng û şêwazê xwe girtye... Govenî? – Fermo, bala xwe bidine van gotinên wî: “başkenta dewletê”, “ehmeq”, “cahîl”, “helbetekî”, “dêmekî”..., û heya navê xwe jî bi şêwaz û qalivê tirkî-AKPî nivîsye: ji ber ku ‘X’ê kurdî di Tirkîyayê da qedexe ye, di navê wî da peyva kurdî ya ‘Berxwedar’ şêwazê tirkî wergirtye û bûye ‘Berhudar’... Ji xwe ji destpêkê heya dawîyê ew “nêrînên” xwe bi gotinên “eleyî esselam!” û “el hemdullah!” govenîdar-îzbat dike... Û, eger mirovek, ê ku hema piçekî ji prênsîpên zanistê agahdar be, van gotinên wî bibihê, dê bipirse: “Zanist, dîrok û dua – çi têkilîya xwe bi hev ra hene? Ev çawa dibe?!” – Ev her terefekî pirsê ye, lê ya sereke, axavtina wî bi şêweyê pêşkêşkirinê va dîjî prênsîpên Qurana pîroz bi xwe ye jî. Eger mirovek li ser dîmenê pirtûkên olî û oldarîyê û bi gotinên xwe ji pirtûka pîroz destpê bike û dawîyê jî digihîje asta kufurîyê, gelo mirov dikare wî bawermend bihejmêre, êdî ez di derbarê erka olî da nabêjim – ew ji çi olê dibe, bila bibe. Lê ya vî mirovî dikare bibe, lewra ku ew, wek peyayekî AKPî tevdigere.

Ev li ser wê pirsê, ka dema li bal mirovekî dêfîtsîta terbye-toreyî hebe (kêmasîyek a heya asta tunebûnê!), dikare bigihîje çi rewşeke nebînayî!...

Naha em bên ser pirsa êzîdîtîyê, ya ku ew mirova weke xwe şirove dike.

Li vira jî sîndroma nezanîya dîrokî û, bi giştî, dêfîtsîta zanistê li bal vî mirovî xwe didin der. Belê, ew, ya ku ew di derbarê êzîdîtîyê da dibêje, heya radeyeke rast e, lêbelê, ew hemû hîç pêwendîya xwe bi êzdîyan û êzdîtîyê ra nîne! Lewra ku, eger êzîdîtî terîqeteke îslamê ya sofîyan e, û navê wê jî ji navê Yezîd bên Muawî ebî Sifyan tê, lê êzdîtî ola gelê kurd a kevnar e, û navê wê jî, ji peyva Êzdî/Ezda, ango, Xwedê tê... Û ev rastîya wê jî di nava vê olê bi xwe da hatye parastin. Di nava bawermendê êzdî da gotinek heye, dibêjin, ku “...hezar û yek navên Xwedê hene, Êzdî jî (ne Êzîd, ha! – E.C.) navekî Xwedê ye!” Û ev peyva jî ji peyverêza “yê ez dayî” pêk hatye – ango, “yê ku ez dame”! Hemû navên Xwedê jî di kurdî da fûnktsînal in (ango, erkî ne), û ji bo navê Xwedê jî, dîsa di nav bawermendên êzdî da tê gotin: “Xwdê cîhan sêwirandye, lê kesekî Xwedê nesêwirandye, Xwedê xwe daye!” – (Bala xwe bidinê – “yê ku ez dame!” û “...yê ku xwe daye!”). Û wisa jî hemû navên Xwedê yên dinê jî wateyên xwe hene...

Ew, ku *êzîdîtî* ne ola gelê kurd e, rastîyek a rastîn e, lêbelê, ew , ku Pîr Dîma dibêje, xwedêgiravî, “... ezditi ne tene bawerya kurmaciaxevan bu, le bele gelek erebiaxev u aramiaxev ji bune ezdi...” (bi hûrbînî: di gotara “Êkspansîya bierbkirina Kurdistanê didome? – 2” – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/êk_spansîya_bierebkirina_k_urdistanê_didome_2 û Rojnameya “Pênûsa nû”, hejmarên 33, rûpel: 12 – 15 da),

dûrî rastîya dîrokî ye. Di rastîya xwe da, ewa ku Pîr Dîma êzdîtî nav dike, tu pêwendîya xwe bi *êzdîtîyê* ra nîne, ew *êzîdîtî* ye – terîqeta sofîyên îslamî ya hevbeş a kurmaciaxevan û erebiaxev u aramiaxevan. Û ev jî goveniêke dinê ye di wê derbarê da, ku îro jî hê hinek kes pêvajoya îslamîkirina êzdîtîyê didomînin!

Ji bilî vê, hê jî di Başîka û Bahzan da zarokên *êzîdîyan* (ne yên êzdîyan, ha-a!), wek ku Hoşeng Biroka govenîyê dide, bi erebîya Şamê (?!) diaxivin... Wê demê li vira pirs dertê holê – erebên êzîdî, yên ku bi erebîya Şamê diaxivin, dikaribûn çawa û ji ku bihatana Kurdistanê? Li vira dikare bersîvek hebe – di demên ji bo îslamê aloz û tund û dijwat da komek erebên êzîdî jî bi Şêx Adî ra hatine vira û di nava êzdîyan da hêwirîne. Bi demê ra hinek ji wana ji hêla zimên va di nava civaka kurdên êzdî da întêgre bûne (hatine bişavctin), bi kurdî axivîne, û paşê, bi berekê va , gav bi gav ji hundur va êzdîtî guartine û ew weguhêrî terîqeta xwe ya îslamî ya sofîyan– *êzîdîtîyê* kirine. Û ev jî bûye sedem, ku êzdî beşdarî şerên navbera terîqetên îslamê bibin, di encamê da bên kuştin û bibin gorîyên pevçûnên terîqatên cuda yên îslamî.

Wek ku Hoşeng Biroka dinivîse, hemû fermanên *êzîdîyan* di serdema pey Şîxadî ra pêk hatine! Wê demê pirs dertê holê – ev fermanana çiqasî yên *êzdîyan* û *êzdîtîyê* bûne? Terîqetên îslamê di nav hev da şer kirine, û êzdî jî beşdarî wan pevçûnên xwe kirine û dane gorîkirin. Ango, yên êzdî bûne gorîyên şerên navbera *êzîdîyên îslamî-sofî* û terîqetên dinê yên îslamê!...

Helbet ev nayê wê wateyê, ku bi dîrokî fermamnên êzdîyan nînbûne! Ew hebûne û dijwartir jî bûne, lêbelê hinek bi “fermanên” navxweyî yên terîqetên îslamê wan fermanên rastîn li êzdîyan didin jibîrkirin (di vê derbarê da xwendevan dikarin bi hûrbînî di gotara Ezîz ê Cewo ya bi sernavê “Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê tunekirin û ji holê rabe” da bixwînin – gotar di întêrnêtê da heye – https://amidakurd.net/ku/tekst/çima_ divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe ).

Belê, bi dîrokî wisa li hev hatye, ku îro di nava gelê kurd da çend olên cuda hene, lê piranîya kurdan misulman in. Lê, gelo ev dikare îro ji bo hinek nûnerên kurdên misulman bibe bingeh û sedem, ku ew serdestîya xwe li hember kurdên dinê bdin xuyan û li wan ferz bikin? Helbet, na,– eger têgihîştina wan ne ku olî, lê netewî be?

Û, binihêrin, eger vî mirovê bi navê “Yusuf Berhudar” dîrok zanibûya, an di nava wî da têgihîştina xwe ya mirovî û netewî hebûya, gelo dê ev gotinana bigota: “... Tabî, eva tiştê ez dibêjim, tarîxak min xandye, min geryaye, min lê nihêrye, kitabê hêna berê, min alima pirsye, ... min pirs kirye, ... , zef gelek cahîl hene, her yek întêrnêtê da tiştekî divêje, hinek miletê meyî misilman ra dibêjin, dînê me, kalbavê me êzîdî ye, sondê wan, edetê wan dikin nav me. Helbetîkî tiştekî wisa tune, dînê me jî, edetê me jî îslamyet e, elhemdilûllah, me ... eşqa dilê xwe îslam qebûlkirye, elhemdulûllah em gelekî şa ne”...

**Amida Kurd:** Bi rastî tiştekî ecêb û matmayînê ye!

**Ezîz ê Cewo:** Belê, wisa ye! Heya mirov ji guhê xwe bawer jî nake, ku di sedsala XXI da... Nizanim, mirov tu gotinan nabîne!...

Lê, her çi jî hebe, mirov li vira dikare çi bibêje?

Helbet, rêza me bi nûnerên hemû olan ra heye, ew ji çi netewê dibin, bila bibin. Lê rastîyeke dîrokî heye, û her mirovek, ê ku behsa rastîyê dike, divê ewê rastîyê jî bizanibe. Ew jî ev e: hîç gelekî di dîrokê da bi tacên gulan oleke bîyanî pêşbazî nekirye, hîç kesekî bi rezadilîya xwe dest ji ola xwe ya kal û bavan bernedaye û oleke bîyanî nepejirandye (ji bilî çend heb bêbav, xayîn û xwefiroşan!), timê jî di

destpêkê da hemû olan, ji bo ku xwe li gelekî bîyanî bidin pejirandin, li hember wan wisa jî zordarî pêk anîne, û ji bo wê jî, heya bi dewletê ra bûne yek û hêza dewletê jî ji bo armancên xwe bi kar anîne. A, rastîya dîrokê ev e! Û di dîroka hemû gel û bawerîyan da timê jî ev rastî hatye dîtin û di wê derbarê da di dîrokên wan da hatye nivîsîn. Û di nav dîroka gelê kurd da jî di vê derbarê da govenîyên pêbawer hatine parastin. Yek ji wan jî helbesteke bi zimanê kurdî nivîsî ya sedsala VII e, ya ku ji hêla helbestvanekî navê wî ne dyar li ser çermkaxetê (pêrgamênt) hatibûye nivîsîn, û parçeyekî wê destpêka sedsala XX di şkevteke li rex bajarê Silêmanîyê da hatibûye dîtin.

Weha têksta wê helbestê – bê şirove:
Hormozgan reman, atûran kujan,
Wisan serdewe gewreî gewrekan,
Zorkar arap kerdina xapûr,
Guneî pale heta Şarêzûr.
Jin û kenîkan wê dîl beşînia,
Merd azad li ve rûî hwîna…!

**Amida Kurd:** Lê ew ferman, ên ku ewqas di derbarê wan da tê gotin, mamosta?

**Ezîz ê Cewo:** Ev bi serê xwe, wek ku min li jorê jî got, tiştekî dinê bûye!

Eger kurd (êzdî-ne êzdî, ferq nake!) îro di derbarê fermanên êzdîyan da diaxivin, an dinivîsin (hinek dibêjin ew 72 bûne, hinek heya wan digihînin 97an!), divê wê jî bizanibin, ku hê di dîrokê da hîç kesekî fermanên ser tu gelekî nehejmartine, ku 72 di nava gel da hejmareke sembolîk e, û tê wateya “pir”, “gelek”, ku gelek ji wan “fermanan” di rastîya xwe da şerên di navbera terîqatên îslamî da bûne, û gelek caran di wan şeran da di bin navê ***ezîdîyên sofî yên îslamî*** da ***êzdî*** jî dane gorîkirin... Û, rast e, di van şerên navxweyî yên terîqetên îslamê da êzdî hatine kuştin (rasttir dibe, mirov bibêje, ew dane kuştin!), lê, wek ku min êdî li jorê gotye, fermanên êzdîyan cuda bûne, ew ji van girantir bûne, lê ya here mzin, ew bûye, ya ku di derbarê wê da di helbesta navborî ya sedsala VII da tê gotin!... Ji wê mezintir nînin! Û qewal-mîssîonêrên êzîdîtîya sofîya îslamî, van şerên navxweyî yên terîqetên îslamî didin pêş û bi wan tevkujî û fermanên gelê me yên dinê didin jibîrkirin. Tevkujîya êzdîyan (û ya tevahîya geelê kurd, bi giştî) ya Mezin di sedsala VII da pêk hatye, dema dest bi êkspansîya ereban a li ser Kurdistanê bûye, û di derbarê wê da jî di helbesta navborî da tê gotin, a ku li ser çermkaxeta Silêmanîyê hatibûye nivîsîn...Wekî dinê, ew çi ku tê serê êzdîyan û tevahîya kurd û Kurdistanê, ew dûmahîya wê Tevkujîya Mezin e...

**Amida Kurd:** Ma ewqas jî dibe, mamoste? Ma ne, hewlên tevkujîyan hê jî didomin, divê rojekê ev bêdadî bê rawestandin, ma ji bo vê çareyek nîne!?

**Ezîz ê Cewo:** Helbet, hûn (wek ku tevahîya gelê me) ji bo vê helwesta xwe ya li hember vê rewşa dîrokî (ez jî wê ***çarenûs*** navnakim!) mafdar in... Ji bo ku tevkujîyên weha di dîrokê da êdî dubare nebin, dem e, ku êzdî (wisa jî, tevahîya gelê kurd!) li bingehên xwe yên netewî vegerin, li şûna ku bidin dû terîqetên bîyanî, yên ku her tenê dikarin wan berbi mirinê û tunebûnê va bibin, yekîtîya xwe ya netewî ava bikin, û li ser bingeha nirxên netewî hem hebûna xwe ya fîzîkî, hem jî ya ruhî-rewanî misoger bikin...

Dîroka mirovahîyê ji bo vê hê rêyeke dinê nedîtye!...

Û tiştekî dinê yê balkêş jî, yê ku ne rastedêr be jî, bi vê mijara me ra têkilîdar e! Dema êdî ev beşa amade bû, xwendevaneke me ji Îzmîrê – Şengul Seferê vîdêoyek ji min ra rê kiribû, û di peyama xwe da nivîsîbû: “Mamoste, ca bala xwe bidê, ev êzîdîyên me çawa her tiştî didin bin nigê xw!” – Ev jî jêderka wê ye: https://www.facebook.com/ qehremansozdar/videos/ 2220865198002072/

Min ew vîdêo vekir, bi baldarî lê nihêrî, amadekarê wê nivîsîbû: “ mixabin ji hinek Êzidîyan re!!! ??? - ؟؟؟ !!! مخابن بۆ هەنێک لە ئێزدیەکان” – Min bala xwe dayê, yê ku ev vîdêo parvekiribû – Qehreman Sozdar, ji êşa dil diqîr’e: “...Ya ku hûn dibînin, eva komeka kur û kiçên êzîdî ne... li Kurdisatanê nîva bajarê Dihokê sirûda Îraqê lêxistîne, alayê alemê Îraqê bilind kirine ... bi rastî jî heyf û mixabin!...” –Helbet, bi rastî jî dilê mirov dêşe, bi bi taybet jî, dema ew rastîyên dîrokî û rewşa îroyîn a Başûrê Kurdistanê nizanibe.

Ez dixwazim, hem ji xwendevana hêja Şengulê ra, hem jî ji hêja Qehreman Sozdar ra bibêjim, ku di sêrî da divê bê zelalkirin, ka ew xort û kiçana kurdên êzdî ne, yan erebên êzîdî-sofî ne (yên ku hê jî di Kurdistanê da bi erebîya xwe ya Şamê diaxivin!) ... Ya dinê jî, ma Dihok bajarekî Başûrê Kurdistanê nîne? Ma ewan bêyî destûra rêvebirîya Herêmê (a PDKyî) û bêyî helandana wan, dikaribûn ev çalakî pêk banyana? – Helbet, ev pirsên min hrêtorîk in, û bersîvên wan jî di wan bi xwe da hen... Divê mirov hê hewl bide bizanibe, ka, gelo di Lalişê û Şengalê da êzdîyên kurd mane, yan hemû bûne êzîdî-sofîyên ereb? Û, eger hinek êzdî mabin jî, yên ku êzdîtîya xwe parastine, divê mirov bide heşê xwe, ka çawa bike, ku wan ji îslamîbûn-erbbûnê biparêze... Ê, gelo kîyê bi vî karî rabe, rêvebirîya Herêmê, ya ku bi siyaseta xwe wêrekîyê dide wan êlêmêntên ereb ên îslamî-sofî, ku hem êzdîtîyê ji hidur va biherifînin, hem jî ji navê êzdîyan çalakîyên vî rengî pêk bînin?

Û ya dawîyê, eger Qehreman Sozdarê hêja an kesekî dinê (û Şengal jî di nav da!) di Başûrê Kurdistanê da di wê derbarê da vîdêoyek amade bikira, ka çawa bi destûr, piştgirî û alîkarîya rêvebirîya Herêma otonom a Başûrê Kurdistanê (PDK) bi dehan baregehên sîxurî-leşkerî yên dewleta tirk di herêmê da bi cî bûne û li dijî Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî û gelê herêmê yê sivîl êrîşên leşkerî-hewayî pêk tînin, ka çawa nîvekî xaka Başûrê Kurdistanê di bin silogana “serxwebûnê” da radestî Bexdayê kirine, û wisa jî ji êşa dil biqêrîya, bigota: “Rawestin, hûn çi dikin, ma hûn çima bûne hevkar û hevparên êrîşên dijmin, çima we welatê me di bin pêyên dagerkeran da raxistye û ew kirye baregeha wan a leşkerî – li dijî gel û welatê xwe?” – Balkêş e, gelo rêvebirêya herêmê (ya PDKyî) dê destûr bida, an helwesta wan dê li hember wê çawa bûya?

Û, eger helwesteke weha di herêmê da hebûya, eger rêvebirîya herêmê siyaseta îslamî ya bi AKPê ra hevpar nemeşanda, dibe, ku ev êlêmêntên erebî-îslamî, yên ku ketine nava civaka * êzdîyan*, dê wêrekî negirtana û wisa bi hêsanî êzdîtî ji hundur va nexwarana û tune nekiriana!

A, ji bo vê, bi rastî sed heyf û mixabin!...

**Amida Kurd:** Spas, mamoste, ji bo bersîv û şiroveyên te yên hêja û kêrhatî... Em di wê bawerîyê de ne, ku xwendevanên me wê ji xwe ra agahî û zanîyarîyên pêwîst jê derînin, û, eger pirs û dîtinên wan ên cuda çê bibin, ewê ji me ra binivîsin!

**Ezîz ê Cewo:** Spas ji bo we, ji bo pirsên we yên balkêş, ên ku bûn bingeh, ku govtûgoya me dewlemendtir û balkêştir bibe...

Emê benda pirs, nêrîn û pêşnîyarên xwendevanên hêja bin...

Slav û r’êz!

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**14.06.2019**

# GOTÛBÊJA ŞEŞEM

**…Terefekî pirsgirêkê yê dinê jî balkêş e – çima, gelo, ew êzdîyana, yên ku destpêka sedsala XX ji tevkujîyan filitî bûn, resenî û xwexwetîya xwe û ola xwe ya kevnar parastibûn, û di komarên Sovêtê yên Başûrê Kavkasîyayê da bi serfirazî pêşdiketin, van demên dawîyê bi berekêva dest ji ola pêşîyan berdidin û terîqatên cuda yên xrîstîanîyê, yên wek Govenîya Yehova, dipejirînin! … Û di vî karî da jî Komara Ermenîstanê rola xwe ya taybet heye. Çima, gelo?**

**Amida Kurd:** Mamoste, careke dinê dem baş!

**Ezîz ê Cewo:** Dem baş, slavên min ji we û xwendevanên we ra!

**Amida Kurd:** Me bi te re pirsgirêkên êzdîtîyê, wek mijar, di tomerîya wana de nirxandin, mamoste. Spas ji bo keda te di vî warî de – ji gotarên te yên zanistî yên balkêş û pirtûka te ya hêja ya "Êzdîtî: divê mirov rastîya wê li ku bigere", heya bêderê vê hevpeyvîna me ya bi te re! Bi rastî, me digot, qey bi xeleka berî vê, ya pêncem re emê vê hevpeyvîna xwe bidawî bikin... Lê, wek ku di nav gel de tê gotin: "Tivdîra malê di bazarê da deerbaz nabe!" Xwendevanên me qala terefekî vê pirsgirêkê yê dinê jî dikin. Ew dipirsin, ka gelo çima, ew êzdîyên ji ber tevkujîyên dagerkeran û îslamîyên fanatîk filitîbûn û demekê di Komarên Kafkasîyayê yên Sovêtê de êzdîtîya xwe parastibûn û pêş diketin, bi berekê va dest ji ola kal û bavan berdidin û didin dû terîqetên xirîstyanîyê yên wek "Govanîya Yehova" û yên dinê... Û di vî warî de bi taybet rola Komara Ermenîstanê ya neyînî destnîşan dikin...

**Ezîz ê Cewo:** ... Belê, wisan e, ew jî beşekî girîng ê vê pirsgirêka giştî ye! Û mirovê nikaribe bibêje, ku hemû terefên vê pirsgirêkê hatine nirxandin, eger rewşa êzdîyên Sovêta berê li ber çavan neyê girtin. Wek ku tê zanin, evê civaka gelê me di parastina çanda netewî da rola xwe ya girîng lîstye, lê îro di nava alozîyekê da dijî... Hûn jî, xwendevan jî mafdar in – divê ew rewş, a ku îro êzdîxaneya vê herêmê têda dijî, bê nirxandin...

Lê berî ku em derbasî nirxandina vê rewşê bibin, çend pirsên xwendevanan hene, bi destûra we, em bersîva wan bidin, paşê vê mijara govtûgoya me bi nirxandina rewşa êzdîxneyê û êzdîtîyê di Sovêta berê da bi dawî bikin...

Weha, Şengul Sefera ji Îzmîrê vê carê jî dipirse: "... Mamoste, di nivîsên te de em dixwînin, ku di dema xwe da bi Şêx Adî re êzîdîyên sofî yên misulman jî hatine nava êzdîyan, û di nava wan de wisa jî yên ereb hebûne. Wisa jî tu dibêjî, ku beşekî wana bi demê re ji hêla zimên ve helyane, lê wana sofîtîya xwe parastine... Û tiştekî dinê jî balkêş e, ku hinekan ji wan heya îro jî "erebîya xwe ya şamê" parastin e, û

zarokên wan hê jî bi wî zimanî diaxivin... Ev hemû heya radeyekê tê fêmkirin, lê tiştek nakeve heşê min – ma êzdîyan çwa ew di nava xwe de bi rengê wan ê îslamî va qebûl kirine û heya di bin bandora wan de hemû bingehên ola xwe ya kevnar, a ku hîç pêwendîya xwe bi îslamê û sofîtîya wê re nîne, guhartine?... Û pirsa dinê jî, ew a ku Pîr Dîma dibêje, ku “... ezdîtî ne tene bawerya kurmaciaxevan bu, le bele gelek erebiaxev u aramiaxev ji bune ezdi...”, naha mirov evê çawa tê bigihîje, gotina wî di derbarê *êzdîyan* da ye, an di derbarê êzîdîyên sofî da? ...”

Û, bi rastî jî, evana pirsne balkêş in, û bersîvên wan ên heşmendî jî hene!

Em bên ser beşê yekem ê pirsa Şengula hêja: “... ma êzdîyan çwa ew di nava xwe de bi rengê wan ê îslamî va qebûl kirine û heya di bin bandora wan de hemû bingehên ola xwe ya kevnar, a ku hîç pêwendîya xwe bi îslamê re nîne, guhêrîne?”

Ji bo ku mirov bikaribe ji bo vê pirsê bersîveke heşmendî bibîne, divê ewê anegorî pêvejoya dîrokî binirxîne. Evê jî divê ji rewşa êzdîyan a wê demê destpê bike. Ma wê demê êzdîyên di nava dorpêça *îslamîyan* da, di bin metirsîya êrîş û fişaran da, çi ji destê wan dihat û çi dikaribûn bikirana?...

Û, lewra jî, ya yekem, wê demê êzdîyên di wê rewşa bêçare da ew *êzîdîyên sofî-îslamî* heya radeyekê ji xwe ra kirin wek sîwanekê, ji bo ku di bin wî navî da heya demekê xwe ji tunekirina fîzîkî biparêzin... Lê ew, a ku wana hêvî dikir, ku dê her heya demekê bidome, pir dieêj kişandye... Û di bin metirsîya kuştin û talanê û êrîşên ji der û hindur da, derfet çê dibin, ji bo ku *êzîdîyên* sofî-îslamî, yên ku xwe di nava civaka êzdîyan da telandibûne, gav bi gav bawerîya xwe *ya* sofîtîya îslamî bidin pêş...

Di rewşeke weha da ji êzîdîyên sofî-îslamî ra li hev tê, ku ew di nava civaka êzdîyan da ji bo pêşxistina bingehên bawerîya xwe ya sofêtêya îslamî rewş û derfetên pêwîst biafirînin. Ewana bi rêya rêformên bi navê Şêx Adî ra girêdayî û sîstêma wî ya “Mala Adîyan” merc û derfetan diafirînin, ku reng û şêwazên sofîtîya îslamê bidin êzdîtîyê, û bi demê ra nûnerên terîqeta êzîdî-sofîya îslamî di nava civaka êzdîyan û sazîyên olî da dibin serdest...

Û piştra, dema di navbera van êzîdîyên sofî-îslamî û terîqetên dinê yên îslamê da şer derdikevin, êzdî jî bi wana ra beşdarî wan pevçûnan dibin û dibûn gorîyên şerên navxweyî yên di navbera taerqatên cuda yên îslamê da...

Ji bilî vê, ya duyem, di nava êzdîyan da êdî bi hatina Şêx Adî ra hewayeke nerm a bê berxwedan pêk hatibûye...

Dibe ku hinek bipirsin, ma êzdîyan nizanibûn, ka Şêx Adî kî ye? – Belê, helbet, dizanibûne, lêbelê,... “ eger pêwendîyên Şêx Adî hê di dema zarotîya wî da bi civaka êzdîyan ra nînbûna, êzdîyan ew nas nekiribûna, û ev jî nebûya sedem, ku ew bi hêsane ji hêla wan va wek “mirovê xwe” bê pejirandin, û bi zarê xwe yê şêrîn ewî xwe nekiribûya dilê wana (pêşîyên me gotine: “Bi zarê şêrîn maran ji qulê derdixin!”), û, ya here sereke, eger rewşa êzdîyan a giran û bêçare nînbûya, û, eger ew jî wek ên berî xwe bi şûr û sotin li ser êzdîyan da hatibûya, êzdîyan dê berxwebidana, dê xwe bidana kuştin, lê Stargeha ola xwe ya navendî wê nespartana wî û dê îro jî ne di vê rewşê da bûna... ” – Di vê derbarê da di gotara min a “**... Çimam divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê tunekirin û ji hole rabe? ...**” da bi hûrbînî tê vegotin.– Ev gotara ji xwe di întêrnêtê da heye, xwendevan, dikarin wê bibînin û bixwînin – jêderka wê ev e: https://amidakurd. net/ku/tekst/çima_divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe .

Û – pirsa Şengul Seferê ya dinê ya di wê derbarê da, ku Pîr Dîma dibêje: “...

ezdîtî ne tenê bawerya kurmaciaxevan bu, le bele gelek erebiaxev u aramiaxev jî bune ezdi...", naha mirov evê çawa tê bigihîje, gotina wî di derbarê êzdîyan da ye, an di derbarê êzîdîyên sofî da? ..."

Helbet, bersîva vê pirsê jî heye. Ev pirsa bi heşmendî weha dikare bê şirovakirin: a ku Pîr Dîma dibêje, ne di derbarê êzdîtîyê da ye. Êzdîtî nikare hem ola kurdan be (yên ku Pîr Dîma wan *kurmancîaxêv* nav dike!), hem jî ya *erban* be (ya erebîaxêv û aramîaxêvan!), lewra ku êzdîtî di cîhanê da tenê di nav kurdan da heye – ew ola kevnar a gelê kurd e. Ay, lê êzîdîtî, wek terîqeteke îslamê, bi rastî jî oleke "întêrnatsîonal" e! Di nava wê da hem ereb hene, hem kurd û hem jî nûnerên gelên dinê...

Bi rastî mirov matma dibe, ka, gelo Pîr Dîma çima weha dibêje, û ez niznim ji bo vê çi bibêjim? Lêbelê, eger mirov evê bi heşmendî binirxîne, ji bo gotinên weha tenê du bersîv dikarin hebin: yan ê ku van gotinan dibêje, ne destûrmend e û vê cudahîyê tê nagihîje, an jî, ew van gotinan bi zanebûn wek mayîneke veşartî di nava *êzdîtîyê* da datîne, ya ku dê paşê, piştî demekê ne bi carekê va biteqe!...

Pirsa dinê jî, ji xwendevanên hêja Keleşê Serdar û Zeyneb Agrî hatye. Ew dipirsin, ka gelo hemû melek tenê mêr bûne, ku ez gotinên 'Mêrê Rojê', 'Mêrê tav û sîyê' û yê dinê yên weke van bikar tînim?

Berê pêşin, evan gotinana ez ji ber xwe dernaxim û nabêjim, pêşîyên me hê çend hezar sal berê gotinên bi wê pergalê bikaranîne. Ya dinê, eger Keleş û Zeyneba hêja gotara me ya "Êzdîtî. Çend raman û nêrîn li ser rastîya vê ola kevnar, rewşa wê ya îro, nexwendîtîya olî ya di nav me da û leyîstokên siyasî" xwendibin, di wê da bersîva vê pirsa wan heye. Bala xwe bidinê, di wê da çi tê gotin:

"Di k'urdî da wat'eya p'eyva *mêr* teng nîne (*mêr û jin*). Di zargotina me da p'eyver'êzên weha mane û gihîştine me: **Mêrê R'ojê**, **Mêrê Dîwanê**, **Mêr-Milyak'et**. Dema em di çarç'oveya zimanên hind-ewropî (hind-gêrmanî) da hemberî hev dikin, dibînin, ku di hinek cîyan da wat'eyên wan digîhîjin hev.

Mînak, di înglîzî da peyva *merit* (*'mrit*) tê wateyên *qazenc*, *hêjayî*, *qazenckirin*, *hêjayî tiştekî bûyîn*. Di r'ûsî da p'eyva *mêr* di nava p'eyverêza "*mêr goroda"* da tê wat'eya r'êvebir, serok (rêvebirê/şaredarê bajêr). Dema mirov van mînakan dide ber hev, dibîne, ku di k'urdîya kevn da *mêr* hatîye wateya *p'eywirdarekî p'ayebilind* (*Mêrê dîwanê*), *p'eywirdarekî pîroz* di "pantêona" xwedawendan da (*Mêrê R'ojê, Mêr–milyak'et*). Eger em p'eyver'êza *mêr-milyak'et* r'avekin, emê bibînin, li vir *mêr* bi wat'eya *milyak'et* hatîye têgihîştin: dema pêşîyên me peyveke bîyanîyan di nav axavtina xwe da anîne, ew bi peyveke k'urdî r'a tevayî bik'ar anîne, ji bo ku bê têgîhîştin: *horî-melek', mêr-milyak'et, r'uh û r'ewan, r'oj û şemal, şert û merc, dua-dirozge, heş-aqil, derî-bacî...*

*Mêr* peyvek e, ya ku di k'urdî da wat'eya wê fireh bûye, an du p'eyvne cûda ne, yên ku tenê bi şêwazên xwe va di nava demê da bûne wek hev?! Ji bo bersiveke r'ast û zanistî bê dayîn, divê lêk'olîneke zanistî ya k'ûr û berfireh bê kirin..." – Tevahîya vê gotarê xwendevan dikarin di bin sernivîsa "Êzdîtî" da di întêrnêtê da bibînin û bixwînin – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/Ê_Z_D_Î_T_Î_1.

Di ser van peyvan da mirov wisa jî dikare peyva kurdî ya 'mîr' zêde bike.

Lê ew, ku peyva 'mêr' bi peyva erebî ya 'melyak'et' ra tê bi kar anîn, ev êdî şêwazekî hê derng e, yê ku di serdema Şêx Adî da pêk hatye, lewra ku, di destpêkê da, dema kurdan peyvên bîyanî di axavtin an nivîsara xwe da bi kar amnêne, wana di destpêkê da ew bi peyva kurdî ya hemwateya wê peyvê ra bi kar anîne, ji bo ku ew

peyva bê têgihîştin û bi hêsane di nava zimanê kurdî da întêgre bibe.

Ka, em li vira wisa jî çend zo peyvên weha binirxînin: ‘horî-melek’’, ‘mêr-milyak’et’, ‘r’uh û r’ewan’, ‘r’oj û şemal’, ‘şems û tav’, ‘şert û merc’, ‘dua-dirozge’, ‘heş û aqil’, ‘derî-bacî’ û yên dinê.

Û dema pêşîyên me peyva erebî ya ‘melyak’et’ di axavtina xwe da bikaranîne, wana ew, anegorî qanûnên hindurîn ên zimanê kurdî, bi peyva kurdî ya ‘mêr’ ra gotine (an nivîsîne), ji bo ku ew peyva bîyanî bê têgihîştin, lewra ku ew peyva kurdî hemwate- sînonîma wê peyva erebî ye. Û piştî wê, dema ew peyvên erebî bi hemwateyên kurdî ra hatine bikaranîn û bi demê ra hatine têgihîştin, ew di zimanê kurdî da êdî tenê, bi serê xwe jî hatine bikaranîn”.

Naha jî, fermo, ka em vegerin ser pirsa we...

**Amida Kurd:** Belê, mamoste, spas ji bo şiroveyên te yên balkêş! Wek ku me li jorê jî got, terfên vê pirsê yên dinê jî ji bo xwendevanên me girîngîya xwe hene û balkêş in. Ew pirsa rewşa êzdîyên Sovêta berê ye, yên ku ji ber tevkujîyan filitîbûn û demekê di Komarên Kafkasîyayê yên Sovêtê da êzdîtîya xwe parastibûn û pêş diketin, çima ji carekê ve wisa bi berekê va dest ji ola kal û bavan berdidin û didin dû terîqetên xirîstyanîyê yên wek Govanîya Yehova û yên dinê... Û xwendevanên me di vî warî da bi taybet jî rola Komara Ermenîstanê ya neyînî destnîşan dikin, ku hinek êzdî îro dibêjin – êzdî ne kurd in ... Bi rastî ev pirsa ji bo me jî balkêş e!

**Ezîz ê Cewo:** Belê, bi rastî jî ev pirseke balkêş e. Û ji bo ku mirov vê pirsgirêkê rast têbigihîje û bikaribe bersîveke rast ji bo wê bibîne, divê wê tenê ji dema pey hilweşîna Sovêtê ra nenirxîne. Û, eger hinek dibêjin, ku piştî hilweşîna Sovêtê ra yek-du şerletanên ji nava zanista lêp rabûne û gotine an nivîsîne, ku êzdî ne kurd in, û ev pêvajoya destpê bûye, ev gotin ewqasî jî ne rast e...

Ji bo xatirê rastîyê, divê bê gotin, ku vê pirsgirêkê hema wisa di rojekê da nedaye der. Ew ji kûr û dûr tê. Ji bo wê jî, ka, em jî ji dûrva destpê bikin. Weha em bala xwe bidinê, ka nivîskarê ermenî yê destpêka sedsala bîstî A. Gyûrcyan sala 1904-an di derbarê *êzdîyan* û rewşa wan a derûnî ya wê demê da di gotara xwe ya “Kurdên êzdî” da çi nivîsye: “… Wek ku hemû berekên kurdan bi giştî, êzdî jî, mîna gelên dinê yên misulman nizanin xwe “misulman” an “êzdî” nav bikin. Mînak, eger ji kurdekî misulman an ê êzdî bipirsî, ka ew kî ye, ewê bibêje: “Ez kurd im!” Û, eger bipirsî, ka ew çi kurd e, ewê her paşê bibêje, ku kurdê misulman an ê êzdî ye. Heya van salên dawîyê wisa bû, lê dema nefreta ermenîyan a li hember kurdên misulman pêş ket, êdî yên êzdî ewqasî jî bi serbilindî nabêjin: “Ez kurd im!” Ev yeka bi taybet jî di nav êzdîyên di bin desthilatdarîya Rûsîyayê da dyar dibe, yên ku hinek tiştên wan bi awayekî bi ermenîyan va girêdayî ne: çavê wan li destê ermenîyan e.

Ev dide xuyan, ku ruhê olî di nava kurdan – wan bazên çîyan da pir lewaz e, ku heya îro jî ew neteweke ne olî bûye û mîna gelên îslam ên fanatîk gengeşîyên ser pirsên olî hez jî nakin... ” (A. Gyûrcyan: “Kurdên êzdî”, kovara ermenî ya “Lûma”, sal 1904, hejmar 1, rû. 75 – 93 – bi zimanê ermenî // Ա. Գյուրջյան, «Եզդի քրդեր», «Լումայ» հանդես, 1904 թ., թիւ 1, էջ 75 – 93).

Ev daneyeke govenîdar û pir balkêş e di wê derbarê da, ka çima hema wisa, xwedêgiravî, “jinişkêva” hinek kurdên êzdî yên Ermenîstanê rabûne û gotine; “Em ne kurd in!”

Eger mirov bi baldarî van gotinaan binirxîne û bi beşmendî watedar bike, dê bikaribe, ne ku tenê rewşa êzdîyan di Ermenîstanê da tê bigihîje, lê her weha sedemên rewşa pêwendîyên kurd û ermenîyan ên dîrokî bi giştî şirove bike. Û, bi

dîtina min, ji van gotinan divê ne tenê û ne ewqas kurd dersan derxin, çiqas ermenî bi xwe jî...

Ji hêla dinê va di vê rewşa malwêran a êzdîtîyê ya di Ermenîstanê da qewal-mîssîonêrên der û hindur ên terîqata îslamî-sofî ya *êzîdîtîyê* rola xwe ya neyînî dilîzin, ên ku dest dane destê wan çend şerletanên ji nava zanista lêp, û ji bo tunekirin êzdîtîya resen karê xwe yê reş didomînin ... Êzîdîyên sofî-îslamî di nava êzdîyan da ewqasî bûne xwedî bandor, ku nekurdbûna xwe li tevahîya êzdîyan ferz dikin, û hinek êzdî ji ji ber nezanî û nexwendîtîya xwe ya olî li dû wan diçin...

Lê, divê bê zanîn, dibe ku îro di tu welaatekî chanê da ewqas çevkanîyên dîrokî yên pêbawer di derbarê kurdan da ji dîroka wan a kevnar a ji serdema Medyayê girtî heya îro û, bi taybet jî di derbarê êzdîtîyê da tunene, çiqas di Ermenîstanê da. Her divê mirov bikaribe wan bibîne, bixwîne û bide xwendin!

Û ji bilî vê, bi giştî, divê êzdî ne ku guh bidin kaxazokên hinek şerletanên nûpêketî yên ji nava zanista lêp, û wana ji xwe ra bingeh bigirin, lê di sêrî da hewl bidin, rastîya ola xwe ya kevnar bi xwe ji hindur va nas bikin û paşê jî çavkanîyên ermenîyan ên serdemên kevnar û sedsalên navîn bixwînin û li ermenîyan jî bidin xwendin. Ji xwe, bi dîtina min, me – kurdan berhema bavê dîroka ermenîyan Movsês Xorênatsî ya “Dîroka Ermenîstanê” (sedsala V a piştî bûyîna Îsa), wek ku tê xwastin, hê nenirxandye... Ev pirtûka ji hêla watedarkirina dîroka gelê me ya kevnar va çavkanîyeke giranbuha ye. Piştî vê berhemên nivîsakr û dîrokzanên ermenîyan ên demên cuda tên, û di nava wan da pirtûka ezdazan û zanîyaarê ermenî-xrîstîanî yê destpêaka sedsala XX Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan a “Kurmanjên yêzîdî” ji bo vê mijara me cîyê xwe yê taybet heye.



Pirtûka S. V. Têr-Manvêlyan a "Kurmanjên yêzîdî"

Ev pirtûka sala 1910an hatibûye weşandin, lê dema Sovêtê, dema di Komara Eremnîsatnê ya Sovêtî da di Akadêmîya zanistê da beşê kurdzanîyê hebûye, dema bi zimanê kurdî rojnameya “R’ya t’eze” dihate weşandin, dema weşanên radîyoya Yêrêvanê bi zimanê kurdî pêk dihatin, dema di Zanîngeha Dewletê ya Yêrêvanê da beşê kurdzanîyê hebû, lê di derbarê vê pirtûka hêja da hîç kesekî tiştek “nizanibû”. Çima? – Ne ji bo wê, ku îro ev şerlatanan, ên ku derketine holê, bi hêsane bikaribin bi êzdîyan û êzdîtîyê bilîzin? Eger tê bîra xwemdevanên hêja, min di gotara xwe ya “Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da” nivîsîbû: “... Ew, ku Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan bi xwe p’irtûka xwe “Kurmanjên yêzîdî” nav kirye, tê wê wat’eyê, ku ji bo xudanê p’irtûkê nûnerên vê civaka êt’nîkî-bawerî kurmanc bûne. Lê kurmanc jî, wek ku tê zanîn, beşê gelê k’urd ê herî mezin e (zêdetirî %70), yên ku bi zaravê kurmancî diaxivin.

Di vê pirtûka xwe da S. V. Têr-Manvêlyan navê vê civaka êtnîkî-bawerî bi 9 şêwazên cuda nivîsîne û bi giştî 150 caran bikartîne: **yêzdî** – 44 caran (ev têrmîna bêhtir nêzîkî xwenavkirina êzdîyan bi xwe ye – **êzdî**), **kurd** – 24 caran, **kurmanc**– 17 caran, **yêzîd** – 8 caran, **kurmancên yêzdî** – 5 caran, **yêzîdên kurmanc** – 4 caran, **yêzîdên medyayî** – 1 carê, **kurdên yêzdî** – 1 carê û **kurmancên yêzîdî** – 1 carê. Û, ji bilî vê, ew van hemû navan dem bi dem bi peyv û peyvebendên dinê, yên weke: **“peyhatîyên medên kevnar”**, **“peyhatîyên Êkbatanê”**, **“peyhatîyên medîy-**

**aîyan", "peyhatîyên vîştapîyên medyayî", "şaxê Astîyagê leheng ê medyayî"** û yên dinê ra bikartîne... " (Di vê derbarê da xwendevan dikarin di gotara min a bi sernavê "Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da" – https://www.amidakurd.net/ku/tekst/ezdazanê_ ermenî_yê_destpêka_sedsala_xx_di_derbarê_êzdîyan_û_êzdîtîyê_da û di hejmarên 51 û 52an ên rojnameya "Pênûsa nû" bixwînin).

Bala xwe bidinê, eger mirov xwe nas jî neke, yan jî xwe şûna ker û koran, an nezan û nedestûrmendan jî daneyne, dê ji van û çavkanîyên dinê hinek rastîyan derîne.

Û dema mirov wan gotinên ji gotara A. Gyûrcyan a "Kurdên êzdî" (ya sala 1904an), ên ku me li jorê anîne, û gotinên S. V. Têr-Manvêlyan ên ji pirtûka wî ya "Kurmanjên yêzîdî" (ya sala 1910an) hemberî agahî û zanîyarîyên ji çavkanîyên sedsalên XV û XIX dike, dibîne, ku ji sedsalên navîn heya destpêka dewra XX di nav ermenîyan da gelek kesayetîyên ronakbîr û bîrewar bi bawer bûne, ku kurd (di nav wan da, helbet, wisa jî, kurdên êzdî) peyhatîyên medên kevnar in. Û agahîyên weha îro jî hene, hinek ji wan hatine weşandin, lê hinek jî di çavkanîyên kevnar ên destnivîskî yên ermenîyan da tên parastin û benda dema xwe ne. Em li vir her bala xwe bidin çendekan ji wan:

***"...Berbangê zû ên med hatin, ên ku ji wan ra kurd dibêjin".*** – Ev buyer, a ku di derbarê wê da li vir tê gotin, ango, hatina *kurd-medan* a ber dêra ermenîyan a Tspnê, 19-ê gulana sala 1426-an pêk hatye (Pirtûka Arîstakês Têvkants a "Hayêrg", Tîflîs, s. 1882, bi zimanê ermenî, rûpelên 175 – 180 // Առիստակես Տևկանց, «Հայերգ», Թիֆլիս, 1882, էջ 175- 180).

Û yeke dinê jî:

***"... Binecîhên wî welatî, yên ku kurd in, ji wan ra med dibêjin".*** (Ev jî – di destnivîsa dewra XVI da heye – çavkanî: Înstîtûta destnivîsên kevnar a Ermenîstanê –Matênadaran, destnivîsa dewra XVI, №1495, rûpelên 142a û 142b., bi zimanê ermenî // Հայաստանի Մատենադարան, XVI դարի ձեռագիր, №1495, էջ.էջ. 142ա և 142բ.).

Agahîyên mîna van li bal ronaydarê ermenî yê navdar ê sedsala XIX Xaçatûr Abovyan jî hene. Weha, di nasîyên gotara xweye **"Yên kurd"** da ew çi dinivîse: ***"Çamçyan di pirtûka xwe ya "Dîroka Ermenîstanê" da (berga I, beşê 10-an, rûpel 100) hemû nûnerên (walî) padişahê medan ên herêman bi rêzê nav dike, ji Arbûkês heya Dîovkês, anegorî dîroknûsên yewnanî, yên wek Hêrodotos, Dîodoros, Alîkar û yên dinê, dibêje, ku yên med (ango, kurdên kevnar) beş bi beş her komek li dora torinên xwe berev bûne û tam ji hev cuda jîyane..."*** (*X. Abovyan, Berevoka berheman a tam, bi heyşt bergan, berga heyştan, Yêrêvan – 1958, rû. 284, bi zimanê ermenî* //Խ. Աբովյան, Երկերի լիակատար ժողովածու, ութ հատորով, ութերորդ հատոր, Երևան – 1958, էջ 284).

**Lê tiştê herî balkêş ew e, ku, her çiqas, Quruşê Gewre (lawê farsê vassal, nevîyê Îştîvêgû/Astîagês ê padişahê Medyayê), bi rêya derbeya hindurîn bi xayîntî kalkê xwe ji ser text avîtye û desthilat hildaye destê xwe, û, piştî wê farsan li ser bingeha împêratorîya Medyayê dewleta xwe avakirine, û, bi wî awahî, ew dê-fakto bûne mîratxur û dûmahîya dewleta Medyayê, lêbelê ermenîyan ên *fars* bi tu awahî wek *med* nirxandine, lê ji bo wan peyvên *med* û *kurd* têgehên yekwate bûne.**

Ango çi dertê holê, ji demên kevnar û vir va, ji bo ermenîyan hemû kurd (yên êzdî, ne êzd, ferq nake!), peyhatîyên medan ên rastedêr bûne, ermenîyan, dema gotine med, kurd têgihîştine, û dema gotine kurd, med têgihîştine. Ji bo ermenîyan kurd û med yek netew bûye!..

**Amida Kurd:** Mamoste, biborîne, li vir dû pirsên me hene: ya yeken, ermenîyan ji bo çi ewqas di debarê kurdan de nivîsîne? Ya duyem, pey ewqas daneyên dîrokî û agahîyên pêbawer re êzdîyên Ermenîstanê çima rastîya xwe tê nagihîjin?

**Ezîz ê Cewo:** Ji bo ku bersîva pirsa we ya yekem bidin, divê em serî li dîroka kevnar bidin. Weha, ji dîrokê tê zanîn, ku di dema xwe da "Padişahên Ûrartûyê sala 676-an a berî bûyîna Îsa bi alîkarîya hêz û komên çekdar ên bi kirê yên skyût (îskît/sît) û kîmmêrîyan dewleta Frîgîyayê ji hev belav dikin".(Êntsîklopêdîya mezin a sovêtî, weşana sêyem, berga 27, Moskova, 1977, rûpel 72 – bi zimanê rûsî//Большая советская энциклопедия, третье издание, 27 т., М., 1977, стр. 72)

Û, wek ku tê xuyan, ev jî dibe sedem, ku ermenî neçar dimînin, cî û warên xwe biterikînin. Lê heya ew hê li Frîgîyayê bûne, an jî ji bo peydakirina cî û warekî nû li ser rêyan bûne, dewleta Ûrartûyê êdî ji hêla artêşa Medyayê va tê rûxandin, hemû ax, û aqarên wê digihîjin Împêratorîya Medyayê, û Ûrartû dibe parçeyekî vê dewleta gewre. Û her tenê paşê, piştî wê, ku ermenîyên penaber digihîjin wan deveran, Ûvaxişatrayê (Kîaksar) padişahê Medyayê beşekî erdên Ûrartûyê, yê ku wî dagerkiribûne, dide ermenîyan, ji bo ku ew di wan deveran da bi cîh û war bibin! Û, wek ku tê xuyan, beşê Ûrartû yê kafkasî didine penaberên ermenî – ji ber ku: berê pêşin, li wir kêm mirovên niştecî hebûne û, ya duyem jî, ji hêla dewlemendîyên xwezayî va ew ne ewqas kêrhatî bûye, û ji bilî van, rêvebirina wê ne ewqasî hêsan bûye, ji ber ku hingê erd û aqarên Medîyayê pir berfireh bûne, û wana pêra negîhandîye, ku bi wan erdên ne ewqas bi kêr û berhemdar va mijûl bibin...

Bi vî awahî, ermenî ji hêla bakûr va dibin cînarên medan.

Û piştî demekê, wek ku bavê dîroka ermenîyan Movsês Xorênatsî dinivîse, med torinê ermenî yê bi navê Parûyr tacîdar dikin û bi wî awahî ji wan ra dewletê dadimezirînin (bi hûrbînî: *Movsês Xorênatsî*, Dîroka Ermenîstanê, Yêrêvan, 1991, rûpelên 123–131 – bi zimanê ermenî// *Մովսես Խորենացի*, Հայոց պատմություն, Երևան, 1991, էջ 123–131). Weha, evê bûyerê ezdazanê ermenî S, V. Têr-Manvêlyan çawa şirove dike: "Û, weha, bi pêkanîna tacîdarkirina Parûyr Ermenîstan ne tenê ji maldarîya bindest (vasal) werguhêrî desthilatdarîya padişahtîya xweser dibe, lê, her weha, pêwendîyên wê yên siyasî-çandî bi dewletên cînar ra çê dibin, wek yên di navbera me – ermenîyan û medên ji binemala Vîştasp da, yên ku yek ji dewletên hêztirîn ên wê demê bûne. Û şaxê wanî herî nêzîk jî kurmancên êzdî yên îroyîn in". (*Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan*, "Kurmanjên yêzîdî", Axaltsxa, 1910, rûpelên 3 – 4 – bi zimanê ermenî //*Սիոն Վարդապետ Տէր-Մանուէլեան*, «Եզիդի կուրմանճ», Ախալցխա, 1910, էջ 3 – 4). – Di vê derbarê da di gotarên min ên: "Lê k'a, êdî r'astî li k'u ma?.." (https://www.amidakurd.net/ku/tekst/lê _k_a_êdî_r_astî_li_k_u_ma ) û "Dîlêma dîrokî, an îdêa fîks?" (https://amidakurd.net/ku/ tekst/dîlêma_dîrokî_an_îdêya_fîk_s ) da bi hûrbînî tê vegotin.

A, eger em van agahîyan tomar bikin, dê derê holê, ku ermenîyan med û kurd wek yek netew zanibûne... Û ermenîyan jî, ne ku ji dûrva di derbarê wan da bihîstine, lê ew ji nêzîk va nas kirine... Ermenî nîveka sedsala VII a berî bûyîna Îsa ji cî warên

xwe penaber bûne, hatine ber sînorên Medyaya împêraatorîya gewre ya wê demê, medan penaberên wan bi cî û war kirine, li wan xwedî derketine, piştra jî torinekî wan tacîdar kirine û bi wî awahî ser parçeyekî xaka xwe ji wan ra dewlet avakirine... Û, eger li ser van agahîyan da wisa jî gotinê Strabon (derdorê salên 64/63 ên berî bûyîna Îsa — derdorê salên 23/24 ên piştî bûyîna Îsa) zêde bikin, dê bersîva pirsa we bi zelalî derê holê. Strabon dibêje: "... Ên med, wek ku dibêjin, bapîrên kevneşopîyên ermenîyan û hê berî van jî yên persan bûne..." (*Strabon*, Erdnîgarî, pirtûka XI, bi zimanê rûsî, Moskova, 1964, rû. 525 // *Страбон*, География, XI книга, Москва, 1964, стр. 525) ...

Li vira – têbînîyeke biçûk: wek ku tê xuyan, bi gotina *"kevneşopî"* mabesta Starbon *çand* bûye, bi wateya vê peyvê ya freh va...

Naha jî em bên ser pirsa we ya duyem! Sedema yekem, ku êzdîyên Ermenîstanê rastîya xwe tê nagihîjin, nexwendîtîya olî ya di nav wan da ye – bi giştî. Min di wê derbarê da êdî gotye. Ya dinê, ew encama karê qewal–mîsîonêrên hemdemî yên der û hindur e, ên ku di xizmeta bi êzîdî-sofî-îslamîkirina êzdîtîyê da pir bi çalak tevdigerin... Ji xwe ji bo vê ew erebên êzîdî-sofî-îslamî, yên ku zarokên wan heya îro jî di Başîka û Bahzan da bi erebîya xwe ya Şamê diaxivin û yên ku ji hêla zimên va di nav civaka êzdîyan da întêgre bûne (hatine bişavtin), bi berekê va di sazîyên erka olî da li ser asta here bilind cîyê xwe girtine û ji hindurva êzdîtî "întêgreyî" sofîtîya xwe ya îslamî kirine...

**Amida Kurd:** Û li vira jî, pirsa me ya dawîyê:

– Di vê rewşê da ji bo êzdîyan çi rê hene?

**Ezîz ê Cewo:** Min berê jî gotye – perwerde, perwerde û dîsa perwerde! Û li vira jî, dibe ku hinek bipirsin – ma kîyê vê perwerdeyê pêk bîne? – Helbet bi vê pirsê mabesta wan jî dê oldar bin. Lêbelê, ew dem, dema oldarên zane û şaraze hebûn, yên ku bingehên dua-dirozge, ferz û dogmên êzdîtîya resen bi zimanê xwe – kurdîya resen dizanibûn, êdî bûye dîrok. Piranîya oldarên îro di bin bandora bîrûbawerîyên *êzîdîtîya sofî-îslamî* da û ji bo wê hatine amadekirin.




Lê divê neyê jibîrkirin, yên wek buhuştîyê kekê Xelo naha dîsa di nav gel da mane, divê mirov li wan bigere, wan bibîne. Her çiqas, ew tiştên ku bihştîyê kekê Xelo li dû xwe hiştye jî ji bo dîtina rastîya êzdîtîyê bingeheke bêhempa û nebînayî ye... Ya dinê jî, ewqas zargotina me hatye berevkirin û weşandin! Divê mirov di nav wê da jî bingehên êzdîtîya resen û rastîya wê bigere. A, evê jî oldarê nekin, û, heya, eger ew bixwazin jî, bikin, ew karekî dijwar e, ewê nikaribin tenê bi wî karî rabin. Û li vira jî divê zanîyar û rewşenbîrên kurdên êzdî û yên kurd bi giştî di vê pirsê da hewl bidin – ma ne, ol ne tenê û ne ewqas a oldaran e, çiqas ya gel e, oldar xizmetkarên vî karî ne, lê nûnerên gel (rewşenbîr, dilxazên çand û bawerîya pêşîyan!) divê di vî warî da bi erka xwe a netewî rabin...

**Amida Kurd:** Spas, mamoste, ji bo bersîv û şiroveyên te yên hêja û kêrhatî... Em di wê bawerîyê de ne, ku xwendevanên me wê ji xwere agahî û zanîyarîyên pêwîst ji vê hevpeyvînê derînin, û, eger pirs û dîtinên wan ên cuda çê bibin, ewê ji me re binivîsin!

**Ezîz ê Cewo:** Spas ji bo we, ku we ewqas pirsên balkêş amade kiribûn, û

dîtinên we yên cihêreng jî bûn sedem, ku govtûgoya me dewlemendtir û balkêştir bibe...

Emê benda pirs, nêrîn û pêşnîyarên xwendevanên hêja bin...

Slav û rêz!

---

**Ev hevpeyvîn a bi lêgerîner, nivîskar û rojnamegerê kurd mamosta Ezîz ê Cewo re nivîskar, rojnameger û rêvebirê malpera Amida Kurd Mahabad Felat pêk anye, ewî jî hema ew ji bo weşanê amade kirye û dîtina xwe li ser vê mijarê şêwazdar kirye.**

**Mahabad Felat:** Bi vî awahî, xwendevanên hêja, me hevpeyvîna xwe gîhande dawîyê.

Di vê govtûgoya bi mamoste Ezîz ê Cewo re me rewşa ola gelê kurd a kevnar – êzdîtîyê nirxand, em di derbarê wan pirsgirêkan de axivîn, ên ku li ser rêya yekîtîya vê civaka netewî-ayînî ya kurdên êzdî dibin kelem.

Di vê pêvajoyê de gelek terefên ne dîyar ên vê pirsgirêkê derketin ronahîyê, hatin nirxandin, û mamoste Ezîz ê Cewo bi znanistî bersîva wan pirsan da, yên ku tavetîyê nadin hem pisporên cuda, hem jî gelek nûnerên civaka kurdî bi giştî.

Her çiqas mamoste bi bingehîn pirsên me bersivandin, lê, ji ber ku pirsgirêkên heyî di navbera çend dehsalan da berv nebûne, ewana encama pêvajoyeke dîrokî ya demdirêj in, ya ku bi sedsalan domyaye, lewra jî, ji bo ku bersîva dawîn ji bo wan pirsan, ên ku rû didin, bibînin, pêwîst e, ku şaxên cuda yên civakê û pisporên pîşeyên cuda bi berfirehî beşdarî vê pêvajoyê bibin. Tenê bi beşdarbûna we ya aktîv, xwendevanên hêja, a di nirxandina vê pirsgirêkê da, dê ji me re li hev bê, ku bersîvên obyêktîv û heşmendî ji bo gelek pirsgirêkên bi êş ên di ser hev de berevbûyî bibînin.

Lewra jî îro armanca ku li pêşîya me ye, ev e: bersîveke heşmendî ji bo evê pirsê bibînin; “Ew kî ne, yên ku bi zanebûn dixwazin, êzdîtîyê –vê ola kevnar a resen a gelê kurd, tune bikin? Ji bo vê armanca xwe ew çi rê û rêbazan bikar tînin?”

Û, ji bo wê jî, her wê demê mirov dikare hesab bike, ku di pirsa lêgerîna bersîvên heyî de ew li ser rêya rast e, eger bikaribe têbigihêje, ku di êzdîtîya resen de bingehên resenîya netewî, ruh û rewanê netewî û vîna natewî yên gelê kurd veşartî ne. Ango di bingeha wê de kodên gênêtîk ên gelê kurd tomarkirî ne. Û lewra jî sedema sereke, ku hinek hêz û derdor hewl didin, bingehên vê ola resen û nebînayî lêpovajî bikin, rastîya wê reş bikin, gav bi gav wê berbi mirinê va bibin û heya dawîyê tune bikin jî, divê mirov hema di nava vê govekê da binirxîne.

Lê, dibe, ji bilî van hemûyan sedemên dinê yên bêhtir kûr û girantir jî hene?

Ev pirsana girîng in û pêdivîya xwe bi bersîvên bi zanistî misoger û bi felsefî watedar hene, lewra ku, di bersîvên van pirsan da rastîya dîrokî ya pêvejoya here kêm a 3500 salan veşartî ye. Û, bi dîtina min, wisa jî hinek olên kevneşopî gelek tişt ji êzdîtîyê wergirtine.

Di bingeha efsane, çîrok û bawerîyên wan da gelek şopên bingehên felsefeya jîyanî û efsaneyên wê ola kevnar a gelê kurd tên xuyan. Bi gotineke dinê, di bingeha jiyana ruhî- rewanî û civakî ya nûnerên olên kevneşopî da şopên bawerîyên kevnar ên êzdîtîyê tên xuyan. Û ev hemû pêk hatye û şêwazdar bûye û bi demê ra, di nava hezarê salan da di wê da hinek guhartin pêk hatine. Û lewra jî dîyarkirina rastîya di derbarê wan bingehan da timê netavetî daye nûnerên bijarteya (êlît) olî ya

desthilatdar, yên ku li ser asta herêmî û cîhanî xwedî desthilat in. Hebûna ola êzdî ya resen û dîyarkirina rastîya di derbarê wê da ji bo bijarteya (êlît) olî ya xwedî desthilat bi rîskekê va girêdayî bûye, lewra ku di civakê da pergala rêvebirîyê di destê wan da bûye. Lewra jî, hê berî peydabûna îslamê hewlên lêpovajîkirina rastîya vê ola kevnar hatine dayîn, ji bo ku ewê bi xwe ji xwe dûr bixin û tune bikin. Evan hewlana bi demê ra gihîştine asta here bilind, û lewra jî di derbarê 73 fermanên êzdîyan da tê gotin. Lê fermana here gewre tunekirina bingehên exlaqî û ruhî-rewanî yên vê ola resen e. Helbet, bê guman, di vê pêvajoyê da divê mirov rola rêformên bi navê Şêx Adîyê bên Mûsafir ve girêdayî ji ber çav neavêje. Û îro di vî warî da hewlên çalak ên hinek derdoran û qewalên (mîssîonêr) cuda didomin. Û, ji bo ku pêşîya vê pêvajoyê bê girtin, ne ku tenê yekîtî û hevgirtina gelê kurd pêwîst dike, lê wisa jî pêwîst e, ku hemû kurd amade bin, ku êzdîtîya resen biparêzin, lewra ku armanca dawîyê ya van planan lêpovajîkirin, herifandin û tunekirina bingehên ruh û rewana netewî û vîna gelê kurd e.

Eva, helbet, her terefekî pirsê ye. Û divê hê rastîya wan bawerîyan û efsaneyan bê ravekirin, ên ku ji bo peydabûna olên kevneşopî bûne bingeh – wan olan, ên ku di encamê da di nav civakê da bûne xwedî gotin û desthilat.

Helbet, piştî zelalkirina vê rastîyê, di olên kevneşopî da dê gelek dîyarde û dîtinên di derbarê pêşveçûnên pêvajoyên dîrokî bi awayekî nû bên nirxandin. Wê demê jî, dibe ku, pêwîstî bi jinûva nirxandin û watedarkirina gelek prênsîp û dîyardeyên pêşkevtinên hevbeş ên olan û sazîyên dewletan derê holê, lewra ku ewana di navbera olan û sazîyên dewletê da bûne mîna tiştekî garantîya rêvebirina hevbeş a civakê...

Weha, ya ku min di dawîyê da dixwast bigota jî, ev bû!

Spas ji bo We, xwendevanên hêja, ku Hûn di vê pêvajoya govtûgoya me da bi me ra bûne û bi pirs û ramaên xwe yên balkêş va We piştgirî daye me!

Em hêvîdar in, ku Hûnê ji vir û pêva jî bi pirs, nirxandin û ramanên xwe yên nû piştgirîyê bidin projeyên me.

Lewra jî ez xatirê xwe ji we naxwazim, û her dibêjim – heya hevdîtineke dinê!

Bi rêzgirtin û daxwezîyên xwe yên qenc va – Mahabad Felat.

**Stokholm/Swêd – Pyatîgorsk/Rûsîya**
**29. 06. 2019**

# Û – PIŞTÎ GOTÛBÊJAN…

## Xwendevan dibêjin:
## "BELÊ, BI NIRXANDIN Û RAVEKIRINA PIRSGIRÊKAN GELEK TIŞT RONÎ BÛYE, LÊBELÊ…"

**(Li şûna paşgotina hevpeyvîna *Amida Kurd*ê)**

Wek ku tê zanîn, xwendevanên, hêja, sala buhurî (a 2019an) malpera *Amida Kurd*ê bi min ra li ser mijara "Pirsgirêkên li ser rêya avakirina yekîtîya êzdîyan" hevpeyvînek pêk anîbû.

Helbet. di derbarê wan bûyeran da, ên ku berî wê pêk hatibûn û bibûn sedem ji bo pêkanîna govtûgoyeke weha, hema di destpêkê da hatibûn gotin. Her weha, armanc û mabesta pêkanîna vê hevpeyvînê jî hatibûn destnîşankirin, û piştra ew di pêvajoyê da gav bi gav hatibûn nûkirin û pêşxistin...



Dema me dest bi wê hevpeyvînê kir, mabest ew bû, ku ewê bi xelekekê pêk bê, lê dema em hinekî di pirsgirkan da kur bûn, pirsên nû rû dan, û bi wan pirsan ra wisa jî raman û dîtinên nû derketin holê... Û, lewra jî, ew govtûgoya me domya û her bi xeleka şeşan ser hev da hat...

Ev hevpeyvîn wisa jî, bi daxweza xwendevanên me yên komarên Sovêta berê, bi zimanê rûsî hate weşandin, û, her çiqas çû, goveka baldarîya berbi wê berfirehtir bû.

Wan xwendevanan, ên ku weşana vê hevpeyvînê dişopan-din, wek ku hate gotin, ji me ra pirs, nêrîn û dîtinên xwe dişandin. Û ev pêvajo piştî weşana hevpeyvînê jî didome, hê jî pirs, dîtin û pêşnîyarên xwendevanan tên ber destê me...

Berî wê, ku dest bi nirxandinaa name û gotûbêjên bêhtir balkêş bikim, ezê li vir agahîyên xwendevanên me di wê derbarê da bînim, ku hinek jêderk (lînk), ên ku min di beşên cuda yên hevpeyvînê da anîbûne, venabin, lewra jî ew nikarin wan vîdêoyan bibînin. Lê hinek xwendevan jî di karê tevgerkirina delk û dolaban li dijî êzdîyan û êzdîtîyê da destê hêzên derva û mîssîonêr-qewalên berdestîyên wan dibînin, û bang dikin: "Ca binihêrin, ka ev hêzana çiqas hişyar in û çawa bi aktivî tevdigerin!"

Mînak, hinek xwendevan dinivîsin, ku hinek jêderk-lînkên strana "...Şerfedîn e, j'dînê me ye" venabin, lê jêderkên şêwazê stranê yê lêpovajîkirî yê "...Şerfedîn e, dînê me ye" bi hêsane vedibin, û ew di vê da hewlên hinek qewalên îslamê yên di

nava êzdîyan da dibîin. Ew dibêjin, ku ew hemû bi wê mabestê tê kirin, ku xwendevan rastîya starnê nizanibin.

Mirov di vê derbarê da çi dikare bibêje?

Ya yekem, divê bê zanîn, ku ne hemû matêrîal in, ên ku carekê di tora întêrnêtê da hatinr belavkirin, bê şop winda dibin. Her çi jî bibe, yek e, ewana di cîyekî da, di nava govekeke tora medyayê da tên parastin, ewqasî divê mirov di întêrnêtê da ne ku tenê bi jêderk-lînkan, lê wisa jî bi navên wan lê bigere...

Û, eger mirov di Google da stranê bi navê "Şerfedîn e, Şerfedîn!" an jê: "Şerfedîn e!" bigere, dê varîantên cuda yên starnê, yên bi pêkanîna komên cuda derên – yên lêpovajî, yan ne ewqasî jî!

Lêbelê, bi vê wateya pirsgirêkê nayê guhartin.

Heman stranê «Koma zerdeştê kal» sala 2013an bi gotinên «Şerfedîn e, j'dînê me ye!» bi deng dinivîse, lê piştî du salan, 2015an heman komê êdî heman stran bi gotinên: «Şerfedîn e, dînê me ye!» weçandye. Hûnê bi xwe di vê da bawer bibin, eger di lêgerka Youtube da gotinên «Koma Zerdeştê kal – Şerfedîn e!»,binivîsin, û wê li ser êkrana kompyûtêrê herdu cudaşêwazên starnê jî li ber we vebin.

Û hûnê bi xwe rastîyê bibînin!…

**Û ya duyem.** Divê bê gotin, ku ne ku tenê stran ji *Youtub*-ê hatibûn deravîtin, lê wisa jî vîdêopeyamek, a ku wisa jî pêwendîya xwe bi mijara êzdîtîyê ra heye. Ew peyama mirovekî bi navê *Yusuf Berhudar* a bi sernavê **"Yezidi kine?"** bû. Lêbelê dema weşana xeleka V a hevpeyvîna me ya bi zimanê rûsî, me ew di malpereke dinê da jî dît. Lê, ji bilî vê, mirov hem jî dikare wê peyamê di Yandexê an jî di Googlê da bibîne, eger di lêgerkên wan da: peyvên *"Yusuf Berhudar* – **"Yezidi kine?"** binivîse.

Bila xwendevanên hêja jinûva bi baldarî li wan binihêrin, wan di nava govekekê da binirxînin û watedar bikin, lê ezê li vira gotineke kevn bînim bîra wan kesan, ên ku wan vîdêoyan derdavêjin, ji bo ku şopa kirên xwe ên reş veşêrin. Gotinek heye, tê gotin:

"Ya ku bi pênûsê hatye nivîsîn, bi bivir nayê birîn!"

Naha em bên ser hnek nirxandinên xwendevanan, ên ku, bi dîtina min, ji hêla têgihîştina vê pirsgirêkê ya giştî va hêjayî baldarîyê ne.

Hinek xwendevan jî, piştî xwendina vê hevpeyvînê, ji êşa dil, bi axîn û dilekî kovan bêhîvîbûna xwe tînin zimên, û, eger mirov wan dîtin û nêrînên wan bigihîne hev, wê derê holê, ya ku tirsê dike dilê wan xwendevanan, ew e, ku êzdîtîya resen – ola gelê kurd a kevnar, bêşop wimda dibe! Heya hinek dibêjin, ku ew êdî winda jî bûye... Û dixwazin gunehkarên wê malwêranîyê yek bi yek nav bikin..., û wisa jî – hinek tiştên dinê yên balkêş!

Helbet, heya astekê mirov dikare vê metirsî û hêwarzeya rewanî ya xwendevanan tê bigihîje, lêbelê, eger xwendevan hestên xwe hinekî daynin hêlekê û bi serê sar hemû gotinên me binirxînin, dê têbigihîjin, ku hemû tişt bê şop winda nebûye, ku di nava gelê kurd da bingehên êzdîtîyê hatine parastin, lewra ku, wek ku xudanê vê hevpeyvînê rêzdar Mahabad Felat di dawîya vê hevpeyvînê da dinivîse: "... di êzdîtîya resen de bingehên resenîya netewî, ruh û rewanê netewî û vîna natewî yên gelê kurd veşartîne. Ango di wê de kodên gênêtîk ên gelê kurd veşartî ne..."

Û, ji bo ku ev hemû bê têgihîştin îro li ser astên cuda ji hêla kesên cuda va lêgerîn pêk tên. Hinek ji wan hewl didin, ku êzdîtîyê bi sofîtîya îslamê – *êzîdîtîyê* şirove bikin û vê ola gelê kurd di nav wî şaxê îslamê da bibişêvin û winda bikin, lê henk jî hewl didin, bi zanistî rastîya vê ola kevnar a nebînayî ravebikin û derxin

ronahîyê... Di vî warî da rêzegotarên xudanê van rêzan li holê ne, pirtûkên “Êzdîtî: divê mirov rastîya wê li ku bigere”, ya ku sala 2017an ji hêla weşanên J&J va hatye weşandin, û ya “Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka “windabûyî”...)”, ya ku ji hêla weşanên “Aryen” va hatye weşandin û vê dawîyê jî – ev hevpeyvîna malpera “Amida Kurd” a bi min ra. Di vê hevpeyvînê da em li bersîva pirsên bi êş, ên jimêjva gihîştî geryane, me hewl daye, bingehên wan derxin ronahîyê, û ew hemû me bi zimanekî gelêrî yê sade şirove kirine...

Belê, bi rastî jî ev hevpeyvîn, a ku malperê amade kiribû û pêk anîbû, îro bûye tomerîya bersîvên piranîya wan pirsan, ên ku netavetîyê didin xwendevanên me û hemû dilêş û dilsozên ruh û rewan û ramana netewî...

Hinek xwendevanên me jî bi dilêşî dinivîsin, ku, rast e, destê hinekên derva di karê reşkirin û tunekirina êzdîtîyê da heye, lê di nava civaka êzdîyan da jî (bi taybet, di nava êzdîyên Sovêta berê da) hinek kes hene, yên ku ji “yên derva” jî tehlûketir in,. Ku ewana xwe piştovan û parazvanên êzdîtîyê didin xuyan, lê bi kar û helwesta xwe va ji mîssîonêr-qewalên îslamê jî zêdetir mala êzdîtîyê wêran dikin...

Mînak, yek ji wan – Sûrênê Hemîd dinivîse: “... Ev îdî 29 sal e, ez ji Ermenîstanê derbazî Ûrisêtê bûme. Li vira jî êzdîyêd me hev dipirsin, diçin şîn û şayîyêd hev. Lê sed heyf, ew nexweşîya hê li Ermenîstanê ketibû nava wan, vira jî heye. Ew nexweşîya yêhovatîyê ye! Ewêd çûne nava wê sêktayê (terîqet), xwe xwedênas nav dikin... Bi rastî, min jî berê bi çavekî ne qenc li wan dinihêrî, min ew xayîn û xwefiroş hesab dikirin... Helbet, ez zanim, nava wan da yên usa jî hene, lê ne hemû usanin. Piranîya wana ji nezanebûna dînê xwe çûne. Eger terêqên me (şêx, pîr) ew hînkiribûna, çavê wan li ser rastîya dînê wan vekiribûna, û wana dînê xwe zanibûna, wê neçûna... Binihêrin, xelq êdî difire ser hîvê, di dêr û mizgevtên xelqê da êdî kompyptêr û întêrnêtê didin xebatê, lê terêqên me her tenê çend gotinêd ereban êd quranê ezbere kirine, û xêncî wê tiştekî nabêjin... Ew xaxa jî li wan gotina tiştekî fehm nakin... Lema jî min hê berê jî fehm dikir, wekî ewêd ji êzdîtîyê diçin ser dînêd dinê, ji vê tê, ji vê nezanibûna terêqên me. Û dema min intêrvyûya (hevpeyvîn) We xand çavê min ser rastîya vî halê me vebû... Rastî jî usane, gerekê meriv êzdîtîyê hîn be û emir da êzdîtîyê bike. Û bona vê, bi fehmkirina min, gerekê sêrî da şêx û pîrên me dînê me zanibin, bona wê jî gerek ji bo wan kursên hînbûna dînê êzdî vekin...”

Bi rastî jî, wek ku ji vê nameyê tê xuyan, di nava gelê me da yên ku pirsgirêkê tê digihîjin, hene. Û daxwezîyên rêzdar Sûrên jî rast in, lêbelê, bi dîtina min, ji bo ew daxwezî pêk bên, divê di sêrî da ev nezanî-nexwendîtîya olî ya di nav gel da desthilatdar e, bê tunekirin. Min berê jî gotibû, ku ol ne tenê ya oldaran e, ew ya hemû bawermendan e, lê oldar xizmetkarên olan in... Û yên ku divê li ola xwe xwedî derkevin jî, divê di sêrî da bawermend bin – bawermendên zaneyên ola xwe. Lewra jî, eger em dixwazin, ku ew ol winda nebe, divê ola xwe bi destê nezanan va bernedin. Ji bo wê jî, divê gelê me bi girseyî bigihîje têgihîştina giştî ya ola xwe. Eger ev pêk bê, wê demê mirovê bikaribe li rê û rêbazên guhartina vê rewşa heyî bigere, wê demê yên ku bixwazin bi karê konkrêt ji çareserîya vê pirsgirêkê ra bibin alîkar, wê bi xwe derên holê ...

Û – bûyereke dinê ya zêndî jî!

Berî çend mehan merivek çûbû ber dilovanîya Xwedê, û ez jî çûbûm hewarîyê. Piştî nanê xêrê, camêrekî navsere nêzîkî min bû, xwe da nasîn, got ku navê wî Hesen e, Hesenê Sebrî, û got, ku dixwaze, ku em xwe ji girseyê bidin alîyekî û cuda li ser hinek pirsgirêkên gelê me biaxivin. Min got, ku naha, li vira, di vê rewşê da nabe, ku

em ji gel cuda bibin ... Em bi hev ra qayîl bûn, ku piştî du rojan di bajêr da rastî hev bên.

Piştî du rojan hevdîtina me pêk hat, ewî derdê xwe bi hûrbînî anî zimên.

Bi gotina wî, lawekî birayê wî di bajarê cînar da dijî. Ku piştî mirina birê xwe ew çend salan neçûbûye wî bajarî. Û demekê jî, dema diçe wî bajarî, birazîyê xwe dibîne. Birazî dibêjê, ku êdî 4-5 sal in, ku ew ji mala bavê xwe cihê bûye, û dixwaze apê wî here mêvanîya wî. Hesen diçe mala birazîyê xwe, dema birazîyê wî bi pîreka xwe va ji bo mêvndarîyê li xwe duxurdilin, ew bi baldarî li fotowêneyên li ser dîwarên odeya wan dinihêre...

– Tu dizanî, – ewî bi çavên tuje hêsir, bi zorekê gotinên xwe anîn zimên, – ez bi xwe li Ermenîstanê di gundekî ermenîyan da mezin bûme, li wira heya carna em bi hevalên xwe yên ermenî ra diçûne dêrê jî. Li wira me mûm jî vêdixistin... Û wê demê me dizanibû, ku ermenî jî dicin ber ocax û zyaretên me... Em diçûn ser şîn û şayîyên hev, lê timê jî me dizanibûm, ku em êzdî ne, lê ew – xaçparêz. Û wana jî ev yeka baş zanibûn! Me tu carê nexastye bikevin kirasê wan û êzdîtîya xwe parastye...

Lê, di mala birazîyê xwe da, ez bala xwe didimê, hemû wêneyên zarokên wî jî bi sembolên xrîstînîyê xemilandîne (bi wêneyên Îsa û Meyrema dêya wî, xaç, êncîl!)... Helbet, tiştekî min miqabilî dînê xaçparêzan nîne, bila dînê wan li wan pîroz be, yê me – li me! We qet dîtye, ku xaçparêz an misulman sembolên dînên dinê di malên xwe da daynin?... Û min ji birazîyê xwe ra hest û nêrînên xwe û tirsa dilê xwe bi zimanekî nerm anîn zimên... Û, tu dizanî, ewî çi bersv da min?

“Çi dixwazî bibêje, – ewî got, – ew pirs li te neketye, tu karê te wê pirsê tune, ka, were, em wê pirsê dadin!” – Piştî vê ez bi dilekî kul vegeryam. Tu zanî, dilê min zêde bona çi dêşe? – Ji bona durûtî û bêexlaqîya merivên mîna vî birazîyê min. Berî ku ez herim mala wî, me li ser şînekê hev dît, ewî li ser sivra xêrê ji bo bîranîna yê rehmetî xeberda, û her te bidîta, ewî çawa gotinên qube û qutam di derbarê êzdîtîyê da digot, navê zîyaret, ocax û mêr-milyaketên me bîr tanîn! Çawa dibe? Meriv jî ewqas durû û bênamûs dibe? Naha pirsa min: “Yên ku rê li pşîya ewên xalifî vedikin, ku ew herin-bibin yêhovayî, gelo evên durû û bêexlaq nînin? Gelo ewên ku çûne bûne yêhovayî (bi “alîkarîya” evên durû!) ji van qenctir nînin?..

Bi rastî jî dilê mêriv dêşe! Bi fikra min, eger ev, ên wek vî birazîyê min, durû nînbûna û rastîya ola me di destpêkê da ji ewên xalifî ra hatibûya şirocvekirin, ewana hemû paqijî û pîrozîya ola xwe bizanibûna, dibe ku ew ji dînê xwe qut nebûna...

Û pirseke dinê jî! Binihêrin ewên durû, her tiştî dikin, ku evên me yên xalifî heya dawîyê ji me dûr bikevin. Van demên dawîyê hinek jî xwe didin rex hev û di nav civakê da dibêjin, ku divê nehêlin, ewên çûne nava terîqeta yêhovayê, bên nava şîn û şayîyên me! Gelo ev ne dijminatî ye? Ewana bi xwe her tişt kirine, ku ew ji êzdîtîyê dûr bikevin, lê dema ew naxwazin heya dawîyê ji qewmên xwe qut bibin, dema şîn û şayîyên wan, li wan diprsin, naha jî ew her tiştî dikin, ku wan heya dawîyê ji me dûr bixin. Çima? Çima, yên misulman, xaçparêz û ên dinê dikarin bên ser şîn û şayîyên êzdîyan, çima evana nikarin? Çima ew tayê herî zirav, ê ku di navbera me û wan da maye, wê jî qut dikin? Gelo dijmin kîne? Gelo ev ne planeke helandin û tunekirina êzdîyan e?”–Hesen bi dilekî kul li pey hev ev pirsên xwe rêz kirin û dema xatirxwestinê got:

– Ya ku gerekê tu û yên mîna te baş bala xwe bidinê û serê xwe ser biêşînin jî, hema ev e! Demaxatirê te! – Got û çû...

Demeke dirêj ez di bin bandora vê hevdîtinê da bûm, dema min nameyek ji

xwendevanekî me stand. Û evê nameyê, qey bibêjî, bi wateyî ev hevdîtin tomar dikir.

Borîsê Elî (Barî) dinivîse: “Ez naha li Ûrisêtê dimînim. Berê em li Ermenîstana Sovêtê diman. Hilbet, wê demê hinek problêmên me hebûn, lê hal ne weke naha bû. Xwendina min a navîn a pêşekzanîyê heye. Dema xwendinê min nava komên lîtêratûrê da cîyê digirt. Me şiyêrêd şayîrêd ermenî dixandin, ezber dikirin. Min şiyêrêd Parûyr Sêvak pir hizdikirin. Pey ra hê dereng, min nivîsarêd nivîskarên kurdan jî xandin.... Van paşwextîyan min întêrnêtê da berevoka şiyêrêd We ya “Karwanên bêxewîyê” jî dît (ev jî adrêsa wê ye – https://amidakurd.net/ku/tekst/Karwanên_Bêxewiyê ). Şiyêrêd We min xweş hatin, cuda jî, ya “Leglegê heznî” û ya “Dirozga rojê”...

Erê, min çi dxwast bigota, min hevpeyvîna Amida Kurdê xand, û min gelek tişt fehm kir, a ku berê nedihate heşê min jî. Rastî jî, ya ku tînin serê miletê me û dînê me, dilê mêriv dêşîne... Ev lîstikana, yên ku hinek nav me da dilîzin, malxirabîya me hema wê da ye. Gerekê em xwe hindurva paqiş bikin, ji wan, êd ku ji navê êzdîtîyê xeber didin, lê me dikin îslam, êd ku me perçe dikin û dikin xurê guran... Van tiştan hinek ji nezanîya xwe dikin, hinek jî – bi zanebûn... Û, dema min sowbeta we xand, ez li cabekê digeryam – gelo ev hemû ji ku tê? Gerekê meriv çi bike? Min nikaribû cabekê bibînim û xetêd dawîyê yêd şiyêra We ya “Dirozga rojê” hatin bîra min, û min got , ku meriv dikare wek duayekê (an – nifirîyekê!) ji bo wan wê bixwîne, yên ku van tiştan tînin serê miletê me:

Ya Xwedê,
dîsa yeke xêr bikî,
me j‘xax û bendên
giran xweybikî!..
Lê gunehê evên
ev yek hinartî
bi mêzîna lêp
t’ucar nepîvî,
lewra ku lêpî
û mêzîna lêp
t’u hevdu nakin…
Di jîyanê da
lêpî û r’astî
cotgaên nîr in,
ew t’im cot diçin…
…Ya Xwedê,
qet na,
di jîyanê da
tu ji kirên lêp
hinekî dûr bî!...

Min careke dine jî ev helbest xwend, min fehmkir, ku, çiqas jî ew ji bo pirseke dinê hatye nivîsar, lê heya derceekê ji bo vî halê me jî wek duayekê dikare bê xwendin… Lê usa jî min texmîn kir, ku tenê bi dua an nifirîyan nabe, ku gotineke dinê jî li vir lazim e… Û min ew bîra xwe da, nava şiyêrêd min xwendî da dîtin. Ew şiyêra şayîrê ermenî-sovêtî Parûyr Sêvak a “Du’a r’oja t’eze” ye («Նորօրյա աղոթք»). Vê şiyêrê da cîyek heye, ku meriv dikaribû ew jî li vira wek gazîyekê (bang) bixanda, wek şkyatekî li hember wan, ên ku vê malkambaxîyê tîênin serê dînê

me, lê min nikaribû wê t'ercume bikim, ez wê bi ermenî ji We ra dişînim, eger hûn bikaribin wê bikin kurdî, wê gelekî baş be …"

Min jî, ew parçeyê ji helbesta Parûyr Sêvak wergerand kurdî. Weha, çi derket hole:

---

…Hûn pifî hemû mûmên wan bikin,
Find û çirayên wan vêsînin hûn,
Hemû şemdanên wan vemirînin,
Ku … ronahî bê!
Li tu bergehan qurbana wan jî
Hûn qebûl nekin,
Ku ne ya wan e, lê hatye dizîn.
Wê qurbanê jî, ya-k wan soz daye,
Red bikin yekser,
Ku… bawerî b'xwe jî nebe qurbanî –
Bawerîya paqij û nebînayî,
Ya durust-ne vir'!
………………………………….
…Û guhên xwe jî hişkem bigirin
L'ber dirozga wan, a-k dişûlike –
Li hember ewan dua-dirozgan,
Ên ku ew wisa bi hesab pey hev dixulxulînin,
Bi wê ewana xwe naxapînin,
Lê we –
We dixapînin!

(Ji helbesta "Dirozgeya roja nû" a Parûyr Sêvak –
wergera ji ermenî – ya Korda Mad)…

Bi rastî, çi gunehê xwe veşêrim, di destpêkê da ez bi dudilî nêzîkî weşandina van parçeyên helbestan bûm, lê paşê, dema min dubare ew di nav govaka têgihîştina xwe ya vê rewşa heyî da xwendin, ez bi bawer bûm, ku Barîyê rêzdar bi dil ji bo vê pirsgirêkê diêşe û bersîvekê geryaye û xwestye helwest û dîtinên xwe bi van gotinên helbestkî bîne zimên… Û lewra jî min got, ku mafê min nine, ez wan gotinan daneynim, ên ku xudanê nameyê bi xwe dixwaze dayne – "... wek şkyatekî li hember wan, ên ku vê malkambaxîyê tînin serê dînê me!"

– Çira jî na? Ma ne, ev helwesta xwendevanekî ye, ya ku divê bi baldarî bê bihîştin!

Wekî dinê, bi dîtina min, mirov dikare li vir bibêje, ku ev hemû nîşana wê yekê ye, ku hevpeyvînê karibûye xwe bigihîne hest û hizirên rwanî yên hinek xwendevanan, ku ji vir û pêva jî xwendevanên hêja dê li ser vê hevpeyvînê nêrîn û ramanên xwe parvebikin û pevbiguhêrin, govtûgo bikin, lê, dibe ku êdî ew di nava govekek dine da pêk bê…

**Ezîz ê Cewo**
**Pyatîgorsk/Rûsîya**
**28. 02. 2020**

# PÊVEK

Xwendevanên hêja, di rêzehevpeyvînên xwe da me govekek a pirsgirêkên civaka netewî-ayînî ya kurdên êzdî û rêyên watedarkirin û berterfkirina wan pirsgirêkan nirxandin. Bi alîkarîya hevaxêvê xwe birêz Ezîz ê Cewo, di nava çarçoveya derfetên heyî da em li bersîvên wan pirsên bi êş geryan, yên ku êdî ev çend sedsal in, tavetîyê nadin ne ku tenê êzdîyan bi xwe, lê her weha komên pispor û şareza û lêgerînerên serbest jî.

Wê demê me digot, heya eger di vê serdemê da ji me ra li hev jî nehat, ku em bersîvên tam ji bo wan pirsên bi êş bibînin jî, dîsa me karbû di warê lêgerînên evê mijarê da komeke pirsgirêkên sereke bibînin û tomar bikin, û rêyên lêgerînên wan destnîşan bikin.

Û, qey bibêjî, her tenê dima, ku em bendê bimînin, heya ku civaka xwendevanan wan hemûyan watedar bike, û ji wana şiroveyên bêhtir ciddî bistînin. Lêbelê, wek ku di nav gel da tê gotin, şemî ji înîyê zûtir hat. Wek ku tê xuyan, karê reşkirina êzdîtîyê û bişavtina êzdîyan, a ku gelek sedsalan berê hatye destpêkirin, di van rojên me da jî didome.

Di vê derbarê da di gotara hevaxêvê me ya "Nêçîra li dû ruh û rewanê êzdîyan didome!" da tê vegotin, a ku di bin sernivîsa giştî ya "Di cîhan li pişt eyneya xar da!" hatibû weşandin.

Bi dîtina me, eger ev gotar di vê berevoka gotûbêjan da neyê weşindin, hinek tişt dê heya dawîyê nehatibe gotin û kêm bimîne. Bi vê gotarê ev berevok dê bi agahîyên balkêş û nirxandinên zanistî yên hêja û şiroveyên xudanê wê dewlemend bibe: Û ev jî dikare bibe bingeh, ku têgihîştin û watedarkirineke nû ji bo rewşa îroyîn a di nava civaka êzdîyan û derdorê wê da derê holê.

Bi vê gotarê, ya ku em pêşnîyarî bala xwendevanên xwe dikin, dê gelek tiştên balkêş derên ronahîyê, lê ya here sereke, piştî xwendina vê nirxandina zanistî, xwendevanê bikaribin di pirsa rola hêzên derva di alozî û nakokîyên di civaka kurdên êzdî da gelek faktoran tê bigihîjin û ji hev cuda bikin...

**"Amida Kurd"**

**Di cîhana li pişt eyneya xar[1] da!**

## "NÊÇÎR A LI DÛ RUH Û REWANÊ ÊZDÎYAN DIDOME!"

### Ezîz ê Cewo

Îro di qada medya civakî da hinek weşan vekirî propaganda îslamîkirina êzdîyan û êzdîtîyê dimeşînin. Bi biryar karekî bi rêk û pêk û bi armanc tê meşandin, ji bo ku di heşê xwendevanan da bidin rûniştandin, xwedêgiravî, derî gelê kurd û ji

[1] Cîhana li pişt eyneyê va – cîhaaneke çîrokî, xewnerojkî û xiyalî ye, li ku rewşa her tiştî li ser asta derxwezayî ya absurdê ye. Ev têgîna di sedsala XIX da di wêjeya ji bo zarokan da hatye bikaranîn, bi bingehîn jî di berhemên nivîskarê înglîz Liyûs Kêrol (*Lewis Carroll*) da.

wî cuda, wisa jî gelê *êzîdî* heye, xwedêgiravî, heya zimanê *êzîdkî* jî heye.

Û "têorîyeke" weha ne ku tenê dijzanistî ye, lê, her weha, bi xeter e jî. Û xeterîya wê di wê mebestê da ye, ku hewl didin, bi têgîna *"yêzîdî/êzîdî" kurdên êzdî* bidin nasîn û pejirandin, ên ku hîç têkilîyeke xwe jî bi êzîdîyan û êzîdîtîyê ra nînin (bi hûrbînî di vê derbarê da – emê hinekî paşê bibêjin!) …

Û, ji bo ku bigihîjin vê armanca xwe, ew mîssîonêr-qewalên îslamîkirina *êzdîtîyê* dest davêjin lêpovajî û çewtkirina dane û rastîyên dîrokî jî, û heya navekî nû ji ber xwe derdixin, ji bo ku rastîya vê ola gelê kurd a nebînayî ya berî zerdeştîyê bidin jibîrkirin. Û di vî karê xwe da ew digihîjin absûrdeke wisa, ku heya hewl jî didin, bidin bawerkirin, xwedêgiravî peyva *Êzîd* têkilîyên xwe bi navê xwedaya Êgyûpta kevnar *Îzîda // Îsîdayê* ra heye… – Û tu nizanî, bikenî yanê bigirîyî!?

Û bi vî awayî, her carê "peydakarîyên" nû yên dûrî heş û sewdawê mirovê tendurust (ê ne nexweş) davêjin holê.

Bi xwezayî, ji ber ku vekirî di van nivîsan da ne ku armancên zanistî, lê yên siyasî tên xuyan, lewra jî di heman demê da li hember wana hem matmayînek rû dide, hem jî baldarîyeke zêndî li hember vê pirsê hişyar dibe.

Û, ya ku herî zêde mirov matma dike jî, ew e, ku hinek nûser (*author*) bê şerm û fedî dane û rastîyan wisa bi nezanî diguhêrin û lêpovajî dikin, ku heya mirovên dûrî zanebûna pirsê jî matmayî dibin...

Yek ji nivîsên "hesthejîn" (ango, *"sensation"*) ên vî rengî jî eva bi vê sernivîsê bû: "Derket, ku gelê bi gênêtîkî bêhtir nêzîkî *êzîdîyan asorî* ne" (?! – E. C.), ya ku van demên dawîyê (03. 04. 2021) di malpera ***yazidis.info*** da hatibû weşandin.[2]

Û ew armanca bi hewldaneke weha destpê dibe: "Zanîyaran bi lêgerînên zanistî çîroka di derbarê hemlêzimîya (ango, hemnijadîya) *kurdan* û *êzîdîyan* vala derxistine. Derket, ku gelê bi genêtîkî bêhtir nêzîkî *êzîdîyan asorî* ne" (?! – E. C.). – Ango, bi dîtina wan, dertê holê, ku *êzîdî* samî ne, û ne tenê "gelê" hemnijad ê asorîyan in, lê wisa jî yên ereban û cihûyan in?... Ezê li vira pirsa bi rêzimanî tevlihevîya nivîsê bi xwe û sernivîsa wê li hêlekê bihêlim, û bala xwendevanan bikişînim ser wê, ka çawa gav bi gav pêvajoya "mitaledana" wan pêş dikeve û digihîje asta here bilind a absûrdbûna xwe.

Bi xwe binihêr'in, ka di wê nivîsê da çi tê gotin: "... Ew, ku *êzîdî* û *asorî* bi gênêtîkî têra xwe nêzîkî hev in, mirov matma nake, lewra ku evê lêgerînê îzbat kirye, ku yên ku bi gênêtîkî bêhtir nêzîkî niştcîyên Navçemkê (ango, Mêsopotamîyayê) ne, hema *êzîdî* û *asorî* ne, ne ku *kurd* û *ereb*. Ku hema êzîdî û asorî gelên bingehîn ên Îraqê ne (ango, gelên bingehîn ên Navçemkê, Sûmerê û Babilê ne.) ..." – Hema wisa, hildane û "biryarek" a weha ya derzanistî û lêp dane!

Belê, dîmenekî dîroka lêp ê balkêş derdikeve holê!

Li ber çavan e, ku li vira armanc ne ewqasî *êzîdî* ne, çiqas *cîhana kurdî* bi xwe ye. Û ji bo wan girîng e, "îzbat bikin", xwedêgiravî, yeknijadîya *kurdan* û *êzîdîyan* çîrokek a xwenerojkî ye, xwedêgiravî, gelên ku bi gênêtîkî bêhtir nêzîkî niştecîyên Navçemkê hema *êzîdî û asorî* ne… Û, ji bo ku ev "nûpeydeyî" nêzîkî rastîyê bihata xuyan, di dawîya gotarê da ev têbînî danîne: "Çavkanîya fermî: https://www.ncbi.nlm.nih.gov/pmc/articles/ PMC5669434/".

Helbet, piştî gotinên weha ne her xwendevanekê bicêribîne, bi rêya wê jêderkê

[2] http://yazidis.info/ru/news/5167?fbclid=IwAR3ii20poq5Mn6xUq VgRNz2H8pVLsbb_7Z2bbJrdMXRV _cT23koWMRnBFwQ

çavkanîya destnîşankirî veke. Lê, eger bibe, û hinek bicêribînin jî, dema li wira nivîsa bi zimanê înglîzî ya bi tablo (cedvel), dîagram û şêmayên dinê bibînin, dê bibêjin, ku ew jî heman tişt e, ...hema bi înglîzî ye.

Lêbelê, ji bo xatirê rastîyê, ka em binihêrin, gelo bi rastî di (qaşo!) "çavkanîya fermî" da çi hatye weşandin, û di wê da bi rastî çi tê gotin!

Wek ku ji naveroka wê nivîsê tê xuyan, ew tiştekî mina gozarêşa (ango, rapora) lêgerînên zanistî ye, yên ku di warê gênêtîkê da pêk hatine, û di bin sernivîsa "Awirek li ser mozaîka (ango, pirrengîya) geremol a komên êtnîkî yên Navçemkê: gênêologîya ereban, kurdan, sûrîyanîyan, turkmenan û êzîdîyan ên Bakûrê Îraqê".

Û di wê gozarêşa zanistî da armancên wê lêgerînê jî hatine dyarkirin, ew jî ev in: "...Ji bo ku ji çêtirîn têgihîştina bingeha zanistî ya pirrengîya êtnîkî ya Bakûrê Îraqê ra bibin alîkar, di warê gênêologîya pênc komên êtnîkî yên herêmê yên here pirhejmar da analîza hemberhevkirinî hatye pêkanîn..." – Di vê derbarê da tê gotin û bi hinek hûrbînîyên destpêkî va weha tê domandin: "...Bi giştî 500 nimûne ji mirovên tendurist ên 18 salî û ji wan bi tementir, yên ku di nav wan da têkilîyên malbetî nînin, û ji komek a ji wan pênc komên êtnîkî yên bingehîn ên Bakûrê Îraqê ne. Û ew jî ev in: yên ereb ($n$ = 102), yên kurd ($n$ = 104), yên sûrîyanî ($n$ = 86), yên turkmen ($n$ = 102) û yên êzîdî ($n$ = 106)…" – Lêbelê, nûserên nivîsa mijara gotinê ji vê raporê "encamên" weha yên hesthejîn (*sensational*) ên dijzanistî derxistine.

Pirs dertê holê: "Çima, armanc çi ye?"

Dibe ku wana hema wisa hildane û ji wan hemûyan ew hilçinîne, çi ku wana divê bi daxwez û fermana hinekan "bidîtana" û bidana daxuyandin? An jî, dibe ku li vira amatorîya wan bi xwe qerfê xwe li wana kirye? – Nizanim, nizanim!

Em lêytmotîva peydabûna nivîseke weha û pirsa destûrmendî-nedestûrmendîya nûserên wê daynin hêlekê û pirsa "hemlêzimî-hemnijadîya êzîdîyan û asorîyan" binirxînin.

Li vira divê ez li xwe mikur bêm, ku bi xwe aprîorî (bêyî ku di rastî û nerastîya wê da bi bawer an bi guman bim) dikarim bipejirînim, ku bi dîrokî tiştekî wisa dikaribû pêk hatibûya. Û ji bo pêşdîtineke wisa jî bingeh hene. Ma ne, ji dîroka gelên cîhanê tê zanîn, ku hinek caran pêkhatîyên êtnîkî yên bîyanîza jî beşdarî gênêzîsa (pêvajoya pêkhatina) gelê konkrêt bûne. Ev pêvajoyeke xwezayî ye, lewra ku, hîç gelek jî di qadeke ji derdorên xwe ra girtî da pêk nehatiye.

Lewra jî, sedemên hebûna bingehên gênêtîkî (*genetic haplogroups*) li bal gelên cuda divê di nava vê govekê da bê nirxandin, di rewşên dîrokî yên konkrêt da, wek encama pêvajoyên dîrokî yên konkrêt, yên ku di herêma cîhanê ya konkrêt da pêk hatine…

Û li vira, ji bo ku mirov bikaribe bersîvên pirsên di derbarê hebûna bingehên gênêtîkî yên hevbeş li bal êzîdîyan û asorîyan bibîne, yên ku bi weşana gotara navborî ra rû dane, di sêrî da em pirsa gênêzîsa (pêkhatina) heman asorîyan binirxînin.

Tê zanin, ku bi dîrokî pêşîyên rastedêr ên asorîyên îroyîn bi xwe asorî û binecîyên Navçemkê (Mêzopotamîyayê) yên kevnar tên hejmartin, ên ku di sedsala I da xaçparêzî pejirandine[3]. Di vê derbarê da xwendevan dikarin di gotara "Asoristan" a Wikipediayê da bixwînin.


Ma ne, ew, a ku wisa ne dyar, di nav nehînîyekê da "niştecîyên Mêzo-

[3] https://ru.wikipedia.org/wiki/Ассирийцы

potamyayê" tên navkirin, ew gelên konkrêt ên bingehîn ên welatên cuda ne, û heya nûnerên rassa û nijad û şaristanîyên cuda ne jî, yên ku ji hêla Împêratorîya Asoristanê ya koledar va hatine dager û kolekirin. Lewra jî, divê mirov hê bikaribe bibîne, ka asorî kî ne? – Ewana nivş û peyhatîyên niştecîyên bajarê Aşûr ê kevnar in, ê ku dewleta yekem a asorîyan li dora wî pêk hatye, an peyhatîyên wan gelên kolekirî ne, yên ku welatên wan ji hêla Împêratorîya Asoristanê va hatine dagerkirin? Ma ne, hema îro jî komên cuda yên wê konglomêrata (civaka geremol) ya asorîyan bi navên ji hev cuda xwe nas dikin û didin nasîn: atûraya, aysor, sûraya, sûryanî, aramêî, kildanî, kurdên asorî (ango, kurdên nêstorî) û her wekî dinê.

Lewra jî pirs dertê hole, ka, gelo, dema xudanên vê gozarêş-rapora lêgerînên zanistî navê sûryayî nivîsîne, mabesta wana kî bûne, xazma, dema tê zanîn, ku di dîroka xwe ya dewr û zemanan da di xwezayê da pêvejoya pêkhatina gelê bi navê asorî, wek neteweke yekgirtî, wisa jî heya dawîyê neçûye sêrî. Peyva asorî/sûryayî bêhtir têgîneke wek a kurdistanî, rûsîyayî, amêrîkî, brîtanî dide zanin... Dibe ku, ji ber wê jî di têksta orîjînal a "çavkanîya fermî" da bi înglîzî *syrians*, ango, *sûrîyayî* nivîsîne, lê ne ku *assîryans* (ango, asorî/asoristanî).

Lewra jî, îro hê divê bê zelalkirin, ka *asorîyên* îroyîn kî ne, û peyhatîyên kîjan gelê konkrêt in ew.




Tê zanîn, ku Împêratorîya Asoristanê, ya bi xakeke ewqas berfireh û gewre, ji herêmeke biçûk a bi rêvebirîya xweser ava bûye, ya ku li bakûrê Navçemkê li dora bajarê Aşûr pêk hatibûye.[4]

Evê dewletê di sêrî da, weke çend dewran di jîyana bajarên he-rêmê da roleke

[4] Bala xwe bidinê: li ser xerîta Asoristanê bi rengê keskê tarî xaka Asoristanê ya destpêkê hatye cudakirin, a s.s. 1800 – 1600 ên berî bûyîna Îsa. Xerîte ji çavkanîyên vekirî hatye hildan.

ewqas girîng ne-lîstye, û ji hêla pêşkevtinê va ji cînarên xwe yên başûrî paş maye…

Lê paşê, leşkerên asorîyan berbi welatên cînar va êrîşên girîng û serkevtî tevger kirine. Bi sayîya tevgerên weha yên leşkerî ruh û moralê artêşa asorîyan xurt dibe, û dewletên cînar jî êdî bi çavekî dinê li wan dinihêrin.

Dewleta asorîyan di wê dema pêşveçûna xwe da Bakûrê Sûrîyayê, Fînîkîyayê û hinek herêmên Asîa Biçûk dager dike...

Wisa jî ji dîrokî tê zanîn, ka berî ku têk here, ewê împêratorîyê di dîroka xwe da çiqas xakên welatên cuda dager kirine û çiqas gel kole kirine. Ka ewê makîneya koledarîyê ya gewre ya bi navê Asoristan di dîroka xwe da çiqas gel hêrane û dabelandine. Lewra jî îro mirov her bi mercî dikare di derbarê bi gênêtîkî yekawatîya gelê asorî da (wek êtnos) biaxive...Û, divê bê gotin, di vê pirsê da asorî ji gelên dinê yên cîhanê pir cuda nînin, heman tiştî (kên an zêde!) mirov wisa jî dikare di derbarê her gelekî cîhanê da bibêje...

Lêbelê!...

Helbet, berê jî di medya civakî da rûdanên propagandayî pêk hatine, yên ku ji bo gengeşîyên ciyawaz bûne sedem. Di derbarê gengeûêyeke weha da xudanê van rêzan di dema xwe da (sala 2017an) di bin sernivîsa “Gengeşî didomin” da nirxandinek weşandye. Di vê gotarê da hinek agahî hene, yên ku dikaribûn bibin alîkar, ku mirov rûpelên tarî yên dîroka gelên herêmê yên hevbeş ronî bike. Lewra jî, ez hinek şiroveyên ji wê nirxandinê li vira pêşnîyarî bala xwendevanên hêja dikim. Weha: “ ...ji dîrokê tê zanîn, kû beşekî kurdan (yên êzdî, zerdeştî û yên dinê) di dawîya sedsala yekem û di destpêka sedsala duyem a serdema me da xrîstîanî pejirandine, û êdî di sedsala duyem da dewleteke kurdî hebûye, û ola wê ya fermî jî xrîstîanî bûye...

Pirs dertê hol, piştî hilweşîna wê dewletê, ew kurdên xrîstîan kuda winda bûn? – Bi demê ra beşek ji wan paşva vegeryane nava refên ola xwe, lê yên dinê an xwe dane ber dêra nestûrî ya asorîyan, an a hewarî ya ermenîyan, û bi demê ra di nava wan gelan da helyane û gelek reng û rûçikên xwe yên kurdî-netewî dane wan gelan... Û ev pêvajoya jî, wê demê hê zûtir pêş ketye, dema dest bi îslamîkirina kardan bûye û îslam di Kurdistanê da bûye ola desthilatê. Weha, mînakek: netewzan (êtnograf) û arkêologê navdar ê ermenî yê dawîya sedsala XIX û destpêka ya XX – Lalayan Yê. A. (1864 – 1931) di dema xwe da çi nivîsye: “Poêzîya gelêrî ya aysoran bi piranî di bin bandora ya kurdî da ye; stranên wan ên gelêrî pir hindik in, lewra jî kevneşopîyek a giştî heye, ku ew stranên kurdî distirên û çîrokên kurdan dibêjin”.

Û ev agahîya bi serê xwe yeke tenê nîne...

Weha zanîyarê sovêtî yê navdar akadmîk Î. A Orbêlî çi nivîsye: “... Gelo, tê ber heşê kê, ku ew Selaheddînê ewqas êş û tengasî gîhandye xaçdaran, kurd e, ku torinên Dolgorûkî (Çepildirêj) yên navdar, ên ku di dîroka Ermenîstanê û Gurcistanê da ne ku tenê wek serleşker, lê wisa jî wek avakarên çandê yên navdar, bi eslê xwe kurd bûne, ku yên Şeddadî, yên ku ji bo avabûna dewletê di Kafkasîyayê da hevrikî bi Gurcistanê ra kirine û di Îranê da deshilatdar bûne, kurd bûne, ku Nîzamîyê helbestvanê mezin, ê ku bi farsî afirandye, di nîvî da kurd bûye. Evî gelî lawên xwe di nav îranîyan, tirkan, ereban, ermenîyan da windakirne, û navên wan wek navên helbestvan, awazjen (mûzîsyen) û serleşkerên bi nav û deng dîroka gelan dixemilînin” (cudakirin a min e. – E. C.) .

Û ya balkêş jî ew e, ku hê jî di nav ermenîyan û asorîyan da nivşên wan kurdên

di nava wan da hatibûne bişavtin hene, yên ku îro li xwe mukur tên, ku pêşîyên wan kurd bûne... ”[5]

Û, lewra jî, wek ku ez dibînim, dema lênihêrandina pirsa di derbarê hemlêzimî-hemnijadîya *êzîdîyan* û *asorîyan* da, pêwîst e wan rewş û mercên dîrokî hesab hildin.

Helbet, ev her dîtinek e di derbarê peydabûna bingehên genetîkî yên hevbeş li bal gelên herêmê, di nav wan da wisa jî, li bal êzîdîyan û asorîyan.

Lêbelê, dîtineke dinê jê heye, ya ku ji vê ne kêmtir girîng e.

Ji bo ku vê dîtinê binirxînin, em di sêrî da hinek pirsên bingehîn û bi prênsîp govtûgo bikin.

**Ya yekem** ew e, ku di cîhana zanistê da têgînên “êzdîtî” û “êzîdîtî/yêzîdîzm” bi zelalî ji hev cuda nayên dyarkirin û zanîn.

Ev pirsa jî pir girîng e. Û ew ne ku tenê ji bo têgihîştina êtnogênêza gelê kurd girîng e, lê wisa jî ji bo ya gelên herêmê, bi giştî.

Û ew dîtin, a ku bi gotina“êzîdî” ji bilî êzîdîyên sofî yên îslamî (ên ku di nava wan da wisa jî pêkhatîyên ereb pir in), wisa jî – kurdên êzdî têdigihîjin, di nava vê govekê da hîç cî nabe. Lewra ku, yên êzdî ne ji hêla gênêlogîya xwe va, ne jî ji hêla bawerîya xwe va tu têkilîya xwe bi “êzîdîyan” û “êzîdîtî/yêzîdîzmê” ra nînin (êzdî kurdên rojperest in, lê êzîdî nûnerên civakek a polîêtnîk/pirêtnîk in. Û ev civak jî ji wan nûnerên gelên cuda pêkhatye, yên ku şaxê îslamê yê sofîtîyê diperêzin!)...

Ango, eger mirov van gotinan bi şêweyekî dinê şêwazdar bike, dikare bi bawer bibêje, ku êzîdîtî ne êzdîtî ye, û êzîdî jî hîç ne êzdî ne! Êzîdîtî/yêzîdîzm terîqeteke şaxê sofîtîyê yê îslamê ye, lê êzdîtî rojperestî ye û ola gelê kurd a berî zerdeştîyê ye.

Hê sala 2004-an di têbînîyeke gotara xwe ya “Êzdîtî. Çend raman û nêrîn li ser rastîya vê ola kevnar, rewşa wê ya îro, nexwendîtîya olî ya di nava me da û leyîstokên siyasî” da min şirovryeke brfireh ji bo wê pirsê dabû. Weha, li wir çi tê gotin:

“Îro di weşanên cuda û çapemanîyê da bi şaşî navê ola gelê kurd a kevnar – ola êzdî – wek yêzîdîzm, an ola êzîd dinivîsin, lê bawermendên vê olê jî yên êzîdî nav dikin.

Bi vê boneyê divê bê gotin, ku navê vê olê ne ku ola êzîdî ye, lê – ola êzdî ye. Ev civaka netewî-olî bi xwe jî wek êzdîtî, an êzdîxane tê zanîn. Ji gelên cînar, ermenî ji êzdîyan ra dibêjin yêzdî, lê yên dinê –yêzîd.

Divê bê zanîn, ku tu grêfterîyek di navbera navê ola kurdan a kevnar Êzdî û navê Sultan Êzîd da nîne. Navê ola Êzdî yek ji navên Xwedê ye. Di qewlek a ola Êzdî da tê gotin: “Hezar û yek navên Xwedê hene, Êzdî jî navekî Xwedê ye!”. Her navekî Xwedê tê ravekirin: Peyva Êzdî ji peyverêza “Yê ez dayî” tê. Paşê, hê dereng, ev peyverêz di axavtina zêndî da hey hatîye gotin û di wê da guhartin pêk hatine: hinek deng jê werîyane, hinek gihîştine hev û ew bûye peyvekê. Peyverêza “yê ez dayî” bûye Yêzdî, ev jî ji hêla xwe va bûye Êzdî (Êzdî <êzdayî<Yêzdayî<yê ez dayî). Hê jî di di herêmên cuda yên Kurdistanê da, di wê rêzê da, wisa jî di nava gelek êzdîyan da, ji êzdîyan ra dibêjin ezdayî...

Lê Yêzîd bên-Maewî bên- Ebî- Sifyan benî –Omeya ji eşîra ereban a Qurêşîya ya li Mekkê, pismamê Mihemed Pêxember ê dûr e, yek ji Xelîfê (Sultan) cîhana îslamê bûye.

Yezîd (an, wek yên êzdî wî nav dikin, Sultan Êzîd) kurê Maewî bên Ebî – Şifyan e. Heya Êzîd (Yezîd) xelîftî di dest malbata Pêxember da bûye. Ji vê malbatê Elî xelîfê 4-em ê dawîyê bûye. Tê gotin, ku kuştina wî bi destê maewîyan çê bûye. Hesenê kurê Elî, tê jehirdadaykirin, ê dinê- Huseyn û hemû malbata wan, bi giştî 22 kes, di Kerbelayê da ji hêla Êzîd va tên kuştin. Û, bi vî awahî, dawî bi desthilatdarîya malbata Pêxember tê û pismamên wan ên dûr – meawîyan desthilatdarîyê hiltînin

[5] ***Ezîz ê Cewo*: Gengeşî didomin** – https://amidakurd.net/ku/tekst/GENGEŞÎ_DIDOMIN

destê xwe. Û Êzîd dibe Xelîf (Sultan).

Lê ew pirs, ka gelo bawerîya Yêzîd (Sultan Êzîd) çawa anîne nava ola êzdî, hê bersîveke bi zanistî ya pêbawer ji bo wê nîne. Dibe ku ev bawerî dema rêformên Şêx Adî anîbin nava ola êzdî, ji bo ku herçê êzdîyên ji tevkujîyan filitîne, biparêzin, an jî…? Dibe ku zaniest îro ne amade ye, ku bersîva vê û pirsên dinê bide, lê mirov dikare bi bawer bibêje, ku hîç pêwendîyek di navbera ola êzdî û navê sultan (xelîf) Êzîd da nine. Êzdîtî ola gelê kurd a berî zerdeştîyê ye.

Têrmîn û navên bi vê olê ra pêwendîdar ên rast ev in: **êzdîtî, ola êzdî, yên êzdî, ya êzdî, yê êzdî".**[6]

Ango, li vira karê me bi du olên cuda ra, bi du bîrûbawerîyên cuda ra heye: yek *êzdîtî* ye, ya ku ola gelê kurd a berî zerdeştîyê ye, ya duyem êzîdîtî/yêzîdîzm e – terîqeta îslamê ya sofîyan.

Lêbelê, îro hem di hindur da, hem jî ji derva va hinek hêz her tiştî dikin, ji bo ku êzdîtîyê, evê ola kevnar a xwezayperest a gelê kurd, werguhêrî êzîdîtyê bikin, ango wê bikin terîqeta îslamê ya sofîyan.

Di vê derbarê da bi boneyên cuda di çapemenîyê û medya civakî da gengeşî pêk hatine, ez jî beşdarî hinekan ji wan bûme, û min hewl daye, rastîya wê pirsê bi zanistî ravebikim û derxim zanebûnê. Û ji bo ku rastîya pirsê bi nimûne bê têgihîştin, ka, em li vira hinek parçeyan ji gengeşîyekê bînin, ya ku sala 2015-an di bin sernivîsa: "Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî û êzdîtî bê tunekirin û ji holê r·abe?" da hatibû weşandin. Wê demê min di wê gotar-nirxandinê da nivîsibû: **"Di sêrî da bibêjim, ew, ku kekê Hoşeng**[7] **gelek tiştan nabîne (an dide xuyan, ku nabîne?!) ew ji ber wê ye, ku bingehên têgihîştinên me herduyan ên vê mijarê ji hev cuda ne. Ya yekem ew e, ku ew li ser dîtinên bi*êzîdî*kirina (bixwîne: *îslamî-sofîkirina*) êzdîyan gihîştye-mezin bûye, lê min di nava *êzdîyan* da çavê xwe vekirye, di nava *êzdîyan* da mezin bûme. Û ev êzdî jî, ne bi giştî be jî, ji wan pêvajoyan, der mane, yên ku bi hatina Şêx Adî û piştî "rêformên" wî di nav civaka *êzdîyan* da rû dane, û bingehên sereke yên *êzdîtîyê* parastine... Ango, em du mirov in, ên ku ji nav du civakên ji hev cuda, olên ji hev cuda hatine (ew *êzîdî-sofî* ye, ez *êzdî* me!), û ji bo wê jî dîtin û armancên me ji hev cuda ne: ew hewl dide *êzîdîtîya sofî* li ser redkirin û tunekirina *êzdîtîyê* li civakê ferz bike, lê ez dibêjim, ku *êzdîtî* bi serê xwe oleke kevnar a gelê kurd e, û tu pêwendîya wê bi *sofîtîya (sûfîzm) îslamî* ra nîne (û, ku *êzîdîtî* terîqeteke îslamê ya *sofîtîyê* ye jî, ne ku ez, lê ew biradera bi xwe dinivîse!)".**

**Bi xwe binihêr'in, va ye, di vê derbarê da ew qewalê îslamîkirina êzdîtîyê çi dinivîse:** "Ya Şêxadî û gelek irfannasên din yên „Ne-Kurd" digihîne Êzîdiyan û dînê wan, ji her tiştî bihtir **sufîzm** e (bi kurdî: **sofî/sofîtî**. – E. C.), ku bingeha wê jî ji islamê wêdetir e. ...**Sufîzm** di koka xwe de, wek rêya naskirina Xwedê, ji „şerîetê" bihtir rêgeh û **terîqet** e, *û ji dînnasiyê jî bihtir irfannasî ye, û ji Xwedanasiyê jî bihtir mirovnasî ye. Lewre, Hisên Bin Mensûrê Hellac (858-922) digot: „Ez heq im...!"*[8]

Heman rêyê di komarên Sovêta berê da Pîr Dîma dide pêşîya xwendevanan. Lê tenê bi wê cudahîyê, ku ew li şûna peyva sofîtî/sûfîzm ya dewrêşî bi kar tîne. Weha, ew çi dibêje: "Ezditi ne zerdeshtiye, ezditi derweshiye u derweshi ji ne misilmanetiye".[9] – Mirov dixwîne û bawer nake. Gelo?! Çawa dibe? Çi ye, Pîrê hêja

---

[6] *Ezîz ê Cewo*: "Êzdîtî. Çend raman û nêrîn li ser rastîya vê ola kevnar, rewşa wê ya îro, nexwendîtîya olî ya di nava me da û leyîstokên siyasî" –https://www.amidakurd.net/ku/ tekst/Ê_ Z_D_Î_T_Î_1

[7] Hoşeng Broka – yek ji mîssîonêrên (qewal) îslamîkirina *êzdîtîyê* yê dema me.

[8] *Ezîz ê Cewo:* "Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî û êzdîtî bê tunekirin û ji holê r'abe?" – https://amidakurd.net/ku/tekst/çima_divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe

[9] Ezîz ê Cewo: "Êkspansîa bierebkirina Kurdistanê didome!"– https://www.amidakurd.net/ku/tekst/êk_spansîya_bierebkirina_k_urdistanê_didome_2; Wisa jî di pirtûka "Êzdîtî: divê

nizane, ku dewrêşî bi farsî hemwateya (sînonîm) peyva erebî ya sofî (sûfî) ye. Ev têrmîna di nîveka sedsala XI da di derdorên farsîaxêvan da dyar bûye.[10] Û di vê derbarê da jî têra xwe agahî hene, hem jî Ferhenga têrmînên sofîtîyê (sûfîzmê) heye... Û sofîtî/sûfîzm jî, wek ku tê zanîn, ne ku tenê şaxekî îslamê ye, lê, her weha, di cîhana misulmanîyê da ewê heya "îslama gelêrî" jî nav dikin.

Mirov matma dibe, ku kesekî wisa yê ne dûrî cîhana erebî-îslamî di vê derbarê da nizane! Eger gotinên weha ji zarê mirovekî nîvxwendî, an amator derketana, mirov bi awayekî dikaribû tê bigihîjta. Lê, dema di vê derbarê da mirovek dibêje, yê ku di dema xwe da, wek ku tê gotin, di fakûltêta rojhilatzanîyê da xwendye (ew jî di beşê erebî da!), û bi xwe jî ji malbeta pîrên êzdîyan e, û hewl dide xwe bigihîne asta "*ezdazanîyê*" (?!), hîç nakeve heşê mirov…

Û ya ku ew li şûna sofîtî/sûfîzmê peyva derwêşî bi kar tine, dibe ku ji ber wê ye, ku di nava civaka êzdîyan da (ne ya êzîdîyan da!) peyva sofî bi wateyeke ne pak, bi awazê qerf û tirane û nav-nûçikan va tê bikaranîn? Mînak, di nava êzdîyan da gotina "Sofîyê serkesk" bi wateya "mirovê durû û derwîn" cîyê xwe girtye...

Balkêş e, ev biradera bi rastî di derbarê van hemûyan da nizane, an dizane, lê …?

Û çiqas diçe – ew bêhtir mirov matma dike!

Bala xwe bidinê, ka Pîr Dîma êzdîtîyê çawa "têdigihîje": "Ezditi dineki vekiribu di dema xwe da. U ezditi ne tene bawerya kurmaciaxevan bu, le bele gelek erebiaxev u aramiaxev ji bune ezdi…"[11]

Balkêş e, ev çîrokana ji bo kê hatine hinartin?!

Helbet, piştî van gotinan, di serê wan mirovan da, yên ku hema piçekî bi dîroka êrîşên ereban û îslamkirina Rojhilata Navîn û Kurdistanê ra nas in, dê ev pirsên hanê li dû hev rû bidin: "Ma, gelo tiştekî wisa dikaribû pêk bihata? Ma, gelo erebên zorkar, ên ku bi dagerkirina xakên gelên dinê va mijûl bûne, li ser wê rêyê bi şûr û agir nirxên rewanî û matêrîalî yên gelên binecî tune kirine, bi zordarî ola xwe (îslam) li wan ferz kirine, û ji ber wan êrîşên tunekar "nav û dengê" wan gihîştibûye asta here bilind, dikaribûne rabin û wê bawerîyê bipejirînin, a ku wan bi xwe tunedikirine?"

Bi rastî, ev tiştekî mîstîkî ye!

Helbet, di rastîya xwe da bi dîrokî pêvajoyeke dinê pêk hatye, ya ku wisa bi "xweşikî" ji gel vedişêrin. Di dema xwe da (dawîya sedsala XI – destpêka ya XII) bi Şêx Adî (Şîxadî) ra komek terefdarên sofîtîyê, bi piranîya xwe va jî yên ereb, ên ku xwe (y)êzîdî dihejmartin (ango, terefdarên Yêzîd bên-Muawî ebû-Sufyan) tên navçeyên Kurdistanê yên derdorên Lalişa pîroz û Şengalê. Bi demê ra gelek ji wan êzîdîyên terefdarên sofîtîyê zimanê kurdî fêr dibin û gav bi gav dişûlikin nava civaka êzdîyan... Hê dereng ev kesana di nava êzdîyan da bîrûbawerîya Şîxadî (sofîtî/sûfîzma îslaamî/derwêşî)[12] belav dikin. Û bi wî awahî, dest bi pêvajoya îslamkirina êzdîyan dibe, ya ku îro jî didome...

Û agahîyeke balkêş jî: zarokên wan erebên êzîdî-sofî yên navçeya Başîk û Behzan a Başûrê Kurdistanê, ên ku qewaltî-mîssîonêrîya bîrûbawerîya êzîdîtîyê

---

mirov rastîya wê li ku bigere?", Weşanên J&J, Amed – 2017, rû. 186 и 205 – 216. Pdf-a pirtûkê di întêrnêtê da heye.

[10] https://ukrezo.com.ua/ezoterika/sufizm/sufizm-kto-takie-dervish.html ; wisa jî di "Ferhebga têrmînên sûfîzmê" binihêrin: «Словарь суфийских терминов» – http://mevlana.lv/ суфизм/словарь-суфийских-терминов/

[11] Bi hûrbînî – di nasîya 10em da.

[12] Di vê derbarê da bi hûrbînî – di nasîyên 6 – 8em da.

(sofîtî/sûfîzma îslamî) dikin, wek ku heman Hoşeng Broka bi xwe dinivîse, di malên xwe da bi erebîya Şamê diaxivin (!?)[13] – Û xwendevan dikarin di vê derbarê da jî bi hûrbînî di gotatra bi sernivîsa "...Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê t'unekirin û ji holê r'abe?!.." da bixwînin.

Û ev jî aspêkteke peydabûnaa bingehên genetik ên hevbeş li bal êzîdîyan û asorîyan e...

## Derencam

Dema mirov wan agahî, dîtin û ramanan, ên ku di derbarê wan da li jorê hate gotin, tomar dike, dertê hole, ku:

**1.** Eger mirov di derbarê hinek mînahevîyên gênêtîkî yên di navbera asorîyan û êzîdîyan da diaxive, wê demê di sêrî da divê zelal bike, ka bi gênêtîkî gelê asorî yê îroyîn çawa pêk hatye. Û, dema mirov ji hêla dîrokî va li pirsê dinihêre, ev pirs dertê holê: "Gelo asorî peyhatîyên binecîyên bajarê kevnar ê Aşûr in, ê ku li dora wî dewleta yekem a asoryan pêk hatye (Li xerîteya dewleta Asoristanê ya li jorê binihêrin!), an ên wan gelên bindest û kolekirî ne, yên ku welatên wan ji hêla Împêratorîya Asoristanê va hatibûne dagerkirin? Ma ne, ji dîrokê tê zanîn, ka heya têkçûna xwe ewê împêratorîyê çend welat dager kirine, û çiqas gel ji hêla wê va hatine bindest û kolekirin, ka di dema hebûna xwe da ewê sîstêma koledarîyê ya gewre çiqas gel hêrane û dabelandine! Lewra jî îro mirov dikare her bi mercî di derbarê bi gênêtîkî yekrengîya (homogênî) gelê asorî da biaxive – wek êtnos!... "

Û lewra jî, îro komên cuda yên wê konglomêrata pirêtnîk (civaka geremol) xwe bi navên cuda nas dikin û didin nasîn: ***atûraya, aysor, sûraya, sûryanî, aramêî, kildanî, kurdên asorî (ango, kurdên nêstorî)*** û yên dinê.

Û ji vira jî bersîva pirsa "Bingehên hevbeş ên gênêtîkî çawa li bal asorîyan û wan gelan, ên ku ji hêla wan va hatine kolekirin, peyda bûne?..."

**2.** Hebûna bingehên hevbeş ên gênêtîkî li bal êzîdîyan û asorîyan hem jî bi wê tê şirovekirin, ku di civaka êzîdîyan a pirêtnîkî (*polîêtnîk*) da pêkhatîyên ereb pir in, û ereb û asorî jî, jixwe, gelên hemnijad ên samî ne.

Lê, eger di derbarê êzdîyan da bê gotin, wê demê divê vegerin xala **1.** a van derencaman, lewra ku, berovajî êzîdîyan, êzdî bi êtnîkî kurd in, û bawerîya wana jî ola gelê kurd a kevnar a berî zerdeştîyê – êzdîtî ye.

## Û bi boneya…!

**(Li şûna paşgotinê)**

Di gotara xwe ya "Kurdên êzdî" da, ya ku sala 1904an di kovara "Lûma" da bi zimanê ermenî hatibûye weşandin, nivîskarê ermenî A. Gyûrcyan nivîsye:

"... Wek ku hemû berekên kurdan bi giştî, êzdî jî, mîna gelên dinê yên mehmedî nizanin, bi navê olî yê "misulman" an "êzdî" xwe bidin nasîn. Mînak, eger ji kurdekî misulman an ê êzdî bipirsî, ka ew kî ye, ewê bibêje: "Ez kurd im!" û eger bipirsî, ka ew çi kurd e, ewê teze bibêje, ku kurdê misulman, an ê êzdî ye. Heya van salên dawîyê weha bû, lê dema kîna ermenîyan li hember kurdên misulman pêş ket, êdî yên êzdî ewqasî jî bi serbilindî nabêjin: "Ez kurd im!"

---

[13] *Ezîz ê Cewo:* "Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî û êzdîtî bê tunekirin û ji holê r'abe?" – https://amidakurd.net/ku/tekst/çima_divê_yên_êzdî_bibin_êzîdî_sofî_û_êzdîtî_bê_t_unekirin_û_ji_holê_r_abe

Ev yeka bi taybet jî di nav êzdîyên di bin  desthilatdarîya Rûsîyayê da dyar dibe, yên ku hinek tiştên wan bi awayekî bi ermenîyan va girêdayî ne. Ev dide xuyan, ku ruhê olî di nava kurdan – wan bazên çîyan da pir lewaz e, ku ew heya îro jî ne neteweke olî bûne, û ne jî, mîna hemû gelên dinê yên misulman ên fanatîk ji gengeşîyên ser pirsên olî hez dikin...”.[14]

[14] *Ա. Գյուրջյան*, «ԵԶԴԻ ՔՐԴԵՐ», «ԼՈՒՄԱՅ» հանդես,  1904 թ., թիւ 1, էջ 75 – 93//*A. Gyûrcyan,*  “K’urdên êzdî”, kovara “Lûma”, s. 1904, № 1, r’û. 75 – 93, bi zimanê ermenî.

**Berevoka gotûbêjan**

**Yên êzdî û êzdîtî.**
**Li ser rêya hevhatinê û yekîtîyê.**

Gotûbêjên malpera "Amida Kurd" (Swêd) bi lêgerîner, nivîskar û rjnameger Ezîz ê Cewo (Mamoyan) ra.

Amadekar – **AmidaKurd**
Êdîtor – **Mahabad Felat**

